

T.C.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



LI HERÊMA DOSKIYAN ÇEND DEQÊN EDEBIYATA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

XWENDEKAR

KEREM ENGİN

VAN – 2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



DOSKİ YÖRESİNDE KÜRT EDEBİYATINDAN METİNLER



YÜKSEK LİSANS TEZİ

Danışman

Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

ÖĞRENCİ

KEREM ENGİN

VAN – 2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR danışmanlığında, Kerem ENGİN tarafından hazırlanan “**Li Herêma Doskiyan Çend Deqên Edebiyata Kurdî**” adlı bu çalışma, 23/09/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

İmza: 

ÜYE : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr.Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.


Prof. Dr. Mustafa DEMİREL
Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN SAYFASI

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü **Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;**

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Kerem ENGİN
Van, 2019

(Teza Lisansa Bilind)

Kerem ENGİN

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Eylül, 2019

LI HERÊMA DOSKIYAN ÇEND DEQÊN EDEBIYATA KURDÎ

KURTE

Culemêrg ji aliyê edebiyata Kurdî ve bajarekî dîrokî û warekê qedîm e. Li vî wargehê qedîm gelek edîb û helbestvan derketîne. Wan edîb û helbestvanan tevnê edebiyata Kurdî li vî bajarî yên raçandîn û hevokên xwe bi awayekê arifâne yên vehandîn. Pîrên edebiyata Kurdî yên bo edebiyatnasên Kurd li vî bajarê kevnare yên bûne rênîşander. Li ser şopa van edîbên kevnare, edîbên binemala Gulordiyî jî di serdema 20an de li nav çiyayên Doskiyan tevnê edebiyata Kurdî yên bi hevokên xwe ve nexşandîn û bi beytên xwe ve yên vehandîn. Binemala Gulordiyî eslê xwe jî eşîra Doskiyan e. Eşîra Doskiyan li Duhok û Geverê niştecih in. Piraniya Doskiyan li bajarê Duhokê akincîne. Vê binemala Doskiyan bajarê Culemêrgê navçeya Geverê li gundê Gulordê jiyana xwe domandî ye. Gelek mirovên edîb û zana jî vê binemalê derketîne. Şexsiyetekê vê binemalê yê pêşve çûyî alim û siyasetmedar Mela Husên e. Mela Husên di dawîya sedsala 19an de li gundê Gulordê hatiye dinyayê. Şexsiyetên vê binemalê yên din jî di derbarê edebiyata Kurdî de pêşve çûyîn Mela Ehmedê Gulordî û Mela Ebdulmecîdê Gulordî ne. Mela Ehmed mirovekî hem ‘alim, hem jî edîb bûye. Her wesa şexsiyetekî mutevazî bûye, tamahiya dinyayê nekiriye û te’sîra wî li ser civakê zêde çêbûye. Mela Ehmed jî di dawîya sedsala 19an de hatiye dinyayê. Di herêmê de şexsiyetekî welî û arif hatiye nasîn. Mewlûdûş-Şerîf bi zimanê Kurdî nivîsiye. Li ser herba Yermûkê pirtûkeke helbestan bi zimanê Farisî jî nivîsiye. Mewlûdûş-Şerîfa wî cihê xwe di nav vê tezê de girtiye. Mela Ebdulmecîd jî helbestvan û seydayekî vê binemalê ye. Ew jî di sedsala 20an de jiyana xwe domandiye û niha jî li jiyana ye. Gelek helbest nivîsîne û pirtûka wî Guldeste jî di vê tezê de cihê xwe girtiye. Van şexsiyetên binemala Gulordiyî ne bi tenê ji aliyê edebiyatê ve, her wesa di nav civakê de jî rolekê girîng bi kar îname. Xelqê herêmê jî

bo çareserkirina pirsgirêkên dînî û civakî jî murece‘eta wan kiriye. Di vê tezê de di derheqê Culemêrg û Geverê de agahî hatine dan. Jiyanê Mela Husên, Mela Ehmed û Mela Ebdulmecîd hate nivîsîn. Her wesa mewlûda Mela Ehmed û pirtûka Mela Ebdulmecîd Guldeste ji aliyê edebî û naverokê ve hatine tehlîl kirin.

Peyvên Sereke: Culemêrg, Gever, Doskî, Gulordî, Mewlûd, Guldestê.

Hejmara Rûpelan: 216

Şêwirmend: Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR



(Yüksek Lisans Tezi)
Kerem ENGİN
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Eylül, 2019

DOSKİ YÖRESİNDE KÜRT EDEBİYATINDAN METİNLER

ÖZET

Hakkâri Kürt edebiyatı Konusunda tarihi bir şehirdir. Bu eski şehirde birçok edib ve şair yetişmiştir. Bu edib ve şairler Kürt edebiyatının dokuma tezgâhını bu şehirde kurmuşlar ve cümlelerini arifane bir şekilde örmüşlerdir. Kürt edebiyatının önde gelen edebiyatçıları bu kadim şehirde edebiyatçıları için yol gösterici ve ilham kaynağı olmuşlardır. 20. Yüzyılda Gulord ailesine mensup edebiyatçıları da onların yolunda yürümüş ve Kürt edebiyatının dokuma tezgahını Doski dağlarının içine kurmuş ve beyitlerini arifane bir şekilde örmüşlerdir. Gulord ailesi aslen Doski aşiretine mensuptur. Doski aşireti Duhok ve Yüksekova'da yerleşik olup, çoğunluğu Duhok'ta yaşamaktadırlar. Gulord ailesi ise Hakkâri'nin Yüksekova ilçesi'nin Bostancık köyünde yaşamlarını sürdürmüşlerdir. Bu aileden birçok alim ve edip çıkmıştır. Ailenin öncü şahsiyetlerinden alim ve siyasetçi olan Molla Hüseyin Doski'dir. Molla Hüseyin 19. Yüzyılın sonlarında Gulord köyünde dünyaya gelmiştir. Ailenin edebiyat alanında eserler vermiş diğer şahsiyetleri ise Molla Ahmed ve Molla Abdülmecid'tir. Molla Ahmed hem alim, hem de edib bir şahsiyettir. Aynı zamanda mütevazi, dünya malına tamah etmeyen ve toplum üzerinde iz bırakmış bir kişiliğe sahiptir. 19. Yüzyılın sonlarında dünyaya gelen Molla Ahmed bölgede arif ve veli bir kişi olarak biliniyordu. Muvluduş-Şerifi kürçe yazmış olup, aynı zaman Yermük harbi ile ilgili olarak Farsça bir şiir kitabını da kaleme almıştır. Mevluduş-Şerifi bu tez de yer almaktadır. Molla Abdülmecid de bu ailenin önemli edip ve şairlerinden birisidir. O da 20. Yüzyılda yaşamış olup, hala hayattadır. Birçok şiir yazmış ve Güldeste isimli şiir kitabı bu tez de yer almaktadır. Gulord ailesinin bu önemli şahsiyetleri sadece edebiyat alanında değil, aynı zamanda toplumsal alanda da önemli görevler icra etmişlerdir. Bölge halkı hem dini, hem de toplumsal problemlerinin çözümü için onlara başvurmuşlardır. Bu çalışmada Hakkari

ve Yüksekova hakkında bilgiler verilmiş ve Molla Hüseyin Doski'nin hayatına yer verilmiştir. Molla Ahmed ve Molla Abdülmecid'in hayatları anlatılmış, Molla Ahmed'in mevlidi ve Molla Abdülmecid'in Güldeste kitabı içerik ve edebi yönden tahlil edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Molla, Doski, Culemêrg, Gever, Mevlud, Guldeste, Elyazması.

Sayfa Adedi: 216

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR



(Master's Thesis)

Kerem ENGİN

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

DEPARTMENT OF KURDISH LANGUAGE AND CULTURE

September, 2019

A FEW OF TEXTS KURDISH LITERATURE IN THE AREA OF DOSKIAN

ABSTRACT

Colemêrg is a historical city and place in the field of Kurdish Literature. In this historical area, many writers and poets in Kurdish Literature have grown up. Those people have kitted their words in a artistic way and maked their sentences to spread throughout the world in a meaningful way in Colemêrg. The foremost writers and poets of Kurdish literature in this area have been guides for other next writers and poets. In Doskian Mountains, during the era of the 20th century, some writers from the Gulordian family also narrated their words by following the ancient literature forms in Kurdish Literature. The Gulordian family originates from the Doskian Tribe. Most of the Members of The Doskian tribe lives in Duhok and Gever. The Gulordian family keep on living in the Village of Glord which is in Gever. This family has grown up many famous writers and scholars. One of the most important writers, politicians and scholars in this family is undoubtedly Mullah Hussain Doskî. Mullah Hussain was born in Gulord Village at the end of the 19th century. Later, he became the Minister of the Justice in Kurdish Republic of Mahabat. The other two people in this family, who developed so much in Kurdish Literature, are Mullah Ahmad Gulordi and Mullah AbdulMajed Gulordi. Mullah Ahmad was both a scholar and a writer. He was a modest person and also did not take the world things into consideration in his life. His impact on society increased and increased. Mullah Ahmad was also born in late of 19th century, too. He was identified as a well-known and Scholar person in his area. Mawludush-Sheriff in Kurdish Language was written by Him. He has also written a Poem book in Persian Language about Yermuk War. His Mawludush-Sheriff has taken its place in this thesis and article. Mullah Abdulmajed is also a poet and a great person in this family. He was born in 20th

century and he is still alive in society. He has written many poems and his book "Guldeste" also takes its place in this thesis or article, too. These important and great people take a great role not only in the field of Kurdish Literature but also in society as well. People in the area have applied to these people to resolve their social and religious problems and issues in society. This article also provides some information about Colemêrg and Geve, too. The lives of Mullah Hussain, Mullah Ahmad and Mullah Abdulmajed have been written in this thesis. Also the text of Mullah Ahmad "Mawludash-Sheriff and the book of Abdulmajed "Guldeste" have been analysed in terms of literature and content.

Keywords: Mullah, Doski, Colemêrg, Geve, Guldeste, Mewlud, Destxet.

Number of the pages: 216

Supervisor: Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

PÊŞGOTIN

Di nav Kurdan de hindê binemal hene di warê edebiyata Kurdî de gelek xizmet kirine. Binemala Gulordiyana jî ji yek wan binemalan e. Gelek alim, edîb û zana jê derketîne. Belê heta niha kesê dengê wan nebihîstîye û hay jê nebûye. Şexsîyetekî vê binemalê Mela Husênê Doskî ye. Wî li Îranê herêma Kurdan qazîti kiriye. Di sala 1954an de ziviriye Geverê û heta diçe ber dilovaniya Xwedê li wêrê niştecih dibe. Mela Ehmedê Gulordî û Mela Ebdulmecîd jî kesayetên edîbin ji nav binemala Gulordiyana derketîne. Li Bajare Culemêrgê navçeya Geverê li gundê Gulordê jiyana xwe derbas kirîne. Di herêmê de ev şexsîyetên vê binemalê bi ‘ilm û edebiyatê ve mijûl bûne. Vê binemalê, şexsîyetên alim û edîb perwerde kirîne. Ev şexsîyet ji bo civakê bûne rênîşander û ji bo xelqê xwe bûne ronahî. Ji bo êkatiya civakê harîkariya wan cihekê girîng girtiye. Mebesta me ew e ku van kesayetên vê malbatê biden nasîn, vekolîne li ser berhemên wan bikin û nîşa civakê biden û valahiya vê qadê telafî bikin. Ew berhemên niha di vê teza me de “Mewlûdûş-Şerîf” a Mela Ehmed û “Guldeste” ya Mela Ebdulmecîd in. Mijara xebata me ev her du berhem in.

Edebiyat ji bo hemî miletan cihekê girîng digire. Mirovên edîp wek neynika civakê ne. Edîb wek tercûmanên xelqê xwe ne. Bi saya ediban riha miletîniyê dimîne li gel civakan. Civaka hay ji edebiyata xwe nebe, di dahatûyê de ew civak dê mehkûmî esaretê bibe û dê birize. Edebiyat di jiyana miletan de cihek girîng heye. Ji ber vê girîngiyê me xwest danasîna edîbên binemala Gulordiyana û berhemên wan bikin.

Piştî Komara Tirkiyê hatiye avakirin û heta salên dûmahiyê de li bakûr edebiyata Kurdî di rewşa herî jar û qels da bû. Wextê Mela Ehmed mewlûda xwe nivîsî rewşa kembax bi hemî aliyên nebaş ve xwe nîşa dabû. Rihên edebiyata Kurdî ber bi hişk bûnê ve diçûn. Ev e jî cihê şanaziyê ye ku Mela Ehmed ev berheme di wan şertên nexweş de nivîsiye. Di vê rewşa bêweç de destekê gula ji jiyana Pêxemberî ya bo nîşên nû kiriye diyarî. Mela Ebdulmecîd jî Guldesteya xwe di demekê wesana de nivîsiye ku Kurdî axiftin di nav Kurdên bakûr de hedî hedî kêmbûye. Me hez kir ku ev berhemên bi qedr û qîmet berze nebin, nîşên taze bi edebiyata bab û qalên xwe agahdar bibin.

Mijara vekolîn li ser hatiye kirin heke em bibînîn berçav di lîteratûrê de heta niha çî xebatên akademîk li ser nehatîne dîtin. Ji ber vê çendê eve xebatek êkemîn e di vî derbarî de hatiye kirin. Bi vê xebata me ev berheme dê cihê xwe di lîteratûra edebiyata Kurdî de girin û dê derkevin meydanê. Ev tez ji bo xebatên îro paşve li ser vê binemalê û berhemên wan yên edebî benê kirin dê bîte palpişt. Her wesa ev berheme dê geşedanekê dene ziman û edebiyata Kurdî. Ji ber hindê me xwest ku ev berheme nemînînin kuncêtarî de û di nav toz û xebare de nerizin.

Di derbarê kesayetên binemala Gulordiyân de çî agahiyên nivîskî me peyda nekirin. Ji ber hindê agahiyên derheqê van kesan de di vê tezê de hatîn nivîsîn, me hevdîtin li gel eqreba û ew kesên vê binemalê dinasin kirin. Navên wan kesan me li têbîniyan de nivîsîne. Destnivîsa mewlûdê me li gor standartên herfên navneteweyî latînîze kirin. Mewlûd ji aliyê rûxsarî û naverokê ve hate tehlîl kirin. Ferhengokek bo mewlûdê hate çêkirin. Mela Ebdulmecîd Guldesteya xwe hem bi herfên Erebî, hem jî bi herfên latînî nivîsî bû. Carek din li ber metnê herfên erebî li gor standartên nawnetewî hate latînîze kirin. Guldesta Mela Ebdulmecîd jî ji aliyê edebî û naverokê ve hate tehlîl kirin. Di nav vê tezê de navên çend melayên binemala Gulordiyân derbas dibin. Ji ber ku çî agahiyên nivîskî di destê me de nebûn tarîxên wîladet û wefata wan nehatiye nivîsîn. Me di semînera teza xwe ya bilin de behsa Mela Husên û gotinên wî yên wecîz kiribû. Ji ber ku di derbarê edebiyatê de me çî berhemên wî peyda nekirin, bes di destpêka teza de bi kurtasî behsa jiyana Mela Husên hate kirin.

Di destpêkê de li ser Bajarê Culemêrg û navçeya Geverê agahî hatin dayîn. Beşa yekem de di derheqê jiyana edîbên binemala Gulordiyân de agahî hatin dayîn. Her wesa di vê beşê de di derheqê rûxsarî û naverokên berhêman de agahî hatin dayîn. Beşa duyem de jî metnê mewlûd û pirtûka Guldeste cihê xwe girt.

Di nivîsîn û amadekirina vê tezê de gelek kesan harikariya me kirin. Berî her tiştêkê ez ji bo şewirmendê xwe Doç. Dr. Mahmud Dündar minetdar im. Di pêwajoya amadekirina vê tezê de û pirsgerêkên derketîn berahiya me ewî harikariya xwe ji me kêr mekir û ji aliyê teknîkî de rê nîşa me da. Dîsa ez spasîyên xwe pêşkêşî Doç. Dr. Nesîm Sönmez, Dr. Öğretim Üyesi Mazhar Tunç, Tehsîn Îbrahîm Doskî, İzettîn Seven, Yaşar Kaplan re dikim. Ji ber ku wan kesan piştevaniya min kir.

Kerem Engin-Hekarî 2019

KURTEBÊJ

Aw.	Amedekar û Wergêr
b.	Beyt
c.	Cild
DÎA.	Diyanet İslam Ansiklopedisi
h.	Hicrî
hwd.	Her weke din
Hz.	Hezret
GEG.	Guldesta Ebdulmecîdê Gulordî
MEG.	Mewlûda Ehmedê Gulordî
M.D., K.E.	Mahmut Dündar, Kerem Engin
m.	Mîladî
r.	Rûpel
r.‘e.	Radiyallahu ‘enha
s.x.l.	Silavên Xwedê li ser bin
Teh.	Tehqîq
TTK.	Türk Tarih Kurumu
Wrg.	Wergêr
w.	wefat

TABLOYA TÎPGUHÊZÎYA KURDÎ

ا (Ā)	A a (E e, Ê ê, I i, U u)	ص	Ş ş
ب	B b	ض	Đ đ
پ	P p	ط	Ṭ ṭ
ت	T t	ظ	Z z
س	Ş ş	ع	‘
ج	C c	غ	Ġ ġ
چ	Ç ç	ف	F f
ح	H h	ق	Q q
خ	X x	ك	K k
د	D d	گ	G g
ذ	Z z	ل	L l
ر	R r	م	M m
ز	Z z	ن	N n
ژ	J j	و	W w, O o, U u, Ê ê,
س	S s	ه	H h
ش	Ş ş	ی	Y y

NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET	III
ABSTRACT.....	V
PÊŞGOTIN	VII
KURTEBÊJ	IX
TABLOYA TÎPGUHÊZÎYA KURDÎ.....	X
DESTPÊK	1
I. Rewşa Bajarê Hekariyê û Geverê	1
II. Edibên Hekariyê	2
III. Navçeya Geverê	3
IV. Herêma Doskiyan.....	4
V. Malbata Gulordiyên	4
VI. Medresên Herêmê.....	5
VII. Mela Husênê Doskî	6
VIII. Mewlûd.....	9
IX. Di Edebiyata Klasîk de Mewlûd	9
X. Di Edebiyata Kurdî de Mewlûd	10
1. EDÎBÊN MALBATA GULORDÎYAN Û BERHEMÊN WAN	11
1. 2. MELA EHMEDÊ GULORDÎ Û MEWLÛDA WÎ.....	11
1. 2. 2. Mewlûda Mela Ehmedê Gulordî	13
1. 2. 3. Cuwankarî/Huner	15
1. 2. 4. Nezîm.....	19
1. 2. 5. Beytên Teslîyê.....	19
1. 2. 6. Zimanê Mewlûdê.....	20
1. 3. JI EDÎBÊN MALBATA GULORDIYAN MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ.....	33
1. 3. 1. Ji dayik bûna wî.....	33
1. 3. 2. Mexlesa Wî	33
1. 3. 3. Xwandina Wî.....	34
1. 3. 4. Zewaca Wî	35
1. 3. 5. ‘Eleqa Mela Ebdulmecîd li gel Edebiyatê.....	35

1. 3. 6. Helbestên Mela Ebdulmecîdê Gulordî.....	37
1. 1. Mewludûş-Şerîf.....	64
2. 2. Guldeste	94
ENCAM.....	166
ÇAVKANÎ.....	168
PÊVEK 1	170
PÊVEK 2	177



DESTPÊK

I. Rewşa Bajarê Hekariyê û Geverê

Li welatê Kurdistan bajarekê qedîm jî Culemêrg/Hekarî ye. Şûnwarên kevin niha jî xwe li vî bajarê dîrokî diyar dikin. Bizavên mirovahiyê di serdemên neolotîk de li vî bajarê kevnare destpê kirine. Bermahiyên dîrokî yên wek dêr, dêrhe, kel, pir, mizgeft, medrese û gelek nivîsên li ser beran/keviran jî kevnatiya bajarê Hekariyê nîşa didin. Hekarî demên qedîm û heta îro bûye cihê mirovahiyê û cihê jiyanê. Hekariyê bi gelek teybetmendiyên ve berê mirovahiyê daye xwe. Erdnigariya Hekariyê bala gelek şaristaniyan kêşaye ser xwe. Di nav çiyayên Hekariyê yên asê de landika şaristaniyê ya hatiye hejandin. Di vê landika qedîm de gelek mirovên alîm, zana, siyasetmedar, edîp, helbestvan, aqilmend yên mezin bûn. Li nav van çiyayên asê hatin û çûna mirovan bizavek çanda qedîm avakiriye. Mîletên xwedan dînen cuda li vî bajarî niştecîh bûne. Bi vî avayî têkiliya mirovahiyê li bajarê Hekariyê çêbû ye. Vê tekilîya mirovahiyê çandek hevpar li bajarê Hekariyê înyê wicudê. Li bajarê Hekariyê jiyan, mirovahî û şaristanî heta serdemên neolotîk paşve diçe. Li vî bajarî çalakiyên mirovahiyê serdemên neolotîk destpê dike. Di salên dawîyê de lêkolînên derheqê bajarê Hekariyê de hatîne kirin ji bo vê çendê palpiştîyê dikin. Li gor agahiyên lêkolîneran di sala 1998an de bi avayekê ketober li bajarê Hekariyê di kela Mîr de 13 kêl hatine peyda kirin, li gor van tespîtan ev kêle yên serdemê neolotîk in¹. Her wesa Culemêrg bûye navenda gelek hukûmetên Kurdistan. Hukûmetên Kurdistan rojhelat heta Îranê, bakûrî heta Wanê, rojava heta Cizîrê û başûr heta Mûsilê destheladarî kirin e. Wextê Tîmûrleng bidest êrişên eskerî kirî Mîrê Hekariyê Îzzeddîn Şêr bûye, hidûdên mîratiya wî heta Wan û rojhelatê jî heta herêman Hoy û Selmasa berfireh bibûn, eleqeyên Îzzeddîn Şêr li gel Sultanê Memlûkiyan di pêleka bilind de bûn, wî zemanî serokê Misrê, Şamê û Yemenê çawa qedrê Usman Gazî girtine her wesa qedrê Îzzeddîn Şêr jî yên girtîne û Qralên van herêman di peyama xwe de çawa xitaba Osman Gazî kiri ne, her wesa xitaba Îzzeddîn Şêr jî kirî ne²

Bajarê Hekariyê bi teybetmendiyên coğrafîk jî cihek gelek muhîm e. Bi xweza, deşt û dolan, zozan û rûbaran, çil û çiyayayên xwe ve bala şopgeran dikêşîte

¹ Oktay Bellî, "Hakkari'de Bulunan Hubuşkiya'lı Prenslerin Kabartmalı Dikilitaşları", *Tarihte Hakkari Sempozyumu, Hakkari Üniversitesi Yayınları*, Ankara 2014, r. 19.

² Zîrar Sadiq Tawfiq, "Îzzeddîn Şêr Hakkari", *Tarihte Hakkari Sempozyumu, Hakkari Üniversitesi Yayınları*, Ankara 2014, r. 113-116.

ser xwe û ji bo geştûguzariyê jî cihekî girîng e. Taybetmendiyên vê coğrafyayê jî tama xwe daye wan mirovan yên li vê herêmê niştecih bûn. Hekarî niha dikevîte rojhelata Tirkiyê. Di aliyê aqarî de bajarê Tirki yê 47. ne. Îro aqarê Hekariyê 7.121 km² ye. Li başûrê Hekariyê Îraq, li rojava Şirnex, li bakûr Wan, li rojhelat jî Îran e. Ev tixubê yên ser demê komara Tirkî hatîne çêkirin. Tixubên wîlayeta Hekariyê yên serdemê îslamê ji aliyê rojhlatê heta Azerbaycanê/Îran, li bakûrî wîlayeta Wanê, li rojava heta Cizîra Botan, li başûri jî heta wîlayeta Mûsilê bûn.³

Serdemên neolotîk û heta îro wargeh û bingehên kevin li vê herêmê çandek qedîm avakirî ye. Li paş civaka vî bajarî çalakîyên mirovahiyê yên bi hêz tesir li ser çand û edebiyata vê heremê kiriye. Ji ber vê tesîra çanda qedîm bi sedsalan ji dîroka kevin bo me hatî gelek edîb, helbestvan, ehlê ilm û irfanê di nav rehma xwe de perwerde kiriye. Aliyê folklorê, xwarin û vexwarinê, cil û bergan, berik û mehfûran de jî gelek motif û nimûneyên jiyanê û eserên hilberîna mirovahiyê îro jî li vî bajarî ber çav in. Mirên Kurdan patronajîya helbestvanan kirine. Mirên Hekariyê jî helbestvan himaye kirine û teşfîqa wan bû xizmeta çanda kurdî kirine. Serdema mirektiyan ji bo edebiyata kurdî serdemek zêrîn e⁴. Herwesa hindêk Mîrên Hekariyê bi xwe jî helbestvan in û xwedan dîwan in. Wek Mîr Îmadeddîn (w. 1049) û Pertew Begê Hekarî (w.1257)⁵.

Di jêderan de behsa peyva Hekarî nehatiye kirin. Bes hatiye gotin ku ev peyve navê eşîreka koçeran e. Ev eşîre li demên kevin nezîkî Gola Wanê dijî. Hindêk lêkolîner dibêjin Hekarî ji peyva “akarî/hakarî” hatiye dariştin, derbasbûna deman bûye Hekarî. Hindêk lêkolîner jî dibêjin ev nave ji navê eşîreta “Herkariyan” hatiye.⁶ Bajarê Hekariyê bi navê Culemêrg jî navdar e. Hindêk dibêjin Culemêrg ji peyvên cû û mêrgan hatiye çêkirin. Hindekan jî gotiye ev peyve ji çol û mêrgan pêk tê.

II. Edibên Hekariyê

Gelek edîb û helbestvanên kevin ji bajarê Hekariyê derketîne. Edebiyatnasan di berhemên xwe de behsa helbestvanên Culemêrgê kirîne. Hindî ku min tespît kirî li gor jêderan yazdeh kesên Culemêrgî nûnerên edebiyata Kurdî ya klasik in.

³ Yusuf Hasan, Derviş Hirori, *Welatê Hekari*, Çapxana Xanî, Duhok 2010, r. 32.

⁴ Abdurrahman Adak, *Despêka Edebiyata Kurdî*, Nûbîhar, İstanbul 2013, r.147.

⁵ Adak, r. 166.

⁶ Yusuf Hasan, Derviş Hirori, r. 32.

Ebdisemedê Babek (w. h. 1020)⁷, Elî Herîrî (w. h. 470)⁸, Ebdulberakatê Hekarî (w. h. 615)⁹, Şêx Hesenê Hekarî (w. h. 644)¹⁰, Feqiyê Teyran (w. h. 702)¹¹, Mîr Îmadeddînê Hekarî (w. h. 1049)¹², Mela Ehmedê bateyî (w. h. 900)¹³, Ehmedê Xanî (w. h. 1121)¹⁴, Pertew Begê Hekarî (w. h. 1257)¹⁵, Evdîrehîm Rehmî (w.h. 1378)¹⁶ xelqê Culemêrgê ne. Ji ber vê yekê di dîroka edebiyata Kurdî de Culemêrgê cihek girîng heye. Klasîkên edebiyata kurdî yên ewil hatîne nivîsîn wekî diwana Feqiyê Teyran, mesnewiya Ehmedê Xanî û mewlûda Mela Husênê Bateyî û hwd. bi devoka Hekariyan hatîne nivîsîn.

III. Navçeya Geverê

Li gor nêrînekê wateya peyva “Geverê” ew erdê rast, erdê av li ser dikeve, erdê cûyên avê li ser hebin” e. Gever bi “deşta pûş û peşengê” jî hatiya bi navkirin. Wextê giya hişk dibe dibêjinê “pûş”. Peşeng ji pêve hatiye ristin. Wek gil û giya, dar û mar, agir magir, zelam melam, jin û min û hwd. Her wesa gotîne Geverê jî deşta pûş û peşengê. Deşta Geverê gelek bi gil û giya ye. Qamîşê deşta Geverê gelek bilind dibe. Ew giya û qamîş di halê xwe de hişk dibe. Li gor gotinan Rûstemê Zal havînan dihate deşta Geverê. Gever wek havîngehekê bo xwe bi kar îname. Vêca ew giya û qamîşê hişk bûye û bûye puş, ji ber vê yekê gotiyê deşta pûş û peşengê. Deşta Geverê gelek bi nav û deng e. Gotin û mesele pê hatîne gotin.¹⁷

Dîroka te çend sal e
Deşt û dol û nihâl e
Sala Rûstemê Zal e
Bo min yar û war û heval e
Deşta pûş û peşengê¹⁸

Gever, Çel, Rûbarok û Şemîzdîna navçeyên Culemêrgê ne. Nevçeya mezintir Gever e. Gever dikevîte navbira sê dewletan, Tirk, Îran û Îraq. Li rojhelatê Geverê

⁷ Adak, r. 147

⁸ Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Öz-Ge Yayınları, Ankara 1992, r. 57.

⁹ Feqî Huseyn Sagniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtiya Kurdî, İstanbul, 2014, r.119.

¹⁰ Sagniç, r. 125.

¹¹ Kurdo, r.70.

¹² Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 710.

¹³ Kurdo, r. 65.

¹⁴ Adak, r. 225.

¹⁵ Sagniç, r. 427.

¹⁶ Sagniç, r. 503,506

¹⁷ Salahatin Aslan, *Dîdar* (Adar, 2019), Gever/Culemêrg.

¹⁸ Salahatin Aslan, *Dîdar* (Adar, 2019), Gever/Culemêrg.

Îran, rojavayê Hekarî, bakûrê Îraq û başûrê jî Elbak e. Bilindiya deşta Geverê 2000m ne, firehiya wê 15 km² û dirêjahiya wê jî 40 km² ne.¹⁹ Sê eşîrên Kurdan yên mezin li Geverê niştecih in. Pinyanişî, Doskî û Dîrî. Eşîra pinyanişîya dikevîte rojavayê Geverê, eşîra Doskî dikevîte başûr û eşîra Dîrîyan jî dikevîte bakûrê Geverê. Çend qewmek din jî li Geverê niştecih in. Ew jî Satî, Bayî û Êremarî ne. Li navenda Geverê çend binemalên qedîm niştecih in. Ew jî Begzade, Evdûyî û Hinereyî ne. Ev binemale ji Îranê hatîne Geverê.²⁰

IV. Herêma Doskiyan

Çar babikên eşîra Doskiyan yên mezin hene. Çiyayî, Himbî, Katolî û Çêyî. Herêma Doskiyan dikevîte başûrê Geverê. Nezikî 45 gundên eşîra Doskiyan li Geverê hene. Nifûsa Doskiyên li Geverê nezikî 25000 e. Gundên Doskiyan yên qedîm Mêrgan, Piştqesir, Hacıyan, Xelkan, Şagulord, Gulord û hwd. in. Herêma Doskiyan nihaleke dikevîte başûrê Geverê. Rûbarek di vê nihalê de diherike. Herdû rexên nihalê gund in heta digehîte Gundê Oreomarê. Şînkatiya daristanên herêma Doskiyan xeml û koka xwe digire û mirovî cezb dike. Daristanên tarî û dengê avên rûbarî mirovî di nav rewşa xwe de niqo dikin. Gelek darên fêqî li vê herêmê hene. Dara gûzê, dara sêvê, dara girsîkan û hwd. li herêma Doskiyan pez û heywan jî tete xwedan kirin. Germahiya vê herêmê gelek bi şidet nîne, germahiyek edetî ye.²¹

V. Malbata Gulordiyên

Gulordî eslê xwe katolî ne. Katolî binemalek eşîra Doskiyan e. Niha ser pênc hizaran nufûsa gulordiyên heye. Malbata Gulordiyên malbatek melazade ye. Alimê di nav Gulordiyên de yê navdartir Mela Husênê Doskî ye. Mamê wî Mela Mihyeddîn û birayê wî Mela Hesen jî şexsiyetên alim û pir zana bûn. Di nav Doskiyan de eve malbateke qedîm e. Mela Ehmedê Gulordî jî ji vê binemalê ye. Mela Ehmedê Gulordî xalê Mela Husên e. Jiyana xwe li gundê Gulordê derbas kiriye. Şexsiyetek welî û arif bûye. Gelek mirovên zîrek, alim, zana, dengbêj û helbestvan li vî gundî derketîne. Ev malbate bi melatî û zanîna xwe di nav xelkê Geverê de meşhûr bûne. Berî Mela Ehmed bapîrê Mela Husên Xelîfe Xane Mîr hebûye. Xelîfe Xane Mîr li Gulordê medfûne. Berî Xelîfe Xane Mîr Mela Murteza hebûye. Xelîfe Xane Mîr

¹⁹ Yusuf Hasan, Dervîş Hirorî, r. 37.

²⁰ Fikret Yaşar, *Didar* (Nîsan, 2019), Gever/Culemêrg.

²¹ Reşî Han, *Didar* (Gulan, 2019), Gever/Culemêrg.

Xelîfê terîqeta Şêxên Nehrîyê bûye. Wî demî Xelîfêkî Şêxê Nehrîyê Xelîfe Hacıyê Peyla bûye. Pîştî Mela Murteza Mela Mehemed, Mela Ebdil Celîl hebûne. Ewe hemî melayên Gundê Gulordê ne²². Demê seferberiyê de gundê Gulordê xalî bûye. Ehlê gundî çûne Iraqê, hindêk hatîne girtin, ketine destê Êrîsî de û êxsîr bûne. Ew kesên ketine destê Êrîsî heta niha jî xeber jê nehatiye wergîrtin²³.

VI. Medresên Herêmê

Medrese di alema Îslamê de saziyên perwerdeyî yên belavbûyîne. Medresên Kurdan di sedsala 10an de destpê diken û sedsala 15an de cihê xwe di sazîbûnê de girtîne²⁴. Di van medresan de gelek alim û edîbên kurdan yên derketîn.

Koka edebiyata Kurdî li medresan destpê kiriye. Alim û helbestvanên Kurd yên muhîm wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Cigerxwîn û hwd. di medresên Kurdan de perwerde bûne. Bi desteka Mîrên kurdan û harîkariya milletê Kurd gelek Medrese hatîne avakirin. Li bajarê Culemêrgê jî çend medrese hatîne avakirin. Medresa Zeynel Beg di 1560-1578an de Culemêrgê li taxê bajêrî hatiye avakirin²⁵. Niha jî şûnwarên vê medresê diyar in. Medresa meydanê salên 1700-1701an de Îbrahîm Begê Hekarî ava kiriye²⁶. Ev medrese niha jî li ser linga ye. Zankoya Culemêrgê restore kiriye û wek kevnarxanekê çanda herêmê tê de diête muhafeze kirin.

Medresek qedîm li gundê Gulordê hatiye avakirin. Xelîfe Xane Mîr li vê medresê mudderîsî kiriye. Medresê gelek milk, erazî, gurangeh û darên feqî hebûn. Niha jî milkê medresê gelek heye. Navê vê medresê “Medresa Gulord” digotinê. Li gor agahiyên bo me hatîne gotin ev medrese 200 sala zêdetir e li Gundê Gulordê hatiye avakirin.²⁷

Mexberek qedîm li gundê Gulordê heye, dibêjinê mexbera “nava gamê”. Mexberek mezin e. Ev mexbere nêzîkî medreseyê ye. Li vî gundî ilm û irfan û jîyan û mirin hemî li gelêk bûne. Ev e jî teybetmendiyêke gund û bajarên şaristaniya îslamê ye. Jîyan û mirin pêkve bûne.

²² Mecit İliş, *Dîdar* (Adar, 2018), Gevê/Culemêrgê.

²³ Mecit İliş, *Dîdar* (Adar, 2018), Gevê/Culemêrgê.

²⁴ İbrahîm S. Işık, *A'dan Z'ye KÜRTLER*, Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 315.

²⁵ Kadîr Yıldırım, *Kürt Medreseleri ve Alimleri*, Avesta, İstanbul, 2018, r. 443.

²⁶ Yıldırım, r. 443.

²⁷ Mecit İliş, *Dîdar* (Adar, 2018), Gevê/Culemêrgê.

VII. Mela Husênê Doskî

Mela Husênê Doskî di sala 1898an de li devera Doskiyan li gundê Gulordê yê hatiye dinyayê. Gundê Gûlordê (Bostancık) bi navçeya Geverê ve girêdayî ye û dikevîte başûrê Geverê. Navê babê wî Ebdulezîz e. Bapîrê wî Hecî Xelîfeyê Xanemîr e. Babê wî li gundê xwe rênçberî kiriye. Navê dayika wî Terê ye. Birayekî Mela Husên hebûye, navê wî Hecî Mela Hesên bûye. Gor gotinên mirovên wî Mela Hesên jî bo zanîna xwe her wekî Mela Husên bûye. Belê qebîliyeta Mela Husên ji ya wî zêdetir bûye, ji ber vê çendê xelkê Mela Hesên gelek nenasiye. Xwişkek wan jî hebûye. Li muhaciriyê di bin keprê/eywan de diçîte ber dilovaniya Xwedê. Kiçeka/qîzeka wî hebûye, navê wê Seadet bûye, birûsk lê didet û emrê Xwedê diket.

“Berî şerê yekemîn yê Cîhanê diçîte Îraqê û li bajarê Mûsilê dest medresê diket.” Li gor hindêk gotinan wextê seferberiyê li gel mamê xwe diçîte Îraqê û li Mûsilê dest bi xwandinê diket. Qene’eta bo me çêbûy ev e ku Mela Husên di seferberiyê de yê çiyê Mûsilê. “Min ji Mela Husên bihîst, ewî digot: Wextê seferberiyê de umrê min dazdehh-sêzdeh bû, em li ser çiyayên Satê re derbasî Îraqê bûn, ew zelumên ez li gel diçim bo muhaciriyê destê min digirtin.”²⁸

Piştî muhaciriyê ew û mamê xwe bi tenê dimînin jiyanê. Mirovên wan yê din hemî jiyana xwe ji dest didin. Piştî zivirîna Muhaciriyê dîsa diçîte nik Mela Mecîdê Dêlezî. Gundê Dêlezî di kevîte devera Dirîya, li ser beldeya Esendere bi navçeya Geverê ve girêda ye û dikeve bakurê Geverê. Mela Mecîd şagirtê/feqîyê Seîd Nursî bûye û li ber destê wî xwandî ye. Mela Mecîd çar sala li Konyayê qazîtî kirî ye. Piştî hingê neqla xwe didete bajarê Wanê. Dema şoreşa Ataturk de, inqilaba şewqe û gelek inqilabên bi eksê ehkamêt Îslamê tên kirin, Mela Mecîd vê zulmê û neheqiyê qebîl naket. Wextê Şêx û mezinên Kurdan tene îdamkirin, her wesa îdama wî jî derdikeve. Qeymeqamê wî zamanî dibêjîtê Mela Mecîd, heke tû xwe xilas nekey, dê bêye girtîn. Xeberî didine Simkoyê Şikakî (1887-1930). Simko 40 zelumên bi tifeng rêdiket û rexê gondê Dêlezî digirin û Mela Mecîd ji gundî dertêxin û xilas dikin. Hingê qerekoleka eskerî jî li gundî hebûye.²⁹

²⁸ Mecit İliş, *Didar* (Adar, 2018), Gever/Culemêrg.

²⁹ Abdulkadir Alkan, *Didar* (Çileyê Pêşîn, 2017), Gever/Culemêrg.

Mela Husên ewil li nik Mela Mecîd yê xwandî, piştî hingê yê çiyê Mûsilê. Şerê Cihanê yê ewil muhacir dibin û diçine Îraqê. Piştî heyamekê xwandina xwe dewam diket û dizivire gundê xwe.³⁰

Mela Husên ji bo xwandinê carek din diçe nik Mela Mecîd. Li dev Mela Mecîd ilmê serf û nehwe, dersen fiqhê, feraîzê û dersen edebiyata Farisî dixwîne. Her wesa li nik hindê seydayên din jî dersan werdigire. Yek ji wan seydayan jî Mela Ehmedê Kiçke ye. Mela Husênê Doskî zanayekê piralî bû. Ne bi tenê mela bû. Li gel ilmen dinî, feraîz, cebir, astronomi, tip û ilmê krîptolojîyê jî dizanîn. Dîyar Mihemed Doskî berî mirina Mela Husên di salên 1990an de gotarekê li gel diket û wan gotina ji wî neqil diket:

“Li Îranê min medresa dînî dixwand, Şahê Îranê derê medresên dînî girtin/qedexekirin. Ez mecbur bûm, çime medresên din, di medresê din de dersen matematîkê, fizîkê û kîmyayê min wergirtin. Ez geheştim asteke wesa min terîfa sirê cihazên telsîz/bêtêl zanîn û ez wî warî de bo me pîspor”³¹

Piştî icazetnameya xwe distine, Mela Mecîd kiça xwe Gûlşayê li Mela Husênê Doskî nikah diket. Daweta wî li gundê Temerxanê Hinareyî li Xelîla diken. Piştî hingê li gundê Mawanê dera didet. Ew gundê Reşît Begê Herkî ye. Bi bajarê Urumiyê ve yê girada ye.

Gelek feqîyan li nik Mela Husên xwandin kiriye. Li Îranê Feqî Muhemed, Seyid Xalit, Seyît Qesîm, li Gevê jî Mela Mecit Basmacı, Mela Xalid Qewal, Mela Mecîd Îliş, Mela Birahîmê Zînê, Mela Xalit Yıldız û Mela Şerafedînê Gulordî li ber destê Seyda feqîtî kirine. Li Îranê rojên eynî feqîyan selewat bi dengê bilind dixwandin. Ew kesên li devera medresê dirûniştin dengê salewatên wan dibihîstin û wan jî li gel feqîyan selewat dixwandin. Mela Husên ehlê mala xwe jî ji ilmê xwe bê par nedikir. Ji bo ehlê mala xwe jî car caran helbest, hikaye û hedîsên Pêxemberî (Silavên Xwedê li ser bin) dixwandin. Feqîyê taze bidest xwandinê dikir digotinê suxte, ew feqîyên xwandina xwe de pêşve çiyîn digotinê musteîd. Mela Husên ders dida musteîdan.

³⁰ Abdulkadir Alkan, *Didar* (Çileyê Pêşîn, 2017), Gevê/Culemêrg.

³¹ Dîyar Muhemed Se'îd Doskî, el-hîcretû 'ereftenî 'ela wezîrû 'edlî Cumhuriyetî Mihabat, *Kovara Metîn*, Duhok, 1992, Tîrmeh, r. 79.

Di sala 1946an de di bin serokatîya Qazî Muhemmed de Komara Mihabadê hatê avakirin. Li gor hindêk agahiyan Mela Husênê Doskî wezîrîtiya Komara Mihabatê ya kirî. Sala 1992an Diyar Muhemmed Se'îd Doskî li Geverê hevdîtinekê li gel Mela Husên diket. Li gor agahiyan vê hevdîtînê Mela Husên li Komara Mihabatê yê bûye wezîrê 'edaletê.³² Hêj salek tamam nebûyî Komara Mihabatê têk diçe û xirap dibe. Mela Mistefa Barzanî wextê diçît bo Êrisî, tete nik Mela Husên û dibêjîtê: "Xwe hazir bike û li gel min were da biçîn nav Êrisî." Piştî hingê Mela Husên tete nik xwezûrê xwe Mela Mecîd da destûra xwe jê wergirît, Mela Mecîd dest bi giriyê dîke û dibêjîtê:

"Qurban! Ew mesela tû dûv diçî, ne tû dibînî, ne jî ez, Êris jî dewleteke baş nîne, dîsa jî heke tû diçî, Xwedê oxira xêrê bide te."

"Wextê Mela Mistefa hatî hez kir Mela Husên li gel wî biçîte Êrisî, Mela Husên li gel neçî, heta hidûdê Îranê li gel çî û zivirî ve." Mela Mistefa bi silbûn ji nik wî çî bo Êrisî"³³

Mela Husênê Doskî dema şahê xanedana Pehlewîyan de, li rojavayê Azerbeycanê dibîte qaziyê fermî. Li vê herêmê Kurd û Faris û Azerî niştecih bûn. Wî zemanî Şahê Îranê mesûliyeta îdareya vê herêmê didete Mela Husên. Heta sala 1954 dizivirîte Tirkiyê vê wezîfê bi kar tînit. Ev herêm di bin tesîra Keremê Umer, Hesên Axa, Rustem Beg, Beşîr Beg da bû. Li vê herêmê axa neheqî li xelkê dikirin. Şahî desthilatiya vê herêmê teslîmî Mela Husên kiribû. Li gor gotina eve Siyaseta Şahî ye ku vê herêmê bi şexsiyetekî wekî Mela Husên ve îdare biket. Mela Husên mirovek hişyar bûye û neketiye vê leyîstikê de. Heke Mela Hûsên ev axaye dabane girtin, da

³² Diyar Muhemed Se'îd Doskî, r. 79.

Ev kese Mela Husênê Doskiye an ne? Hindêk dibêjin ev kese Mela Husên Mecdiyê Gewirkî ye li Mihabatê jiyaye. Diyar Muhemed Se'îd Doskî vê hevdîtina xwe ewa li gel Mela Husên Doskî kirî 1992an de li Duhokê di kovara Metîn de weşandiye. Divê meqalê de Mela Husên behsa çend leqebên xwe dîke. Ew leqebe jî; Mecdî, Geverî, Kotolî û Çêyî ne. Diyar Muhemed Se'îd Doskî bi xwe li gel Mela Husênê Doskî rûbirû diaxive. Van agahiyan jî devê Mela Husên vediguhêze. William Eagleton di pirtûka xwe ya Mihabad de behsa kabîna Qazî Muhemed dîke û van agahiyan dide. "Mela Husên dibîte wezîrê edaleta Komara Mihabadê û xwedan qedrêkê mezin bû, bo ilmê xwe jî hemî alimên Mihabadê serdestir bû. (William Eagleton, Mihabad, Wrg: (Cercis Fethullah) Daru Aras Lit-Tibaeti Ven-Neşr, Erbil 2012, r. 122.) Bes Wîliam behsa nasname wî nakin ku em bizanîn ka eve kîj Mela Husên e. Ji bilî meqala Diyar Muhemed Se'îd Doskî çî agahî û delîl di dest me de nînin. Ji ber hindê em nabêjin ev kese misoger Mela Husênê Doskî ye. Belê hindî ez li gel kiçên Mela Husênê Doskî Mehsîma Xanim û Letîfe Xanimê jî axiftin wan jî behsa eleqeyên Qazî Muhemed û babê xwe bo min dikir. Her wesa gelek kesên din ewên Mela Husênê Doskî baş dinasin behsa Qazitîya Mela Husênê Doskî diken.

³³ Evliya Alkan, *Didar* (Çileyê Pêşîn, 2018), Gever/Culemêrg.

nabeyna Mela Husên û miletî nexweş bît, her wesa da nabeyna miletî bi xwe jî nexweş bît. Ji ber vê çendê Mela Husên ev tişte nekir û dest jî wezîfa xwe berda û di sala 1954an de zivirî Tirki li Geverê niştecih bû³⁴

Wextê seyda bi şolên mizgeftê ve eleqeder dibe, rojekê dikeve û serê wî zererê dibine. Di vê nesaxiyê de xwîn dirijîte ser mejyê wî, dikevît û heft rojan piştî hingê di sala 1993an de diçite ber dilovaniya Xwedê.

VIII. Mewlûd

Ji ber ku me di xebata xwe de behsa Mewlûda Mela Ehmedê Gulordî kiriye, me hez kir bi gelemperî behsa mewlûdê bikin.

Di zimanê Erebî de peyva mewlûdê ji w l d/ولد hatiye dariştin.³⁵ Bi wateya welidîn û welidandinê ye, مولد heke wek ismê zeman hat zemanê welidînê û roja jî dayikbûnê, heke wek ismê mekan مولاد hat wê demê bi wateya "cihê welidînê" ye.³⁶ Di lîteratûrê de ji bo demê wîladeta Hz. Muhemed peyva "mevlîd" ji bo demê wîladeta Hz. Îsa jî ji heman kokê hatiye dariştin bi peyva "mîlad" hatîne îfade kirin.³⁷

Ewil mewlûd ji bo wîladeta Pêxemberî hatiye bikaranîn, piştî hingê ehlê tesewwûfê wateya mewlûdê berfirehtir ji bo sersal û wîladeta welîyan jî bikar îname.³⁸ Hindî Pêxember di jiyanê de roja Ji dayik bûna wî nehatiye pîroz kirin, piştî wefata pêxemberî li serdema xelîfan, Emewî û 'Ebasiyan jî ji bo wîladeta Pêxemberî reûresm û ayîne nehatîne kirin, mewlûda Pêxemberî di zemanê Fatimiyan de hatiye pîroz kirin, her wesa di zemanê Eyyûbiyan de bûrayê Seleheddîn Eyyûbî Muzafferûddîn Kökbörî (1190-1233) mewlûd bi merasîmek mezin ya pîroz kirî³⁹

IX. Di Edebiyata Klasîk de Mewlûd

Di edebiyata Îslamê de mewlûd medheke ji bo xatira Pêxemberî hatiye nivîsîn. Di sala 604/1207an de Muzafferûddîn Kökbörî merasîmek mezin saz kir⁴⁰. Di vê merasîmê de cara ewil e ew mewlûda Îbnî Dihye el-Kelbî nivîsî bi navê *et-*

³⁴ Abdülkadir Alkan, *Dîdar* (Çileyay Pêşî, 2017), Gever/Culemêrg.

³⁵ Süleyman Çelebi *Vesîletü'n-Necat-Mevlid*, (Teh: Ahmet Ateş), TTK Yay., Ank., 1954, r. 1-3

³⁶ Çelebi, r. 1-3

³⁷ M. Fatih Köksal, *Mevlid-name*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2011, r.20.

³⁸ Ahmed Özel, "Mevlid", *DİA*, TDV., C. XXIX, r. 475, Ankara, 2004.

³⁹ Ahmed Özel, r.475

⁴⁰ Ahmed Özel, r. 480-481.

Tenvîr fî Mewlûdîs'-sîracî'l-munîr hatîye xwandin.⁴¹ Ka'b b. Zubeyr Kasîdetû'l-burde, Hassan b. Sabît helbest û Adullah b. Revaha methiye ji bo Pêxemberî nivîsîne. Bi giştî nivîskarên mewlûdan ilhama xwe ji van kesan wergirtîne⁴². Mewlûdên Erebi ji aliyê şikl û naverokê ve wek yek in. Ev mewlûde behsa wîladeta Pêxemberî, jiyana, nav, şekl û şemal, bêhnpakî/fazîlet, nûra Pêxemberî, hamîlebûna dayika wî, wefata babê wî, bûyerên harîqûlade, çina wî bo nik Helîmê, exlaqê wî, nîşanên pêxemberiya wî, mûcîzên wî, îsra û mîrac, danezan/teblîx û wezwên wî, zewacên wî, zarok û wefata wî dikin⁴³

X. Di Edebiyata Kurdî de Mewlûd

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî cihê mewlûdê gelek girîng e. Alimên Kurdan jî wekî alimên milletên musulmanan yê din gelek hez Pêxemberî kirine û li ser wî mewlûd nivîsîne. Mewlûda gelek meşhur di nav Kurdan de mewlûda Mela Husênê Bateyî (w.m.1760)⁴⁴ ye. Mela Husênê Bateyî ji bo nivîskarên mewlûdê yê piştî xwe yê bûye çavkaniya îlhamê. Wan nivîskaran gelek aliyan de mewlûdên xwe wekî wî nivîsîne. Ji aliyê detpêkê, dawîya beşan û piranî ji aliyê naverokê ve wek Bateyî nivîsîne û ilhama xwe ji wî wergirtîne. Hindek cihan peyvên wî û hevokên wî neqil kirîne.

Delîlên dest me de wesa nîşa didin ku mewlûda Kurdî bi Melayê Bateyî destpê kiriye. Heta serdema Bateyî Kurdan mewlûdên Erebi di xwandin. Gelek edîban ji bilî Bateyî mewlûd bi zimanê Kurdî nivîsîne. Li ser hejmara mewlûdên Kurdî dest me de agahiyên misoger nînin. Heta niha bi kurmancî 32, zazakî 7, soranî û hevremancî 10, tevahî 49 mewlûd bi zimanê Kurdî hatîne nivîsîn.⁴⁵

⁴¹ Özel, r.480-481.

⁴² Özel, r.480-481

⁴³ Özel, r. 480-481.

⁴⁴ M. Xalîd Sadîni, Mela Huseynê Bateyî Jiyan û Berhem, Nûbihar yayinlari, İstanbul, 2010, r. 29-30.

Li ser dîroka wefata Mela Huseynê Bateyî gengeşî heye. Li gor Ganatê Kurdo Mela Huseynê Bateyî (m. 1491) çûye ber dilovaniya Xwedê. Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Öz-Ge Yayinlari, Ankara 1992, r. 65. Li gor Feqî Huseyn Sağniç jî (m.1755) de yê çûye ber dilovaniya Xwedê. Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtiya Kurdî, İstanbul, 2014, r. 405. Li gor agahiyên M. Xalîd Sadîni Bateyî li sala 1760an wefat kiriye. Li gor qene'eta me jî agahiyên Sadîni duristirin. Lewra Sadîni ev agahiye ji eqrebayên Bateyî wergirtîne. Her wesa agahiyên Feqî Huseyn Sağniç jî nezîkî agahiyên M. Xalîd Sadîni ne. Eve jî ji bo qene'eta me dibe palpişt.

⁴⁵ M. Zahir Ertekin, Mela Eliyê Bagustani û Mewlûda Wî *Muqedime*, doi: 10.19059, 41484, 2015, r. 101-138.

1. EDÎBÊN MALBATA GULORDÎYAN Û BERHEMÊN WAN

1. 2. MELA EHMEDE GULORDÎ Û MEWLÛDA WÎ

Em di vê beşê de bi berfirehî behsa jiyana Mela Ehmedê Gulordî, xwandina wî, zewaca wî û kesayeta wî dikin.

1. 2. 1. 1. Ji dayik buna wî

Binavê Mela Ehmedê Gulordî di herêmê de hatiye nasîn. Texmînî di sala 1849an de hatiye dinyayê. Nêzîkî sed û deh salan umir borandiye. Kurê sofî Xelîlê Gulordî ye. Bapîrê wî Mela Mihyeddîn jî li herêmê melayek bi nav û deng bûye. Maleka xwedan teqwa û arif bûye. Ji taxa zêzanî ye. Sê çar mal li wê taxî hebûn. Çi eqreba û kes û karên wî nebûn, yek male bûne. Bi tenê xwûşkek hebû, navê wê Terê bûye. Terê dayika Mela Husên û Mela Hesên bû. Dayika wî jî ji gundê Anûrê bûye.

Berî seferberiyê zelamek kamil bûye. Li gel gundiyan Rexê Îranê Bazîdê û Qamûşan li hemberî Êrîsî şer kiriye. Di wî demî de çend zelamet Gulordî tedbîra xwe diwergirin û hucûmê didene ser leşkerê Êrîsî, gelek zayiatê didine Êrîsî, roja paştir fermanarê leşkerê Usmaniyan siwal kir û got eve kîne? Milletî gotê eve Doskîne, mezinê wan jî Tahir Axa ye. Fermanarê Usmaniyan Tahir Axa gazî dike û dibêjê, milletê te di vî şerî de serketî bûye, ez hez dikim te xelat bikim. Tahir Axa gote Xelîl Paşa Gulordîyan ev şere berî xeberê min kiriye, min hay jê nîne, xelatî bide wan.

Gelek milket, darên gûzê û hasilata Mela Ehmed hebûye. Serweta wî piştî mirina wî bo Mela Husên û Mela Hesên dimîne. Çinkî ew xwarzayên wî bûn. Mala Mela Ehmed wekî tekyayêkê bûye.⁴⁶

1. 2. 1. 2. Xwandin û Feqiyên Wî

Niha di destê me de di derheqê Xwandina wî, seydayên wî, wezîfên wî û berhemê wî de çî agahiyên nivîskî nînîn. Ew wesîqeyên di van meselan de me ronîdar bikin em jê di mehrûm in. Bes agahiyên me peyda kirin me ji eqrebayên wî û gundiyan wî weguhastîne. Mela Ehmed li medresa Gulordê xwandiye. Berî seferberiyê tehsîla ilmi li Îranê û Îraqê devam kiriye. Seydayekî Mela Ehmedê Gulordî yê girîng Mela Mehemedê Kiçke ye li Îraqê. Herwesa Mela Mehemedê

⁴⁶ Mustafa Baskın, *Dîdar*, (Gulan, 2018), Geve/Culemêrg.

Kiçke seydayê Mela Husênê Doskî ye jî. Mela Ehmed mirovek gelek xwedan teqwa bûye. Şev zû radibû nivêja teheccudê. Piştî hingê xwe gîro dikir heta şeveqa spêdê, wextê nivêja subê dibû, du rikaêt nivêj sunnet dikirin, paşê ber quble dest dida bin serê xwe û xwe direj dikir, bêhnêkê wesa dima û paşê nivêja spêdê dikir. Wextê seferîba da bêjîte Mela Elî nivêjeka eşîrkî bo me bike. Gor Mela Ehmed nivêja eşîrkî jî ew bû ku bi usûl bi gîrokirin bête kirin. Feq ûmer, feq Usman, feq Elî û feq Ehmedê Gulordî û Mela Bekirê Şahî feqiyên wî bûn. Zimanê Erebi, Farisî, Tirkî û Kurdî dizanîn. Di zimanê Usmanî û ilmê feraîze de gelek zana û şarezaya bûye.⁴⁷

1. 2. 1. 3. Zewaca Wî

Mela Ehmed li gel xanima Rendê dizewice. Rendê jinek gelek aqil û zîrek û suhbet xweş bûye. Ji qebîla mala Mela Şemzîn û ji taxa Basûre bûye. Mirovên dayika wî gunde terk kirine û çine Îranê. Niha li Îranê niştetih in. Mela Ehmed kurek hebû, navê wî Mihyeddîn bû. Ciwaniya xwe de çîye ber rehma Xwedê. Piştî hingê Xwedayê mezin çî kerem li gel Mela Ehmed nekiriye û zarokên wî neçêbûne.⁴⁸

1. 2. 1. 4. Şexsiyeta Wî

Mela Ehmed mirovek gelek zana û mulayîm bûye. Di ilmê tarîxê de xwedan agahî bûye. Ji bo civata xwe gelek caran behsa tarîxa Hulagû, Cengîz Xan û wextê hatî bo cihê Anadoloyê û çûye Bexdayê dikir. Ev behsêt dîrokî hemî bo gundiyên xwe û civata xwe digotin. Mela Ehmed yekmale, feqîrane feqet Melatî di gundî de derbas kiriye. Mela Ehmed mirovek Xweda tirs bûye, heq huqêqê mirovan nexwarîye. Milk û zevîyên para xwûşka xwe jî dayîne. Gundê Gulordê hemî zarokên xwe rêdikirine nik Mela Ehmed da dersa Quranê bixwûnin. Li gundî çend îsanek nebana, heke hemiyên li nik Mela Ehmed ders xwandîne. Ew li Gulordê wekî ronahiyekê bû ji bo vê herêmê, di saya wî gelek îsanên dersa Quranê û dersên şerîetî dixwendin.

Medreseka kevin li gundî hebûye, belê mela Ehmed mizgefteka nû li taxê xwe avakir û feqî lê dane xwandîne. Mela Ehmed xîmên vê mizgeftê bi destê xwe çêkirin. Dema xîmê mizgeftê danandî gote miletî ka dê kî berê ewil danît. Piştî hingê ewî bi xwe gotê feq Elî tu here berê ewil dane. Ew jî çî berê ewil dana di xîmê

⁴⁷ Mecît İliş, *Didar*, (Gulan, 2019), Geve/Culemêrg.

⁴⁸ Mecît İliş, *Didar*, (Gulan, 2019), Geve/Culemêrg.

mizgeftê de. Feq Eli jî feqekê wî yê meşhur bûye. Bi vî awayî mizgeft çêkiriye û xizmeta ilmî kiriye. Di vî muhîfê de herkesekê guhê xwe daye û qedrê wî girtiye. Çi Mela li vê cîvarê nebûne. Bes Mela Ebdurrehmanê Şagulordî li vê cîvarê hebûye. Ev kese jî Xwedan ilm û irfan bûye.

Wextê mêhvan hatibane gundî heta neçibane mala Mela Ehmed belav gundî nedibûn. Mala wî ji bo xwarin û vexwarinan cihê mêhvanan bûye. Dilê çî kesî nedihêla û xeberê nexweş nedigote kesê. Heke ji jinika xwe aciz biba da bêjît kiçê şîdanê ka rûne xwarê. Wextê yek miriba li ser mexberê digiriya, heke gotibanê tu bo çî digirî, ewî digot ez bo halê xwe digirîm. Hûn jî ji bo wî mirî negirî her yek ji bo halê xwe bigirî. Mela Ehmed sala 1962an de çûye ber dilovaniya Xwedayê mezin.⁴⁹

1. 2. 2. Mewlûda Mela Ehmedê Gulordî

Di nav milletên muslîmanan de mewlûdê cihekê muhîm girtiye. Alimên muslîmanan ji bo viyana Pêxemberê xwe bi awayekê menzûm gotinên xwe îname zimanî. Mela Ehmedê Gulordî jî ji yek van aliman e bi zimanê Kurdî mewlûda xwe nivîsiye. Di bin vê binbeşê de ji aliyê şikil û naverokê ve behsa Mewlûdûş-Şerîfa Mela Ehmedê Gulordî dê ête kirin.

1. 2. 2. 1. Nusxa Mewlûda wî

Hindî ku me tesbît kirî ji bilî vê nusxa Mewlûdûş-Şerîf di destê me de çî nusxên vê mewlûdê nehatîne dîtin. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de behsa vê mewlûdê nahatiye kirin. Li gor zanîna me nusxa Meludûş-şerîfê bes di destê me de heye. Li gor lêkolîn û zanîna me heta niha çî nusxên din çî cihan nehatine peyda kirin.

Di dawîya mewlûdê di qeyda temmetê de ev mewlûde H.1356/M.1937an hatiye nivîsîn. Nivîskarî mewlûda xwe li ser defterek şexsî û rêzên wê jêçiyî nivîsiye. Kap”ê wê defterê karton e, li ser kapê wê çend cihen sotî hene û kapê wê tehrîf bûye. Piştî hingê rexê piştê bi pate ve hatiye temîr kirin. Li ser rûpelên hindur de lekeyên rûtubetê hene. Ev deftera di destê me de 168 rûpel in, 30 rûpel jê çûyîne. 15 rûpelan nivîs li ser nehatiye kirin. Ev deftere 26 rûpel Meludûş-Şerîf, 52 rûpel helbesteke bi

⁴⁹ Mecit İliş, *Dîdar*, (Adar, 2019), Gever/Culemêrg.

zimanê farisî behsa herba Yermûkê û 36 rûpel jî ji not û we‘zên Mela Ehmed pêk hatiye. Defter 18x13 cm e.

Nusxa mewlûdê 26 rûpel û her rûpel 18 rêz û 447 beyt û 894 misre ne. Sernavên beşan di nav çarçovê de hatîne nivîsîn. Rûpelên 1^a û 3^b de ji ber ku sernav fireh hatîne nivîsîn 17 rêz in. Rûpelê 2^b de du rêz ji yên din mezintir in, ew jî 16 rêz hatîne nivîsîn. 8^b de ji ber ku du beyt cihên wan hatîne guhartin, nivîskar rastiya wan nîşa bide beytên 264-265 îşaret kirine. Hindek beyt tehrîp bûne û murekeb li ser belav bûye, ji ber ku ew peyvên tehrîp bûn nayêne xwandin nivîskarî carek din li cihên xalî an jî li serî nivîsîne ve. Nivîskarî rûpel hemî li gor qaîdên mistarê nivîsîne. Mistar ew aletê ku xetat xîçên berwarî rast û xweşik pê diçêkin. Da ku li ser rûpelî cihên xalî neminin. Veca hindek cihan dawîya rêzan xalîfî çêbûye. Ji ber vê çendê nivîskarî ku van cihên xalî tijî bike da ku rêz rast û xweş bin ev (//) îşarete daniye. Her wesa Mela Ehmed mexlesa xwe jî di mewlûda xwe de nenivîsî ye. Me di cihek din de jî mexlesa wî peyda nekirî ye. Piranî di mewlûden de beşa merheba heye. Belê di mewlûda Mela Ehmed de beşa merheba jî mewcûd nîne.

1.2. 2. 2. Wezin

Mewlûdûş-Şerîf bi nezma arûzê hatiye nivîsîn. Destpêkê heta dawiyê heman nezim hatiye bikaranîn. Hemî jî li ser eynî weznê hatiye nivîsîn. Yanî li ser wezna “Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilûn” e. Behra remelê ye û qalibê nesalim e. Her misrek yazdeh kîteye. Bes kêr cihan de hindek rêz tam nînin, kiteyên misran kêr in. Bo mînak: “Bêt heywa eşhûr şefer” (MEG/348) ev rêze heft kîte ne. Hindek cihan jî kitên wê zêde ne. Bo mînak: “Wê digot way ummetî way ummetî wa ummetî” (MEG/410) ev rêze pazdeh kîte ye.

Hem/dê/ bê/hed// bo/ şe/hê/ dun//ya/ û /dîn

- + - - // - + - - // - + -

Qa/dî/rê / rez// zaq/ û/ re/bbu’l/-‘a/le/mîn

Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilûn

- + - - / - + - - / - + -

1. 2. 3. Cuwankarî/Huner

Divê edebiyat û hunere de xemîlîn, kemilîn, rewanbêjî û manendeyî hebe.⁵⁰ Cuwankarî xemilandina gotina ye. Mebesta edebiyatê ewe ku kesek gotin û hest û ramanên xwe bi awayekê tesir û bandorker ji bo kesên hemberî xwe veguhêze û bi gotinên xwe yên xweş ve dilkêşiya mirovan bike û balkêşiya wan bêxe ser gotinên xwe. Di edebiyatê de eve jî bi wesîla cuwankariyê çêdibe.

1. 2. 3. 1. Tenasûb

Tenasûb ewe ku di nivîsekê de di navbira çend peyveka têkilî û hevpêvendî hebe. Di van berhemana de pîranî cuwankariya tenesubê hatiye. Wan peyvên xwarê hatîne reşkirin de tenasûb heye.

Hemdê bêhed bo şehê dunya û **dîn**
Qadirê rezzaq û **rebbûl'alemîn** (MEG/1)

Serf bike tu **mal** û **xan** û **cîsm** û **can**
Ca bibî tu ummeta fexrê cîhan (MEG/7)

Guh biden ey Ummeta fexrê cîhan
Nur Muḥemmed seyîdê **dewr** û **zeman** (MEG/39)

Guh bidê ey **mu'mînê îman** guzîn
Ew Muḥemmed rehberê erbabû **dîn** (MEG/124)

Xelqî îna rahê **Yezdan** bêqiyas
Bûne **îslam** û leṭîf û **dîn** şînas (MEG/228)

Wan şehaban rê vekir ya ew Bîlal
Ba **girî** û **ah** û **efğanê** melal (MEG/275)

Bû **hewar** û bang û tazî û 'înat
Bû sebûr û **bang** gazî û şelat (MEG/277)

Ew Şehabe cumle rabûn bi emrê wî
Wan tewaf kir **ser** û **çav** û **destê** wî (MEG/321)

Ku 'Elî rakir ji bo textê serîr
Ba helîm **xûf** û **tirs** û hem hezîn (MEG/415)

Ewî dane me **eql** û **zanîn**
Em kirin xwedan **îman** û **dîn** (GEG.1/2)

Dane me kelam û hem xeber
Em kirin **ummet** ji bo **pêxember** (MEG/1(4))

⁵⁰ Ocek, r. 69.

Bi kiras û fîstanan
Kesrewanêt bi rûşîne (GEG.32/12)

Keyfxweşiya **pîr û kalan**
Pêkve ew di çine seyranê (GEG.28/6)

Qeyd û bendan bihelîne
Soz û we‘dan bi cih bîne (GEG.24/7)

Bûme kewa keftî davê
Keftiye ber min bi nêçîr û ravê (GEG.23/11)

1. 2. 2. 3. 2. Teşbih

Teşbih tê wateya wekhevîyê. Teşbih ew e ku kesek tişteke bi wekînine tişteke din.

Ew **reş kezî** te berdayî
Bûne **ejderha** bi min ve da (GEG.204)

Ew bi **mişlê kutûpxwanê**
Aciz nedibû ji cewab dane (GEG.16/5)

1. 2. 2. 3. 3. Tersî

Di vê cuwankariyê de peyvên dijabatê li gelêk bin.

Roj û şev çin ta geheştin nîmî rah
Hêştirek uftad qewî gaîb tebah (MEG/136)

Mu‘cîza çarê bizane ey peder
Wî li **pişt** xwe dît û xelq û hem li **ber** (MEG/167)

Ger bibêjît tû were zû zû **here**
Wer nebêjît tû neçe paşve **were** (MEG/357)

Cumle hatin ba temaşa **xaş** û ‘**am**
Ta gehiştî wî demî Meyser xulam (MEG/151)

Em ji **neyê** înane **wicudê**
Da ji bo wî biçîne **sucudê** (GEG. 1/3)

Ji fikrê xwe neçî paş
Bi **şev** û **rojan** ewî şaş (GEG.33/13)

Pîrî **derdek** bê **derman** e
Qîmeta weqtî bizan e (GEG.31/11)

1. 2. 3. 2. Îstîare

Îstîare eve ku peyvek ne li wateya rast bête bikaranîn, ev peyve bi wateya emanet bête bikaranîn. Ev cuwankariye kêr caran derbas bûye. Li beyta xwarê Pêxember şibihandiye şah û peyva Pêxember nederbas nebûye.

Şêst û sê sal ‘umrê **şahê** ummetê
Sed mixabin ey emîrê cennete (MEG/258)

Bi tîra çavan wê em kuştin
Em bi ‘îşqê kirin mubtela (GEG.23/6)

Guhar şorbûne ser milî
Dur û şedef di devê te da (GEG.20/10)

Wekî roja Kurdistanê
Şefqa te da bû cîhanê (GEG.15/3)

1. 2. 3. 3. Nîda

Cuwankariya edebî ya gazîkirinê ye. Peyvên “Got ya Bîlal” û “Ey hebîb” de nîda he ye.

Goft ya Bîlal tû here vê menzîlê
Da ji bo min tu qedîbê ser gilê (MEG/296)

Me qebûl ke j’ummeta xwe **ey hebîb**
Da di ferda dîtina te bît neşîb (MEG/441)

1. 2. 3. 4. Telmîh

Di cuwankariya edebî de şexsiyetên navdar tîne bîra mirovan. Di peyva lewlake de cuwankariya telmîh he ye. Ew hedîsa “Lewlake lewlake ma xeletqul-eflake” tê bîr îrandin.

Ew şehê **lewlake** fexrûl’enbiya
Rûhû canê ewliya û eşfiya (MEG/2)

Melekan li pêşî Adem secde bir
Ew ji bo îsanî bûye qedir (GEG.1/7)

Kanê Telhe kanê zubeyr
Kanê emînê wê ummetê (GEG.4/7)

Bi îşaretek heyv parçe kir

Li pêş çavêt muşrîkan eve kir (GEG.2/9)

Binêre miraca pêxemberî
Bûye mînak ew jî bo beşerî (GEG.1/8)

1. 2. 3. 5. Mubalexe

Cuwankariya mubelexê ewe ku kesek di wekandinê de zêde bête wesifkirin. Wek hevokên “şahê cîhan û milletan” û “Wî bezandî ew reva çi mislê ba” de cuwankariya mubalexe debas bûye.

Mewlûda **şahê cîhan û milletan**
Pur şerîhê rast e bê şubhe bizan (MEG/10)

Wî bezandî ew reva çi mislê ba
Kûçe kûçe bir ciwanê ba şefa (MEG/27)

Lê binêrim bi se‘etan
Bi min xweştir ji çina cennete (GEG.21/6)

Ah û fîğan dikem zarî
Ji çavêt min xwîn dibarî (GEG.18/11)

Tu bo kesê nabîye hewal
Yêt gel te borandî **hizar şal** (GEG.17/2)

Tu seydayê hemî ‘aliman
Qazîyê hemî hakimî (GEG.15/2)

1. 2. 3. 6. Tekrîr

Cuwankariya tekrîrê ewe ku kesek di nivîsîna xwe de peyvekê çend caran li gelêk dubare bike. Li beytên xwarê peyva “sefa” û peyva “nivêj” du caran derbas bûye.

Şahî dît yek şehsiwarê pir **şefa**
Qeşir şeq bû hate der jê ba **şefa** (MEG/33)

Wê şevê wacib li ser wî bûn **nivêj**
Muñleqa murted mirdî bê nivêj (MEG/79)

1. 2. 3. 7. Secî

Cuwankariya seciyê ewe ku di hevokê de an jî di dawiya hevokê de dengên wekhev derbas bibin. Li beyta xwarê peyva “bu” de seçi heye.

Hamîle **bû** Amîne ba Muştefa
Lê wefat **bû** babê Ehmed ba şefa

(MEG/71)

1. 2. 4. Nezim

Mewlûda Mela Ehmed mesnewî ye. Peyva mesnewî di zimanê erebî de ji sulasiyê “sny” ê hatiye dariştin û tê wateya “cud cud” e.⁵¹ Yanî bi du rêzan ve beytek tê çêkirin. Di wateya têgirî de jî mesnewî şikleke nezmê ye û her rêzekê bi serê xwe û bi kafiye ji beytan pêk tê.⁵² Di edebiyata Kurdî ya klasik de gelek nivîskaran berhemên xwe li ser nezma mesnewî nivîsîne. Mem û Zîna Ehmedê Xanî (1650-1707) yek ji wan klasîkan e. Piraniya mewlûdan bi nezma mesnewî hatîne nivîsîn. Mesnewî ji du, sê û heta hizaran beytan pêk tên⁵³.

1. 2. 5. Beytên Tesliyê

Dema beytên tesliyê hatine xwandin, hevoka “Sallallahû eleyhî wesellem” an jî “Eleyhî’s-selat û wes-selam” tê xwandin. Beytên tesliyê beşên mewlûdê ji yek cuda dikin. Dema mewlûdxwan beş xilaskir, ew cema‘eta li wî mekanî rûniştî û guhdariya mewlûdê dikin hemî pêkve selewatan dixwûnin. Heman demê de xwandekarên mewlûdê gazî dikin da bo Pêxemberî (s.a.s.) beytên selat û selaman bixwînin⁵⁴ Ev beytên tesliyê di metnên mewlûdê de heta dawiyê nayêne guhartin û têne dubare kirin, hindêk cihan de jî bi nûansên biçûk cudatî dikevîte. Di mewlûda Mela Ehmedê Gulordî de sêzdê caran beytên tesliyê têne dubare kirin. Beşa xîtama mewlûdê de beyta tesliyê ne nivîsiye, nivîskarî ji bo xefirandina gunehên xwe ji muslîmanan xwandina fatihê xwestî ye. Gelek cihan de wek yek hatîne nivîsîn. Hindêk caran jî cudatî di nivîsîna wan beytan de çêbû ye. Ji bo Mînak çend beytên tesliyê em nîşa bidin.

Hîvî darîn em ji te ey Mustefa
Ber tu bada es-selam ey Muqteda

(MEG/21)

Bo Muhemmed ew hebîbê pak û zat
Hûn biden cumle selam û hem şelat

(MEG/86)

Ey Muhemmed bert û bada subhû şam
Şed wirûd û şed şelat û şed selam

(MEG/254)

⁵¹ Amil Çelebioğlu, *Türk Mesnevî Edebiyatı*, Dergah Yay, İstanbul 2018, r. 19.

⁵² Çelebioğlu, r. 19.

⁵³ Çelebioğlu, r. 19.

⁵⁴ Rıfat Kütük, *Gül-Efşan*, Ertual Yayıncılık, Erzurum, 2018, r. 97.

1. 2. 6. Zimanê Mewlûdê

Mela Ehmedê Gulordî Mewlûdûş-Şerîf xwe piranî bi zimanekê zelal nivîsî ye. Di berhemê de sereke zaravayê kurmancî serdest e. Her wesa cih daye peyvên Erebi û Farisî jî. Li gel zimanek sade teybetmendiyên zimanê serdema wî pêş ketine. Mela Ehmed di vê bermemê de xwe nezîkî peyvên tevlihev û pêkvedanên dirêj nekirî ye.

1. 2. 6. 1. Peyvên Kurmancî

Hewar, guh, çenk, birin, nivêj, karwan, şîn, peya, sêwî, sîber, berze, verêtin, landik, kate, keft, weşar, sih, lalî, rast, guh, ciwan, esp, pîr, hîvî, şev, belg, bane, gehişt, rûnişt, zêde, hat, dem, zarî, bang, tazî, gazî, hişyar, ah, girî, ger, ber, nêzîk, şuştin, vêkra, bawer, xwar, xirab, wesa, tena, paşî, gelek, tirs, pêve, harîkarî, kar, bar, roj, dirêj, serkeş, siwar, aza, hûn, bêguman, av, zelal, sal, mam, bilind, keftin, hajo, dît, deşt, çiya, tevn, hêlîn, delal, hilgirt, nan, ez, çêkir, hişk, taze, yekser, hebî, hay, şax, carek, dem, mizgînî, dujmin, hingê, dijûn, xem, rabûn, hemyan, dîsa, pisyar, zorî, kifin, mêş, mar û hwd.

1. 2. 6. 2. Peyvên Erebi

Murted, mutleq, hucra, ehwal, muntezir, nîsa, rîcal, xubz, zeheb, ‘edawet, ‘Enkebût, futûh, nisûh, leyal, esfiya, reyb, nûr, xaliq, samin, kursî, enbiya, neseb, beşer, hebîb, fexr, şerîf, letîf, mülk, întîzar, menzil, ‘ezîm, selam, kelam, yeqîn, cumle, tahir, felek, dîn, kiram, melaîk, hûr, sirûr, cihûl, ğar, şiddiq, eman, cemal, mescîd, heq, tehşîl, ğaîb, nebî, kerem, qabid, eshab, mûbîn, nazil, qerîb, mucteba, le‘leyn, beyt, ferş, wîladet, qebûl û fatihe.

1. 2. 6. 3. Peyvên Farisî

Mirdî, bidêr, xakî, çetre, ferax, çerax, şah, xîşûma, ferhûnde, girdigar, beşaret, pûser, yezdan, merd, şimşîr, nîkûnam, sehmeğîn, kirdin, xeşemnak, tewaw, xaşane, doj, murdî, xwahî, şumar, sehnemgîn, kirdûkar, pîxamber, çerx, îxtîşaş, cewabîş, faş, humam, şadî, goftend, goşîdar, şemîr, mirdin, heman, asîman, zarî, zorîhem, newa, cahê, bûse, resîd, zebûn, serwer, şehsiwar, xefte, pakîke, şetir û manend.

1. 2. 6. 4. Qedînekên/Terkîbên Erebi

Xeyrû'l-beşer, sultanu'ul-beşer, fexrûl'enbiya, sultanu'l-hûda, rebul'alemîn, fexru'l-ereb, cem'ul-enbiya, ebwabû's-sema, yewmû'l-qiyam, fexrû'resûl, cemî'ul mu'mînîn, fexrû'l-beşer, rebû'l-'alemîn, dar'ul-me'wa, ebwabû's-sema, şefi'ul-muznibîn, yewmû'l-qiyam û xetmû'l-murselîn.

1. 2. 6. 5. Destpêka Beşan

Ew mumînên hez Pêxember (s.x.l.) dikin û di rêka wî de di meşin, divê guhdariya mewlûda wî de hişyariyê bikin. Nivîskar destpêka mewlûda xwe de neh cihan dibêje: "Guh Bidê, an jî guh bidêr" bala guhdaran bi vî şiklê xîtabê dide meneya mewlûdê. Heke guhdar hez bike sûd ji mewlûda nebî wergire û bibe xwedanê nezerek baş divê ji dil û can bala xwe bide jiyana pêxemberê Cihanê û wî bo xwe bike rênîşander. Da ku dîtina wî bibe nesîbê wan mu'mînan. Muhemmed (s.x.l.) ji bo mu'mînên îman guzîn rêberê dinya û dîn e. Da ku ev mu'mîn bibin birayên yekûdû û da bibin ehlê sefayê.

1. 2. 6. 6. Beşên Mewlûdê

Mewlûda Mela Ehmedê Gulordî sêzde beş in.

Bîsmillahir-rehmanîr-rehîm We bîhî neste'în

1. Dastana Mu'cîza Mewlûda ba 'Ebdûl-Melîkê Şahê Cihan
2. Dastana der Xîl'et Nûra Muhemmed (s.x.l.)
3. Dastana Eşwalê Fexrê Cihan
4. Dastana Şerha Eşwalê Hebîb
5. Dastana Reften Fehrê 'Alem Berayî Ticaretê Şam
6. Dastana Mu'cîzat Muhemmed (s.x.l.)
7. Dastana Mîracê
8. Dastana Hîcretê
9. Dastana Fexrê 'Alem
10. Dastana Siwalê Qeşeq
11. Dastana Wefatê
12. Dastana Ğusla Nebî (s.x.l.)
13. Xîtama Mewlûdê

1. 2. 6. 7. Naverok û Şîroveya Mewlûdê

Berhema Mela Ehmed bi navê Xwedê teala/besmeleyê ve destpê dîke û harikariyê ji wî dixwaze. Naveroka mewlûdê têr û tijî ye. Destpêka mewlûdê heta dawîya mewlûdê bûyerên di jiyana Pêxember de qewimîn bi rêzkarî nivîsîne. Mijarên berhemê li dûv yek hatîne. Ber yekûdû neketîne. Wiladeta wî, karwaniya wî ya Şamê, mu'cîzên wî, miraca wî, koçberiya wî, wefata wî, şûştuna meyîtê wî û hwd. hemî pêkve li gor rêbazeke menzûm hatîne nivîsîn.

Beşa Yekem

Ev beşe ji 21 beytan pêk tê. Beyta ewil bi tehmîd û tewhîdê destpê dîke. Nivîskar hemdên bê hed û bê hejmar bo perwerdekarê alemê dixwaze. Xweda afirendekar û rizqdarê her tiştekê ye. Hemd bitine bo wî tê kirin. Hemd ji bo wî Xwedayê riziqdar, perwerdekar, xwedan şîyan û desthelatdar e. Peyva hemdê mexsûsî Xweda ye. Di bîr û bawerîya îslamê de ev peyve bo kesek din nayêt bikaranîn. Heke muslîmanek hez bike bo kesekî minnetdar be, peyva şukrê dê bikar bîne. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de bi hemda Xwedê û navê wî destpêkirin xwedî kevneşopiyek girîng e. Melayê Bateyî jî bi vî şiklî dest mewlûda xwe kiriye.

Di vê beşê de beytên 2-12an de behsa fazîletên Pêxemberî dîke. Pêxemberî wek şanaziya enbiya û rih û canê xweştîyên Xwedê dibîne. Hz. Muhemmed (s.l.x.) hem xatem/dumahiya pêxemberan e, hem jî ji hemî beşeran bi xêrtir e.

Bo Muḥemmed Muştefa xeyrû'l-beşer
Der f'îḡan be daîma ey ba xeber

(MEG/6)

Beytên 13-2an de behsa qedrê mewlûda pêxemberî û xerçkirina di rêka mewlûda wî de dîke. Zêrê Mehmûdî di nav civaka Kurden de gelek zêde bi qedr û biha ye. Ew kesên dawetan dîkin, ji bo bûk û xizmên xwe diyariya biben, jê re zêrê Mehmûdî dîkirîn. Ji ber vê qîmeta mezin divê di rêka mewlûda Pêxemberî de mu'mîn yê dil berfireh be û diştê serf dîke wekî zêrê Mehmûdî biha giran be. Heke muslîman hez bike bibe bawermendekî çak û baş, şîyana wî jî hebe ku malî serf bike divê xwe ji xêra mewlûda nebî nede paş.

Deh hezaran zêrî Mehmûdî tamam
Şerfê xeyran tu bike ey nikûnam

(MEG/13)

Tu nekey nabî musulman ba yeqîn
Hem şefî'et nabîtîn an şahê dîn

(MEG/18)

Beşa Duyem

Ev beşe ji 17 beytan pêk tê. Di vê beşê de nivîskar serpêhatiyêke ciwanekî vediguhêze. Wextekê di bajarê Şamê de ciwanek hebûye. Wî ciwanî talibiya nêçîrê kiriye. Rojekê ev ciwane li hespê xwe siwar bûye. Diyar e ku vî ciwanî kurê şahê wî zemanî kuştî ye. Di vê beşê de wesa tê zanîn ku vî ciwanî tînin hizûra şahî. Belkê ev şahê Ebdul-melîkê kurê Merwan be. Li şamê hukim kiriye. Ciwan di tirse, Şah fermanê dide ku vî ciwanî helak bikin/bikujin. Mu'cîzeka Pêxemberî (s.x.l.) hasil dibe. Pêxember xwe nîşa dide û vî ciwanî aza dikan. Nivîskar vê serpêhatiyê veduguhêze da musulman qedrê mewlûda Pêxemberî bizanin.

Nê hebû weqtî di Şamê yek ciwan
Talibê nêcir û purşad û rewan

Bû di 'esrê şahê dîn Ebdûl-melîk
Tê çinîne rey b û hem tê nîne şik

(MEG/23-24)

Hurmata mewlûda sultanê cihan
Mal û xil'et da diazakir ciwan

(MEG/35)

Beşa Sêyem

Ev beş, ji 29 beytan pêk tê. Di vê beşê de heta beyta 24an nûra Muhemmed (s.l.x.) bi arifane tîne zimanî. Hêj erd, adem, cin, melek, erş, lewh, kursî, felek nehatîn afirandin, nûra Muhemmed hatibû wicûdê. Mustefa îna wicûdê û wek babê hemî 'alemê diyar kir. Heft hizar salan berî hebûna cîhanê nûra wî hatibû çêkirin. Li gor vê têgeheştinê, Xwedê te'ala Muhemmed ji çenkekê nûra rûyê xwe tîne wicûdê. Piştî sedsalan ji vê nûra Xwedê cewherekê letîf hate wicûdê. Avek zelal ji vî cewherî hate afirandin. Hezar salan vê avê pêl vedan. Piştî hingê afirendekarê alemê duwazdeh pişk/hisse jê çêkirin. Qismê ewil erş, gismê duyem qelem, qismê sê lewh, qismê çarê dojeh, qismê pêncê hîviya Muhemmed, qismê şeşê ster, qismê heftê milyaket, qismê heştê kursiya wî, qismê nehê mu'mîn, qismê dehê Muhemmed bi xwe, qismê yazdê esman, qismê duwazdê erd jê hatine çêkirin. Eve hemî ji nûra hebîbê nediyar hatine wicûdê û bi hebûna xwe diyar bûn.

Însan di nav mexlûqatan de dawiyê jî hatibe afirandin, di heqîqetê de û di hebûnê de berî her tiştekê yê hatiye afirandin. Hz. Pêxember (s.x.l.) jî çendan bi

însaniyeta xwe Pêxemberê dawîyê be jî, ontolojîk û heqîqeta xwe ve ew ewil yê hatiye afirandin. Hindek rîvayetan de “Adem hêj di navbira av û axê de ez Pêxember bûm”⁵⁵ an jî “Tiştê Xwedê ewil afirandî nûra min e”⁵⁶ di vê têgeheştina tesewûfî de welîyekî jî “Adem hêj di navbira av û heriyê de ez welî bûm”⁵⁷. Vê tegeheştinê di edebiyata klasîk ya Kurdî û berhemên alîmên Kurd de jî cihekê girîng girtiye. Mela Ehmed nûra Muhemmed bi vî awayî înyaye ziman.

Hêj ne erd û Adem û cin û melek
Hêj ne erş û lewh û kursi û felek

Muştefa hate wicudê pêşî wan
Bûye babê cûmle ‘alem bêguman (MEG/40-41)

Beytên 25-29an de jî nivîskar behsa ji dayik bûna Muhemmed dike. Dayika wî Amîne jinikek neseb temîz e. Pêxember sala fil de hatiye dinyayê. Dêşîra wî Helîme dibe nik xwe û sê salan dimîne li wêrê. Piştî hingê Helîme wî tîne teslîmî dayika wî Amînayê dike.

Beşa Çarem

Ev beşe ji 30 beytan pêk hatiye. Nivîskar di vê beşê de rewşa fexrê cîhanê tîne zimanî. Di van beytan de behsa ji dayik bûna pêxemberî (s.l.x.) behsa dayik û bab û nesebê wî dike. Nivîskar bi awayekê menzûm Pêxemberî bo me dide naskirin. Navê dayika wî Amîne ye, ji taîfa zehre ye. Navê babê wî Ebdullah e. Ji Qureyşîyan e. Wextê dayika wî ji bo wî hamile, babê wî çû ber dilovaniya Xwedê. Dema pêxember şeş salî dayika wî jî wefat dike. Heta bûye heşt salî bapîrê wî ew xwedan kiriye. Piştî mirina bapîrê wî mamê wî Ebû Talîb ew xwedan kiriye. Çil saliyê de Muhemmed dibe Pêxember, pêncî du saliyê de ew li Mekkê diçe mîracê. Her wesa pêncî du saliyê de ew koçber dibe Medîne. Şêst û sê saliyê ew diçe ber dilovaniya Xwedê. Li Medîne hûcra Eyşayê diveşêrin.

⁵⁵ es-Sehâvî, Şemsuddîn Ebu'l-Hayr Muhammed b. Abdurrahmân b. Muhammed, *el-Mekâsîdu'l-hasene fî beyâni kesîrin mine'l-ehâdîsi'l-muştehire ale'l-elsine*, (Teh. Muhammed Osman el-Huşî), Dâru'l-kitâbi'l-arabî, Beyrut, 1985, r. 522. (Hadis no: 842); el-Aclûnî, Ebu'l-Fidâ İsmâîl b. Muhammed b. Abdulhâdî ed-Dîmeşkî, *Keşfu'l-hafâ ve muzîlu'l-ilbâs 'amme'stehere mine'l-ehâdîs 'ala elsineti'n-nâs*, (Teh. Abdulhamîd el-Hindâvî), Mektebetu'l-asriyye, 2000, c. II, r. 156, Hadis no: 2017.

⁵⁶ Abdulhây b. Muhammed Abdulhalîm el-leknevî, *el-Asaru'l-merfûa fil-ahbari'l-mewdûa*, (Teh. Muhemmed saîd b. Besyûnî Zağlûl), Daru'l- kutubi'l-ilmîye, r. 43, Beyrut, 1984.

⁵⁷ İbnü'l Arabî, *Fusûsu'l-Hikem*, (wrg.Ekrem Demirli), Kabalacı Yaynevi, r.259, İstanbul 2006.

Navê babê wî tu Ebdullah bizan
Ew Qureyşî bû ereb hem ruh û can (MEG/70)

Pênce û du şalî bû fexrê cîhan
Ew ji Mekkê çî Medîne béguman (MEG/80)

Beşa Pêncem

Ev beş, ji 37 beytan pêk tê. Divê beşê de şerha rewşa Pêxember (s.x.l.) tê kirin. Di derheqê mamê wî de agahiyan dide. Ku mamê wî Ebû Talîb mirovek xwedan zarok bûye. Ji ber vê yekê destê wî teng bûye. Carekê mamê wî ji bo ticarete haziriya karwanî kir da biçîte Şamê. Pêxember (s.x.l.) dibêje mamê xwe heke tu çûyî min jî li gel xwe bibe Şamê. Mamê wî hez nedikir ku wî li gel xwe bibe Şamê, ji ber ku nexweşiyek neyete serê birazayê wî. Wextê birazayê wî israr kirî ku li gel mamê xwe biçê, mamê wî ew li gel karwanî bir. Dema karwan bo Şamê meşî li ser rêka wan li Busrayê rahîbek zana hebûye. Navê wî Bahîra bûye. Mela Ehmed dibêje: “Buheyra”. Ewî rahîbî teybetmendiyên Pêxemberî di Tewratê de xwandi bûn. Wextê Bahîra Pêxemberî dibîne, wesfên wî yên Pêxemberiyê bo mamê wî vediguhêze û dibêje: Heke cuhî Muhammed bibînin dê wî bikujin. Ji ber vê çendê mamê wî naçe Şamê û li wê derê dizivire Mekkê.

Di zimanê Aramiyan de behîra bi me‘na peyva hîlbijartî ye, navê wî yê rast Sergûst e, Di çavkaniyan de mensûbê qebîla Ebdul Qeys e, li gor veguhastina Zuhri ew ji cuhiyê qebîla Teyma ye, li gor rîvayetên piştî hingê ew bûye fele/mesîhî⁵⁸

Ew li nik mamî Ebu Talib di bû
Pur feqîr û pur eyal û xaki bû (MEG/89)

Rojekê wî xwandî tewrata letîf
Dîtî ewşafê Muhammed wî şerîf (MEG/95)

⁵⁸ Mustafa Fayda, “Bahîra”, *DîA*, TDV, İstanbul 1991, C. IV, r. 486.

Beşa Şeşem

Ev beşe ji sih û pênc beytan pêk hatiye. Di vê beşê de behsa bazirganî û karwaniya Pêxemberî (s.x.l.) li gel Meysere kirî bo aliyê bajarê Şamê dike. Li gor rîvayetan divê rêvingiyê de çend bûyerên ecaîb û harîqulade bi serê Pêxemberî hatîne. Wek dara Pêxember diçe bînî û ew dar heşîn dibe. Di rêkê de parçek ewrî wî teqîp dike û bo wî dibe sayeban/sîber. Nivîskar behsa xewna Xedîcê jî dike ku ewê di xewna xwe de dît ku dê li gel Pêxemberî nikahê bike.

Hem hebû Meysere xulamê nazenîn
Tacir û rehber ji mamê wî emîn (MEG/134)

Hem Xedîce dît ew xwevna leţif
Dê nikah ketin te yek merdê şerîf

Çetrê 'ewrê ez şehê dinya û dîn
Muntezîr bo roj û şev ewnazenîn (MEG/148-149)

Beşa Heftem

Ev beş ji 21 beytan pêk tê. Mela Ehmed di vê beşê de behsa mu'cîzên Pêxember (s.x.l.) dike. Dibêje mu'cîzên wî gelek hene. Bes ew çend mu'cîzeyên di jêderên de tîn veguhestin behs dike. Li gor neqilkirina nivîskar sîbera Pêxemberî kesê nedidît û wek nûrê bû, ew wek fesadan di xewna xwe de îhtîlam nedibû, daîma pakij û temîz bû, çi caran baldariya şeytanî nedikir, dema ew hatiye dinyayê sunnet yê kirî bû, hem li ber xwe hem jî li pişt xwe ewî tişt dîtîn, bi tiliya xwe îşareta heyvê kiriye û heyv bûye du ker, Pêxember ji her kesekî bilintir bû, heçî heywanê Pêxember lê sar biba pîr nedibû qûwweta wî/wê heywanî zêde dibû. Mêş û mor û mar nedihatine ser wî û xwe ji wî dûr têxistin, bewlê wî li ser erdî nedima, wextê şevê dayika wî landika wî hejan diba ew hewceyî kesê din nedibû.

Mu'cîze her wî hene sêşed hîzar
Dê ji wan ez dê beyan kem aşîkar (MEG/160)

Beşa Heştem

Ev beş 47 beyt in. Di vê beşê de nivîskar miraca Pêxember (s.x.l.) tîne zimanî. Li gor neqilkirina nivîskarî wextê Pêxember (s.x.l.) di hucra Ummî Xwanê de Cebraîl tête xwarê û mizgîniya çina esmanan dide Pêxemberî. Divê beşê de pêşwazî û silavên milyaketan li Pêxemberî kirin tîne zimanî. Behsa wan heywanên Pêxember heta Qudsê lê siwar bû dike. Navên wan heywanan jî burak û refref in. Her wesa agahiyên di derheqê milyaketên (Cebraîl, Mîkaîl, Ezraîl û Îsrafil) li gel Pêxemberî refeqet kiri bo esmanan jî dike. Li gor agahiyên vê beşê esmanê çarê de Pêxember Ezraîl dibîne û esmanê heftê jî digehîte sîdretul-muntehayê.

Heta sîdretu'l-muntehayê milyaket li gel Pêxemberî refeqetê dike. Ji wêrê paşve Pêxember bitenê diçe huzura Xwedê teala. Eve jî tê wê wateyê; wextê însanî tereqî kir û pêşve çî, ji milyaketan bilintir lê têt. Lewre mîraç pêşve çin û tekamûla kesên bawermend e. Însan Xwedan îrade ye, li hemberî îrada însanî jî Xweda şeytan afirandiye. Bi îrada xwe biryara kirina qencî û xirabiyê dike. Milyaket xwedan îrade nîn in. Ew tiştê Xwedê teala ji wan xwestî ew wê dikin. Ferqa însanî ji milyaketan ew e, dema tiştê dike bi kesb û xebata xwe dike. Ev kesb û xebate însanî bilind dike û heta digehe banên bilind. Her wesa dema însanî îrade xwe bo xirabiyê îna dê kevîte dereca heywanan. Ji ber vê yekê mîrac bilind bûna rih û pêşve çûna têgehiştina hizr û birên kesê bawermend e.

Li gor agahiyên nivîskarî teybetmendiyek vê beşê ew e ku Pêxember (s.x.l.) biçavê xwe Xwedê teala dîtiye. Nivîskar di vê beşê de girîngiya dîtina Pêxemberî ya cennetê, hûrî û qesran dike.

Pêncî dû salî bû fexrû'l-ereb
Ew di Mekkê bû şehê alî neseb (MEG/180)

Got ey fexru'l-ereb dara şefa
Şed beşaret ber tû bada ez Xuda (MEG/184)

Gotî bête 'erşêdi min ew meqam
Da bibinim şuhbeta fexrê cîhan (MEG/185)

Hem ji wê borî Muhammed bêguman
Ta geheşte sidrê ew şahê cîhan (MEG/207)

Hem di wê lehzê Xudê lêkir selam
Hem bi çawan dît rebbê la yenam

(MEG/213)

Beşa Nehem

Ev beş ji 28 beytan pêk hatiye. Mijara vê beşê koçberiya/hîcreta Pêxemberî (s.x.1.) ye. Nivîskar divê beşê de di derheqê hîcreta Pêxemberî de agahiyan dide. Agahiyên dujminiya ehlê Mekkê li gel Pêxemberî, civîna muşrîkan daru'n-nedvê da ku Pêxemberî ji holê rakin û bikujin pêşkêş dike. Nivîskar harîkariya Xwedê teala û rêkirina qasidê wî Cebrail'i ji bo vê plana muşrîkan Pêxemberî hişyar bike agahiyan dide. Dîsa nivîskar; dema Pêxember li gel Ebûbekir diderkeve rêka koçberiyê diçine şikeftê, çêkirina tevne pîrê û hêlîna kotrê li derê şikeftê da muşrîk Pêxemberî û hevalê wî nebînî tîne zimanî. Li gor pêzanîna nivîskarî wextê muşrîk diçine derê şikeftê û ev menzere pêş çavên wan dikeve vedigerin û piştî hingê Pêxember û hevalê xwe diçin bo bajarê Medîne. Dawiya wê beşê de nivîskar agahiyan dide ku Pêxember deh salan jiyana xwe li Medîne derbas dike û piştî hingê bajarê Mekkê fetih dike.

Kafîran tedbîr dana halê ma
Dê çêbîtîn ku ji destê Muştefa

(MEG/229)

Qeşda qetla wî bikin nîwa şewê
Eşlê 'emîd her xeyala min ewê

(MEG/236)

Wî demî rabû Muhammed ey hûmam
Hem digel wî çi Ebûbekrê kiram

(MEG/241)

Ew ji garêçine Medîne ey hûmam
Ma li wê deh salî 'umrê wî temam

(MEG/251)

Beşa Dehem

Ev beş ji 34 beytan pêk hatiye. Di vê beşê de nivîskar heyfa mirina Pêxemberî dixwaz e. Pêxember ji bo piştî halê koça dawîya xwe ji bo halê ummeta xwe xemgîn dibe. Behsa nêzîk bûna wefata Pêxemberî dike û li ser xatir xwastina wî diraweste. Di vê mijarê de nêzîkî wefata wî Cebarîl xeberî bo Pêxemberî tîne. Agahdariyên berî wefata wî û nexweşîya wî neqil dike û nexweşîya pêxemberî gelek xemgîniyê têxe nav sehabyan. Di vê mijarê de nesaxîya Pêxemberî wesa zêde dibe ew neşêt biçê mizgeftê, sehabe li ber derê wî kom dibin û dirawestin û dimînin hîviya wî. Hz. Pêxember wî demî Hz. Ebûbekir danîte cihê xwe ji bo îmamiyê ku nivêja subê li berî ceme‘etê eda bike. Dema Pêxember neçîye mizgeftê girî û zariya hevalên wî zêde bûye. Piştî hingê Pêxember diçe mizgeftê û şîretan li hevalên xwe dike. Di şîretên xwe de dibêjê: “Dinya fanî ye û dawî her mirin e”. Dawîya vê beşê de nivîskar agahdariyan dide ku Muhemmed (s.x.l.) hem nebî, hem jî birayê muslîmanan e.

Bê xudan ummet te hêla pur zelîl
Dê çî bîtin halê me ey ba cemîl (MEG/257)

Tu bixwaze xaîra xwe ey resûl
Paşî te ummet qewî dibît zelûl (MEG/257)

Ew îmam e bo we eşhaban tamam
Pur kiram û pur newa û nîkûnam (MEG/272-273)

Hûn bizanin cumle eşhabe tamam
Ez ji bo we hem bira bûm nîkûnam (MEG/286-287)

Beşa Yazdehem

Ev beş ji 36 beytan pêk hatiye. Di van beytan de nivîskar mijarek baldar tîne zimanî. Mijara rewşa Pêxember û Ukaşe. Pêxember pirsê ji sehabiyan dike û dibêje: Heke min dilê yekê ji we hêla be û heqê yekê ji we li ser min hebe bila bê da ez heqê wî bidemê. Ukaşe radibe û dibêjê Pêxemberî heqê min li ser te heye. Ez hez dikim heqê xwe ji te bistînim. Her kes muteheyir dimîne, eve çiyê, ev mirove bo husa diaxive? Lê çi kes vê axiftinê tê nagehe. Bîlal diçe malê qemçiyê tîne, Fatima dibêje: Bîlal çi qewimiye û ew ki ye qisasî ji babê min dixwaze? Pêxember dibêje Ukaşe tu qisasê xwe ji min bistîne. Ebûbekir, Umer û Elî radibin ser xwe û dibêjine Ukaşe ev tişte nabe, were qisasê xwe ji me bistîne. Pêxemberî gote Ukaşe were qemçiyê li pişta min bide û tûla xwe ji min veke. Ukaşe gotê tu pişta xwe rûs bike. Wextê Pêxemberî pişta xwe rûs kirî, her kesek muteheyir maye û vê menzereyê bi çavê xwe temaşe dike. Ukaşe dibîne ku muhra pêxemberiyê li ser pişta wî nivîsiye. Vêca Ukaşê mûhra pişta wî maçê dike û dibêjê Pêxemberî mebesta min ne ew bû ku ez qisasî ji te bistînim, mebesta min ew bû ku ez muhra Pêxemberiyê li pişta te bibinim. Nivîskar vê tabloyê li ber çavê xwandekarî zindî dike, wek wênêkê candar nîşa dide û bi zimanekê zelal neqil dike. Pêxember dibêje sehabiyan heke we bivê beheştîyan bibînin eve Ukaşe. Sehabî jî Ukaşê pîroz dikin.

Got bêjin heqê kê li ser min esas
Ez dijûn şetm û leğw û hem qeşas

Man şehabe teheyyur û îxtîşaş
Rabûbû serpê çewabiş da ‘Ukaş (MEG/290-291)

Çi Muḥammed kir tû da destê ‘Ukaş
Tû jimîn teşîl bike heqê xu faş (MEG/303)

Wî ‘Ukkaşe got Muḥammed Muştefa
Qeşda min qîşaş nebû ku bît wefa (MEG/319)

Beşa Dazdehem

Ev beş ji 89 beytan pêk te. Di mewlûda Mela Ehmedê Gulordî de beşa ji hemî beşan dirêjtir ev beşe ye. Mijara vê beşê wefata Pêxemberî ye. Wextê Pêxember diçe ber dilovaniya Xwedê teala sehabî li ber derê Aîşayê (r.‘e.) kom dibin û disekin in. Pêxember bi dilekê xemgînî şîretan li sehabiyan dike da piştî wefata wî ew ji rêka gencyê nederkevin û da ku ew li beheştê jî yekûdu bibînin. Nivîsakar di vê mijarê de

ji bo wefata Pêxemberî xemgînî û ah û fixana hevalên wî tîne zimanî. Dîsa di vê mijarê de agahiyan di derbarê şîretên Pêxemberî dide da piştî wefata wî hevalên wî li ser rê da neçin. Her wesa mijar bi şîretên Pêxemberî devam dike. Ku ew baweriyê bi ‘emrê Xwedê bînin û xafil nebin û wextê pirsgirêk di nav wan de çêbû da bo çareser kirina van pirsgirêkan mirece‘eta xwe bibin dev şerî‘etê xwedê. Li gor neqilkirina nivîskarî Pêxember roja duşemî hatiye dinyayê û roja duşemî jî çiyê ber dilovaniya Xwedê teala. Dema çûye ber dilovaniya Xwedê li oda Hz. Aîşayê de bûye. ‘Emrê milyaketê rih wergirtinê tete kirin ku riha Pêxemberî pak û temîz û bê êş bête wergirtin. Milyaket ser sûretê mirovekê Erebb tete jor û silavê li ser Pêxemberî dike. Dibejin mirovek li ber derî ye. Pêxember dibêje ew mirov hatiye da muhebet û lezetan xirab bike. Wê demê ah û nalîn dikeve nav hevalên wî. Hz. Fatima (r.‘e) dibêje giriyê û dibêje: Li me hewar e Xeyru‘l-enbiya çû ber dilovaniya Xwedê. Dîsa nivîskar xemgîniya sehabîyan bi awayekê girîng tîne zimanî ji ber ku dê wehî ête birîn û hêdî bo wan ji esmanan xeber jî naên. Nivîskar Pêxemberî (s.x.l.) wekî ronahiya hemî Pêxemberan dibîne. Di vê mijarê de milyaketê rih wergirtinê dibêje Pêxemberî heke tu hez bikî ez dê riha te wergirim, heke tu iznê nedî ez dê wegerim. Wî wextî Cebraîl ‘elbe elbe’ ji esmanan tê xwarê. Pêxember dibêje Cebraîl’î tu bo min behsa asîmanan bike. Cebraîl dibêje pêxemberî dergêhên asîmanan yên vebûn û milyaket jî yên bûne sef sef. Her wesa pêxember pirsê ummeta xwe ji Cebraîlî dike ka dê roja rabûnê halê wan çawabe. Dîsa di vê mijarê de ka bi awayekê çawa riha Pêxemberî hatiye wergirtin tîne zimanî. Mijar dîsa bi şîretên Pêxemberî devam dike. Ew şîret jî: Da ku muslîman terka nivêj û rojiyan nekin. Dawiya vê beşê sekerata Pêxemberî bi van gotinên xilas dibe. “Wey umeta min, wey umeta min”

Hatî nêzîk dê cuda bim ez ji we
Cumle hûn hêzîr bi emre Ellah ve (MEG/329)

Mîn ji bô we hec û ‘umre ku tewa
Kirne huccet hûn bikin şîdqû şefa (MEG/342)

Emir kir bû qabîdê ruhê heman
Tu here Xanyê Muhemmed bîl-eman (MEG/353)

Çin Muhemmed gote Faţmaê wesan
Ew mirove hat xirab ket lezzetan (MEG/368)

Elbe elbe nazil e ku Cebraîl
Asimanan hate erdî pur zelil (MEG/384)

Gotîbêje behs û denkêt asîman
Lew li erdî ah û zarî û feğan (MEG/387)

Herdû le'leynê di nûrîn herîkîn
Wê digot way ummetê wa ummetî wa ummetî (MEG/410)

Beşa Sêzdehem

Ev beş ji 26 beytan pêk hatiye. Mijara vê beşê şûştina cenazê Pêxemberî (s.x.l.) ye. Di vê beşa mewlûdê li gor neqilkirina Mela Ehmed dema Pêxember wefat kirî, Hz. 'Elî cenazê wî didane ser textê mirî şûştinê. Pêxemberî wesiyet kiriye ku sehabiyên wî cenazê wî bişon. Şeytanê le'în gaziyekê dike da ku sehabiyan xafil bike. Mebesta gaziya şeytanî ewe ku Pêxemberî neşûştî veşêrin. Hz. 'Elî cenazê Pêxemberî temîz û pakîze dişû û Îbnî Êbas avê li cenazê Pêxemberî dike û Usame b. Zeyd jî harîkariya wan dike. Bi vî awayî cenazê Pêxemberî kifin dikin û şeva çarşemê, li gor hindek rîwayetan jî şeva sêşemê li hucra Aîşayê diveşêrin.

Lew Muḥemmed weşyet kir ji bo min tewa
Min bişon weqtê ku ez bûme wefa (MEG/419)

Wî E'î şuşt û temîz pakîze kir
Ba hînûd xetmeê ew pêvekir (MEG/427)

Ku şeva çarşembeê ew medfûn bû
Hind dibêjin leyleêsulasî bû (MEG/433)

Beşa Çardehem

Ev beş ji 8 beytan pêk hatiye. Eve beşa mewlûda Mela Ehmedê Gulordî ya dûmahiyê ye. Mewlûd bi vê beşê ve xilas dibe. Mijara vê beşê wek hîvî û daxwaziyekê ye. Di vê mijarê de nivîskar hîviya hindê dike ku Pêxember (s.x.l.) muslîmanan ji umeta xwe qebîl bike û li axretê dîtina wî bo muslîmanan bibe nesîb. Her wesa muslîman hurmeta mewlûda Pêxemberî bizanin û li ser îmanê mirin bibe nesîbê wan. Nivîskar dawîya berhema xwe de bo efikirina gunehên xwe ji muslîmanan fathê xwandinê dixwaze.

Me qebûl ke j'ummeta xwe ey ḥebîb
Da di ferda dîtina te bît neşîb (MEG/411)

Ew feqîrê pir zunûb nađîḥe
Ey muslîman da bixûnin fatiḥe (MEG/447)

1. 3. JI EDÎBÊN MALBATA GULORDIYAN MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ

Em di vê beşê de bi berfirehî behsa jiyana Mela Ebdulmecîdê Gulordî, wandina wî, zewaca wî û kesayeta wî dikin.

1. 3. 1. Ji dayik bûna wî

Mela Ebdulmecîd eslê xwe Doskî ye û ji malbata Gulordiyana e. Li sala 1948an 7 kanûna duyem roja çarşemî li gundê Gulêrdê hatiye dinyayê. Dibêjine vê bine malê mala pîrê. Ji ber ku navê bapîrê vê binemalê Hesê pîra bû. Mela Ebdulmecîd kurê Mela Eliyê Gulordî ye. Babê wî mirovek xwedî zekawet, ilm û ‘irfan bûye. Navê dayika wî Fatma ye. Dayika wî jî ji qebîla wan bi xwe ye. Mela Ebdulmecîd pênc bira û pênc xwûş hene. Birayek wî çiyê ber dilovaniya Xwedê teala. Mela Ebdulmecîd niha di jiyane deye û li Geverê niştecih e.⁵⁹

1. 3. 2. Mexlesa Wî

Di berhema Mela Ebdulmecîd Guldestê de heşt cihande mexlesa wî derbas dibe. Du mexles bi kar îname. Mexlesa “Ebdullah” şeş caran û “Gulordiyê jar” jî du caran derbas dibe. Navê bapîrê wî Ebdullah bu. Ji ber hindê mexlesek xwe “Ebdullah” danaye. Mexlesa din jî nivîskarî ji ber mutevazîtiya xwe “Gulordiyê jar” danaye. Li gor dîtina Mela Ebdulmecîd Mexles ji bo nivîskaran wek muhrekê ye. Da kesek helbestên kesekî din bo xwe neket mal û lê xudam neder kevît.⁶⁰ Piraînya mexelesam li dawîya helbestan tîn nivîsîn. Hindî me tespît kirî heşt cihan de mexlesa wî derbas dibe.

Ya Reb hîvîdarîn ji rehma te
Umîdwar in bi ‘efya te
Efya te pitir e ji cezayê
Tu bi gëfirîne ‘Ebdulayê (GEG.1/24)

Ya reb tu bo xatra nawê xwe ke
Me ji gunehkaran hesab neke
Gulordiyê jar jî bîr neke
Em nebin ruswa li meşerê (GEG.3/40)

⁵⁹ Mecit Îliş, *Dîdar* (Gulan, 2018), Gever/Culemêrg.

⁶⁰ Mecit Îliş, *Dîdar* (Gulan, 2018), Gever/Culemêrg.

1. 3. 3. Xwandina Wî

Di sala 1952an de wextê hîlbijartin hatiye kirin memûran kart belav dikirin. Hindek kart dimînine nik babê Mela Mecîd, babê wî wan karta bo Mela Mecid dikete elifbê. Heta wî wextî hêj Mela Ebdulmecîd neçûye dibistanê. Wextê Mela Ebdulmecîd li gundî diçîte ber pezî bizinek wê elifbêya wî dixwet. Ew jî gelek digire û dibêje babê min dê min biqute. Babê wî dibêje kurê min ka qelemî bîne da bo te yek din elifbê binivîsîm. Piştî hingê sala 1955an de diçîte dibistanê. Wî demî Mela Ebdulmecîd heft salî bûye. Sala 1960an de hem Qur'anê, hem jî dibistanê xilas diket. Piştî dibistanê xilas diket sala 1960an de diçîte gundê Sûsyan. Ev jî gundekê Geverê ye. Sala 1962an de babê wî û mamê wî bi malekînî jêk cûda dibin. Piştî hingê Mela Ebdulmecîd dikevite bin şolê malê û wek berpisyarê malê barê wî giran dibe. Li gel şolê malê li nik babê xwe xwandina xwe dewam dike. Pênc sala serf û nehwe, fiqhê û ilmê feraîzê dixwûne. Xwandina wî li dev babê wî heta sala 1967an dewam dike. Babê wî di 'ilme fiqhê de gelek yê şareza bûye, her wesa kurê xwe Mela Ebdulmecîd jî di 'ilme fiqhê de perwerde kiriye. Ji bo hindê ehemmiyet daye 'ilme fiqhê ku milletî de'wayên xwe tînane nik wan. Wextê yek miriba teqşîmata mîrati li gor şerîetî belav dikirin, vêca hewceyî hebû ku ilmê feraîzê bizanin, heke jinek hatiba berdanê hewceyî bi 'ilmê telaqê hebû. Ji ber wan sebebên lazim bû ewan 'ilmê fiqhê baş zanîba, hingê hakim û mehkeme çî nebûn, milletî de'wayên xwe hemî tînane nik melayan. Mela Ebdulmecîd û Mela Husênê Doskî gundiyên yek bûn, munasebetên wan li gelêk hebûn. Mela Ebdulmecîd dibêjîte Mela Husên "Min nabeynekê di nik babê xwe dixwand, ez dixwazim li nik te xwandina xwe dewam bikim. Mela Husên jî dibêje ma kê destê te girtiye. Sala 1980an de li nik Mela Husênê Doskî xwandina xwe dewam dike. Heke rojekê Mela Ebdulmecîd neçiba dersê Mela Husên diçi mala wî û dera wî bo digot. Wî demî Mela Ebdulmecîd 35 salî bû. Sê salan bi vî rengî li nik Mela Husên xwandina xwe dewam dike. Xwandina dersên fiqhê, edebiyata farisî (bostan û gulistan) û dersên feraîzî li nik Mela Husên dewam dike.⁶¹

⁶¹ Mecit İliş, *Dîdar* (Gulan, 2018), Gever/Culemêrg.

1. 3. 4. Zewaca Wî

Mela Ebdulmecîd 1967an meha çirya ewil de di gel xanima Fatima dizewice. Kabaniya wî kiça Mela Mehemed Selîmê Kurê Mela Ebdurrehmanê Şagulordî ye. Xezûrê Mela Ebdulmecîd di herêmê de mirovekî zana û alim dihate nasîn. Şagulord jî Gundekê Doskiyan e. Eve pêncî û du sale jiyana Mela Ebdulmecîd û xanima wî Fatimayê pêkve derbas dibe. Ji vê zewacê wan sê kiç û sê kur şeş zarokên wan hatîne dinyayê. Di sala 1968an diçîte eskeriyê. Wî wextî seyda bîst salî bûye. Du salan eskeriyê dike. 1970an de ekseriya wî xilas dibe. Li eskeriyê gelek yê zîrek bû, bala xwe gelek dida dersan, keyfa fermanarên wî gelek pê xweş dibû. Ew dersên didane wî hemî jiber dikirin. Kesek nebûye wî bidete xwandin ji ber vê yeke digotîne “Sahipsiz insan” yanî mirovê bê xwedan. Babê wî nexwest ku kurê wî bibe me‘mur, babê wî yê nesax bû, çî kes nebû şolên malê bikin. Ewladê mala wan yê mezin jî ew bûye. 1975an de babê wî dibêje min di xwewna xwe de dîtiye sala min hêj timam nebe ez dê bimirim, ji ber hinde ez dê biçim hecê, di wê salê de babê wî diçîte hece, serê sala 1976an de yekê muherremê babê wî diçîte ber dilovaniya Xwedê te‘ala. Piştî hingê Mela Ebdulmecîd dest bi ticareta heywanan û pezi diket û celeban diîne û dibe bo rexê ‘İntabê. Mela piştî hingê şola hostatiyê dike, avahî û înceata çêdike. Şola qalip, demir û dîwaran dike. Dazdeh salan şola hostatiyê kiriye. 1998an de di Dîyanêta Tirka de dest bi melatiyê dike û peywîrê fermî werdigire. Panzdeh sala melatiya fermî dike û piştî hingê teqawîd dibe.⁶²

1. 3. 5. ‘Eleqa Mela Ebdulmecîd li gel Edebiyatê

Babê Mela Ebdulmecîd gelek caran helbestên Melayê Cizîrî bi deng û selîqe dixwandin. Guhdariya dîwana Cizîrî gelek diçû xweşiya wî. Ewî jî mereq kiriye û gotiye babê xwe eve helbestên kê ne tu dixwûnî. Babê wî gotiyê eve helbestên Melayê Cizîrî ne. Ew jî di sohbet û axiftinê xwe de bi vî awayî bi kafiye dixaz e ku hindek gotinên husa bi kafiye bejê. Mirovek li gundê wan hebûye, navê wî Ebdulhadî buye. Mela Ebdulmecîd çiyê gundî nik Ebdulhadî Diwana Melayê Cizîrî jê xwestiye. Dîwan jê wergirtiye û gotiyê “Te çî divêt ez bidim te” ewî jî gotiye “Tu payîzê

⁶² Mecit İliş, *Dîdar* (Gulan, 2018) Gever/Culemêrg.

hindek dextî bide min”. Vêca ew bi xwe dest xwandina Melayê Cizîrî dike. Camêrek din jî hebû dostê wî bû, Mem û Zîna Ehmedê Xanî li nik wî hebûye. Ew camêr dibêje Mela Ebdulmecîd ez nizanim Mem û Zînê” bixwûnim, evê pirtûkê bo xwe bibe. Ew dest bixwandina Mem û Zînê dike. Rojekê wextê mem û Zînê dixwûne mamê wî dibêje: “Te ji dest xwandina fikhê hela, veka tu dê biye helbestvan, tu dê cihê Mela Ehmedê Cizîrî bigirî” bo xwe yarî pê kirine.

Mela Ebdulmecîd Sala 1982an de dest bi nivîsîna helbesta dike. Piştî hingê Mela Mecîd navbirekê dide nivîsîna helbestan.

Li gor Mela ebdulmecîd Ehmedê Xanî helbestvanek Kurdewar e. Mebesteka nivîsîna Mem û Zînê heye, ew jî Kurd û welatê wan e. Mebest ne eşqa Mem û Zînê ye. Eşqa welat û mîletê Kurd e. Beko jî fesade di navbira millet û welatî de. Beko ji Mirgeverê ye. Li rexê Îranê. Eslê wî Ecem e.⁶³

Hindî Melayê Cizîrî ye mirovek welî û mutesewuf bûye. Ser siren me‘newî rawesta ye û gotinên wî de me‘nayên kûr hene. Her wekî di helbesta xwe de dibêje:

‘Îde herkes ji didara te lê pîroze ‘eyd
Ez tinê mehrûm û dîdar im bi sed menzil be‘îd.⁶⁴

Dîsa Mela Ebdulmecîd îşareta peywendiyên Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran dike. Her dukan bi rumûzan li gelêk axiftînê. Carekê Mela Ebdulmecîd pîrsa Seydayê xwe Mela Husênê Doskî dike, ka wan çi gotiye, qesta gotinên wan çi ye? Mela Husên dibêje: “Qesta dilê helbestvanên îlahî ew û Xwedê bi tenê dizanin. Ewe siren me‘newî ne, ez neşem bo te çi jê xeber bidim”. Wextê Melayê Cizîrî di helbesta xwe de dibêje:

Ji mabeyna du ebrûyan dibînim qabi qewseynî
Te‘alellah bînî remzî çi renk avête mabeynî.⁶⁵

Her wekî tê zanîn di derheqê Cizîrî de digotin eve yê aşiq e, aşiqê Selwê ye. Selwa mehbûba wî bû.

Selwa sehî qed xwemilî lew kemilî mestane reqs
Wer suhbête ger qabilî dê bîtû ret şahane reqs.⁶⁶

⁶³ Mecit İliş, *Dîdar* (Gulan, 2018) Gever/Culemêrg.

⁶⁴ Mela Ehmedê Zivingî (Aw. Emîn Narozi), *Gerdeniya Gewherî*, Avesta, İstanbul 2013, r. 348.

⁶⁵ Zivingî r. 356.

⁶⁶ Zivingî r. 450.

Çawa Şêxê Sen'anî Nûra tecelaya Xwedê di rûyê Sertênê de dît, Melayê Cizîrî jî ew nur di rûyê evindara xwe de dîtiye. Mesela Feqîyê Teyran û Şêxê Se'anî bi vî awayî tînîte ziman. Di halê eşqa heqîqî de bûye. Bi sir û rumûzan nivîsîye. Aşîq bûn û peywendiyên Şêxê Se'anî û kiçika fele gelek xetere û tesewur bo Mela Ebdulmecîd çêkiri ye. Şêxê Sen'anî mirovek hinde meşhûr û murîdên wî heyn, murîdên xwe ji bo jinikek fele terk dike. Melayê Cizîrî vê kulê ji dilê Mela Mecîd diderêxe.

Mey ne nûşî Şeyxî Se'anî xelet
Ew neçi nîv Ermenistanê xelet

Mislê Musa wî tecelaya te dî
Ê tu dî kanê xeşa hanê xelet⁶⁷

Ev helbesta Cizîrî tesîrê li ser wî dike û hevesa wî dide bal Sêxê Se'anî û Feqîyê Teyran. Dîsa evê helbestê gelek tesîr li ser wî kiriye. Ew jî helbestek eşqê bi navê "Were Dîlber" dinivîse.

Were dîlber bi bejna şîrîn
Bibînim ez cemala te
Dîwana gerîb û aşîqîn
Binivîsim bi 'eşqa te

(GEG)

Keyfa seyda gelek bi Cigerxwûn hati ye. Cigerxwûn mirovek jêhatî, helbestvanek berketî û mezin dibîne. Belê ku Cigerxwûnî terefê sosyalîzmê girtiye, meyla wî bo Sofyetê û li ser çina hecê hindek gotinên wî bo Mela Mecîd xweş nehatîne.⁶⁸

1. 3. 6. Helbestên Mela Ebdulmecîdê Gulordî

Di edebiyatê de tehlîl kirina helbestan cihek girîng girtiye. Di vê binbeşê de helbestên Mela Ebdulmecîd di pirtûka Guldestê de hatin nivîsîn ji aliyê edebî û naverokê ve hatin tehlîl kirin. Her helbestek li bin sernavê xwe ve ji aliyê naverokê ve hate tehlîl kirin û ew helbestên mijara wan wek yek çendek li bin sernavekê hatin tehlîl kirin.

⁶⁷ Zivingî, r. 477-478.

⁶⁸ Mecit İliş, *Dîdar*, (Adar 2019), Gever/Culemêrg.

1. 3. 6. 1. Guldeste

Berhema Mela Ebdulmecîd “Guldeste” ji 39 helbestan pêk hatiye. Şehsed û bist û heşt (628) çarîn in. Mela Ebdulmecîd di salên 1980an de dest bi helbest nivîsînê kiriye. Ewil nivîsîna wî li ser helbestên eşqê bûye. Piştî hingê demekê dirêj nezîkî sih salan pitir navbir daye nivîsîna helbestan. Eve çend saleke carek din wî dest bi helbest nivîsînê kiriye. Ev berheme ji wan helbestên berê û yên nû pêk hatiye.

Heftê şalî heftê best e
Min nişret ji Xuda xweste
Bo cahilan bît guldeste
Li bîr bînîm civat û serşalan (GEG.39/4)

1. 3. 6. 2. Serwa (Qafiye)

Serwa bi zimanê Kurdî li cihê qafiyê tete bikaranîn. Serwa di wateya ferhengî de tê wateya piştî serî, bi gotineke din patika serê mirov e⁶⁹, peyva serwa an jî qafiye ji bo wateya “dawiya tişteki”⁷⁰ û di edebiyatê de ji bo wateya “dawiya beytê”⁷¹ hatiye bikaranîn. Serwa di dumahiya rêzên helbestan de cihê xwe digire. Herfa serwayê ya dumahiyê dibêjinê “rewî”. Rewî herfa serwayê ya esliye. Ji bilî herfa “rewî” yê piranî ev herfên serwayê tên bikaranîn. Ew jî tesis, daxil, rîdf û qeyd in.

1. 3. 6. 2. 1. Serwaya Mucered

Serwaya ku bi tenê dubarekirina herfa reviyê pêk tê serwaya mucered e, herfa reviyê bê hereke ye û berê wê herfeke bi hereke heye⁷². Mela Ebdulmecîd û Mela Ehmed serwaya mucered di berhemên xwe de bi kar înan.

Bo Muhemmed Muştefa xeyrû'l-beşer
Der f'îğan be daîma ey ba xeber (MEG/6)

Dê biket navê ewî zîr û zeber
Ez dizanim ercela wî hate ser (MEG/205)

Paşi hingê emr û ferman ya melek
Tû were nêzîkî min gayet gelek (MEG/398)

Ew gelek xudan ‘ilm û huner
Belkî tu qebûl bikî eger (GEG.14/10)

⁶⁹ Nezîr Ocek, *Edebiyata Kurdî*, Sîtav, Van 2016, r. 158.

⁷⁰ Adak, r. 158.

⁷¹ Adak, r.358.

⁷² Adak, r. 360.

Ew rûmetê wey şor û zer
Ew çavêt reş birû li ser (GEG.20/9)

Dîn û ol wêt bûne serwet
Nema ye namus û hesyet (GEG.37/6)

1. 3. 6. 2. 2. Serwaya Murdef

Di serwaya murdef de herfa “ridfê” cihê xwe digire, herfên ridfê “elîf, waw, û yê” ne⁷³. Heke berî herfa rewiye herfek ridfê derbas bibe, eve dibe serwaya murdef⁷⁴. Ev cure serwaye jî herdu nivîskaran di berhemên xwe de cih îname.

Çine bağê cennetê hem ba sirûr
Seyrê cennet kir digel hûr û qusûr (MEG/218)

Ew resûllahi ku çî way eman
Tû şefî‘ û şemê‘ cumleyan heman (MEG/339)

Ber Muhemmed rehberê erbabê dîn
Hem şelatan hûn biden j’ dil û yeqîn (MEG/439)

Em kirin xudan eql û lîsan
Ewî çêkirin em musilman (GEG.1/2)

Kanê serwer kanê beşîr
Kanê resul kanê nezîr (GEG.4/6)

Kirim sewda kirim mecnûn
Bi nav çeşmêt eswed ‘uyûn (GEG.20/2)

1. 3. 6. 2. 3. Serwaya Muqeyyed

Serwaya muqeyyed jî beriya herfa rewiye dubarekirina herfên hemcins in û bê hereke ne.⁷⁵ Mela Ehmed û Mela Ebdulmecîd ev serwaye jî di berhemên xwe de bi kar îname.

Goti wî bo Ehmedî ey taze e’yş
Ta neêtin nadem ey fehrê Qureyş (MG/130)

Hatibû ser şûretê e‘rabê Zeyd
Wî selam kir l’ser Muhemmed ehlê beyt (MG/359)

⁷³ Nesîm Sönmez, *Dîwana Şêx Muşerrefê Xînûki*, Seyda yayınları, Diyarbakır 2018, r.37.

⁷⁴ Adak, r. 360.

⁷⁵ Adak, r. 361.

Harîkarya wan kirî Ussame Zeyd
Cibreîl hat wî demî hem ba Cuneyd (MG/429)

Xwe dihejîni bi qameta şeng
Bidî bayê xwe yê heftreng (GEG.23/14)

Cariyê sufre îna û hejand
Çinîk li derê malê reşand (GEG.33/38)

Her ew e bûye resûlê seqeleyn
Her ew e bûye îmamê heremeyn (GEG.2/3)

1. 3. 6. 2. 4. Serwaya Muesses

Heke berî herfa rewiye herfeke bi hereke hebe û berî wê jî “elîf” derbas bibe “serwaya muesses” tê meydanê.⁷⁶ Mela Ebdulmecîd ev cure serwaye jî di helbestên xwe de bi kar îname. Bes cureyên vê serwayê me di Mewlûda Mela Ehmed de nedîtin.

Xusar nebît ew emanet
Li ‘umrê xwe neke xîyanet (GEG.3/7)

Li nik te ez rûnim carek
Ji eşqê tu bide parek (GEG.18/6)

1. 3. 6. 3. Naveroka Helbestan

Helbesta Hemda Xwedê (1): Mela Ebdulmecîd Helbesta ewil bi hemda Xwedê destpê dike. Ev helbest ji bist û çar çarînan pêk hatiye. Temaya vê helbestê ev e kû mu’min bi kiryarên qeş ve hemda Xwedê bînine cih. Ew Xwedayê eqil, lisan, zanîn, îman û dîn dane însanî. Ji ber vê çendê succê bo wî Xwedê bikin û perestîne bo wî bikin. Her wesa nivîskar di vê helbestê de rêkirina Pêxemberan nişan dide û bo me berçav dike û dibêje ku Xwedê teala însan yê bi pênc hewasan ve xemilandî. Xwedayê pak û bilind însan li ser suretek delal û xweş yê çekirî. Nivîskar di vê helbestê de îşaretê dide sureyê Tîn ayet 4an. “Bi rastî me mirov di baştirîn renk da afirandiye”⁷⁷. Xwedê teala însan li ser şiklê “Ehsenît-teqwîm” çekiriye. Ewil însan ji ax û kuran afirandiye û piştî hingê ji riha xwe pifkiriye.

Di helbesta hemda Xwedê de nivîskar behsa çend mijarên din jî dike. Bala xwandekarî dide “Ehda elestê” û qedr û qîmeta însanî destnîşan dike. Xwedayê pak û

⁷⁶ Adak, r.361.

⁷⁷ Tehsîn İbrahîm Doskî, *Tefsîra bi sanahî*, Pirtûkxwaneya nûbihar, Duhok 2007, r.598.

bilind însan li ser rûyê erdî bo xwe kiriye xelîfe û emrê milyaketan kiriye ku bo Adem biçin succê. Eve qedrek mezin e di destpêkê de xwedê teala daye însanî. Ewî însan ji cin û milyaketan bilindtir yê çêkirî. Ji ber hindê nivîskar çûna miraca Pêxemberî wek numûnekê nîşa dide. Mebesta nivîskarî ew e bibêje: Cihê însan çiyê cin û milyaket neşên biçinê. Însanî riha xwe ya jiyane ji Xwedê wergirtiye. Belê Xwedê teşbihî çî tiştî nîne. Ew bi saloxetên xwe ve ji her tiştêkê yê cuda ye. Disa di vê helbestê de nivîskar aşkera dike ku însan nehatiye vê dinyayê wekî giyayekê şîn bibe û pûç bibe. Ew ji bo îmtihanê yê hatiye vê dinyayê. Xwedayê pak û bilind eql û zeka dane însanî da ew hemda wî bînin cih û kiryarên qeç bikin. Ji ber vê yekê dinya wek mezrayekê ye û zevya roja axretê ye.

Dîsa nivîskar Xwedayê mezin bi saloxtên mexsûsê wî ve nîşa me dide. Ku ewê qedîm û xwedan qudret û seltenet e. Wî çî şîrîk, malxwê û wezîr nînin. Her wesa wî çî berahî û dûmahî jî nînin. Nivîskar dibêje: Ew kesê mu'mîn be, divê baweriya xwe bi milyaketan, kitêban, xêr û şeran û bi roja mehşerê bîne. Her wesa Xwedê bi çarde saloxetên zafî û subûtî ve binase. Bawermendan hişyar dike da ku ew bi kiryarên qeç ve hemda Xwedê bikin. Da mu'mîn rêzgirtina Xwedê bi îbadetên rojane û yên serekî ve bikin. Wek rojî, nivêj, hecc û zikatê. Piştî îbadetên pêdivî û ferz divê mu'mîn kiryarên xwe bi dildarî û minêkar bikin. Da ku ev dildariye camêriya wan zêde bikin. Ew kiryarên baş wekî rûgeşî, dilxweşî, mêhvandariyê da bike û ji xirabiyên wekî dilê mirovî jî kîn û kerban paqij bikin û ji hesûdiyê dûr bêxin. Nivîskar dîsa diqata xwandekarî dide hindê da ku mu'mîn dilê kesê nehêle, du'a bo muslîmanan bike, şermê ji Xwedê bike, xirabiyê li çî qewman neke, bizane ku Xwedê wî li her cihekê dibîne. Dîsa bi girîngî li ser hindê diraweste ku gotin û dilê bawermendî wek yek bin, yê durû nebe, nekeve zewq û sefayê û bi direw şahidiyê neke. Divê si'ra hemda Xwedê de ji bo sefrazîya jiyana dinyayê û axretê dixwaze ku însan van kirina bo xwe bike adet. Hîviyê ji Xwedê dike ku ew rehmê bi mu'mînan bibe. Helbest wek nesîhetekê ye bo xwandekaran. Çarîna dawiyê rêzka xilasîyê de dibêje: "Tu bi xwefîrîne Ebdullayê" Ebdullah jî mexlesa Mela Ebdulmecîd e. Mexlesa wî cara ewil di helbesta hemda Xwedê de derbas dibe.

Were bike hemda xudayî
 Wî Xudayê ku em dayî
 Em neyiyê înan heyiyê
 Nî'met kirin bi îslamiyê

(GEG.1/1)

Helbesta Selat û Selam (2): Ev helbest ji yazde çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê selewatdana li ser pêxemberî (s.x.l.) ye. Ji bo qedir girtina Pêxemberî (s.x.l.) hevokên helbesta xwe bi arifane divehîne. Pêxemberî wek xweştiviyê Xwedê yê ewil û yê dawiyê dibîne. Nivîskar çarîna ewil de selewatdana ser Pêxemberî wek emrê Xwedê dibîne û hinartinekê dide sureyê Ehزاب ayeta 56an. “Ey gelî ewên bawerî bi Xwedê û Pêxemberê wî înayî û kar bi şerî’etê wî kiri, hûn-bo qedirgirtin- silavan bidene ser Pêxemberê Xwedê û du’ayan bo wî bikin”⁷⁸. Divê helbestê de dibêje ew hem xatemê Pêxemberan e, hem pêxemberê ins û cinan û hem jî ji bo mu’minên gunehkar dê bibe şefe’tçî. Dîsa di naveroka vê helbestê de çend mu’cîzên Pêxemberî tîne ziman û îşaretê dide kerkirina mu’cîza heyvê. Mu’cizeka wî jî ew e ku bi tiliyên xwe îşaret daye peykerên muşrîkan û peyker ketine erdî. Vê heqîqetê jî berçav dike ku di saya rêberiya wî de musulman bûne xwedan îman û xwedan Qur’an. Her wesa ew rêberê roja dûmahiyê ye jî. Disa bi saya peyama wî gerdûn bi rûmet ketiye. Temaya vê helbestê selewatdana ser Pêxemberî ye. Ew xwedan mu’cîze û xwedan saloxetên bi girîng e û xwedan qedrekê bilind e. Ji ber wan teybetmendiyan ew hêjayî hindê ye ku selewat bo wî bêne dan.

‘Emir kirye Xudayê mezin
 Şelatan biden ser hebîbê min
 Ew hebîbê ewwel û axir
 Li ba min kes nîne wek wî biqedir

(GEG.2/25)

Helbesta Rabe Di Vî Demî (3): Ev helbest ji çil çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê li ser hindê ye ku mirov ‘umrê xwe xalî û bi xusaretî neborîne. Mirov her gavekê wek rêvingekê di halê seferê de be û xafil nebe. Divê mirov bizane ka bo çi hatiye vê dinyayê û dê kîve biçê û mebesta jiyana wî çi ye. Ji ber hindê nivîskar bala xwandekarî dide hindê ku ‘umrê xwe bi kiryarên xirab ve derbas neke. Mela Ebdulmecîd di vê helbestê de li ser meselên baweriyê û kiryarên qenc û baş dirawest e. Da ku mirov mebesta afirandina xwe bizane, xwe ji bîr neke, bêhiş nebe, her gavekê yê hişyar be, li vê cîhanê sefil û jar nebe, fêlên xirab û hîlan neke, baweriya xwe bi afirendekarê ‘alemê bîne û nekeve di nav îxanetê de. Nînîskar wek rênîşanekê helbesta xwe divehîne û nexşekê didane pêşya mirovî. Da ku mirov li kiryarên xwe bine xwedan, esasen bingeha bîr û baweriya îslamê tîne bîra bawermendan, ji bo îmenak kamil û îbadetên rojanê tîne bîra musulmanan, balkêşî li ser nivêjê dirawest e.

⁷⁸ Doskî, *Tefsîra Sanahî*, r, 426.

Nivêjê wek stûna dînî dibîne û dixwaz e nivêj bête muhafezekirin. Nivêjê ji bo paqijîya dinyayê, hem jî ji bo xilasbûna agirê cehennemê wek ronahiyekê dibîne. Nivîskar di vê helbestê de dixwaze hem heqê Xwedê hem jî heqê evdan bête parastin. Însan xwe ji durîtiyê, xiybetê û zulme dûr bêxin. Hevkariya ketiyan bikin û kêmbiayivin. Her wesa ji bo jiyaneke aram çend nuqteyên girîng tîne ziman û berfireh li ser van meselan dirawest e. Dibêje ji bo mirovek dilşad hewceye ku ji emanetî xain nebe û hêj mirov pîr nebûyî kiryarên qeç bike. Dîsa dixwaz e mirov qîmeta wextî bizan e. Hêj karwanê rêvingiya jiyaneke derbas nebûyî divê xwe amade bike. Divê helbestê de hestên jiyaneke aram û paqij serdest in. Helbestvan jiyana mirovî diwekîne seferek dûr û behrek kûr. Dawiya helbestê de dibêje ev sefere bo qebrê kûr diçe. Hewar û gaziya xwe dibe rebbê xefûr û du'a dike ku em ji gunehkaran neên hesapkirin. Çarîna dûmahiyê de mexlesa nivîskarî derbas dibe. Ew jî "Gulordiyê jar" e.

Ya reb tu bo xatra nawê xwe ke
 Me ji gunehkaran hesab neke
 Gulordiyê jar jî bîr neke
 Em nebin ruswa li meşerê (GEG.3/75)

Helbesta Were Gelo (4): Ev helbest ji şazde çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê jî wek dewama helbesta berî xwe ye. Nivîskar destpêka helbesta xwe de gaziyekê dihêle.

Were gelo lezê bike
 Ne keve xwewa xefletê
 Ji bo axretê karî bike
 Nebe j'yêd dûrî reşmetê (GEG.4/76)

Nivîskar dixwaze ku mirov nekevin nav xefletê û ji bo axretê kare qeç bikin. Di çarîna duyê de rê nîşa mu'mînan dide da ku ew bo xwe xufranê ji Xwedê bixwazin û di vê cîhanê de nekevin nav le'bê de. Çarîna sêyê de baweriyê bi Qur'anê bînin û emr û peymanên Xwedê bi cih bînin û bi qudreta xwedê bawermend bin. Di çarîna çarê de hîvîyê ji Xwedê dike û gazî Resûlullah dike. Di navbira çarîna pênc û dehan de navên çend pêxember, sehabî û mirovên Xwedê tîne zimanî. Siwal dike, gelo! Ev kese kanê ne? Di çarînen yazdê û çardehan de behsa kabaniya Hz. Lut (s.x.l.) û seyê eshabul-kehf dike. Me tê digehîne ku jinika Hz. Lût însan jî bû, belê ew ji ber hevkarîya xiraban wêran bû. Seyê eshabûl-kehf heywan jî bû, belê ku li derê şikefta mirovên Xwedê de bû nobedar, çû behestê. Herdû çarînen dawiyê de ji

ber xatira wan mirovên Xwedê ‘efibûnê dixwaze. Dîsa çarina dawiyê de mexlesa nivîskarî “Ebdullah” derbas dibe.

Helbesta Behsek Ji Dinyayê (5): Ev helbest jî ji neh çarînan pêk tê. Mijara vê helbestê dinyaya fanîye. Nivîskar di çarîna ewil de dinyayê diwekîne serayeke fanî û bê binyat. Ev dinyaye wek eywan û sihwanekê ye. Vêca ew kesên aqilşinas divê veberhênên xwe ne ji bo dinyaya fanî, ji bo dinyaya baqî bikin. Divê helbestê de nivîskar me hişyar dike, da ev dinyaya fanî me nexwapîne. Em hişyar bin û nekevîn xefletê û bêhay nebin. Dest êxistina axretê bi kiryarên baş û qenc ve bo me berçav dike. Hêj mirov ji dest û pêyan û sihêtê neketî divê kiryarên baş û zikrê Xwedê bike. Ji mirovên xirap nebe, berî ku însan neçûye cihê tarî divê ‘emrê Xwedê bi cih bîne, qusîriyek hebe, tobe bike. Xwedayê xwe binase û ji asiyan nebe. Nivîskar dixwaze ku mirov ji rastiyê nederkeve, hevalîniya mirovê xirab neke, hurmeta day û baban bigre û bibe ehlê xêrê. Her wesa li ser van kiryarên çak dinyayê ji bo xwe neke armanç, dinyayê wek amrazekê bibine.

Bikeyn behsek ji dinyayê
Ji wê mesken û serayê
Ye fanî û bê esas e
Ey gelê aqil şînas e

(GEG.5/1)

Helbesta Dikem Fîxan (6): Ev helbest ji şeş çarînan pêk tê. Mijara vê helbestê hewar, gazî û fîxan e. Nivîskar bi hestiyarî dixwaze dengê xwe bigehîne rebbê jorî. Di rewşeke nexweş û xusaret de ji bo demê borî bi fîxan fikr û ramanê xwe tîne zimanî. Bêçaretiya nivîskarî û rewşa ew di nav de ew êxistiye di nav nalîn û gaziye de. Nivîskar ew zemanê xalî, bi nezanî borandî bêfayde dibîne û wî zemanî diwekîne şeva tarî.

Di zulmeta şewa tarî
Dikem fîgan dikem zarî
J’bûrîna weqtê xwusarî
Bê fayde borî di zemanî

(GEG.6/1)

Nivîskar ji bo wî zemanê wek şeva tarî borî peşêmaniyê dixwaze û hewara xwe digehîne esmanî. Ji berk u esman cihekê bilind e mekanê xwedê simbolîze dike. Heke Xwedê yê ji mekanî munezeh e. Dîsa di vê helbestê de hewara xwe dibe rebbê jorî û dermanê êş û elemên xwe ji wî dixwaz e. Dawiya vê helbestê de Mela Ebdulmecîd lêborînê ji Xwedê di xwaz e.

Helbesta Dinya Fanî (7): Ev helbest ji dazdeh çarînan pêk tê. Mijara vê helbestê dinyaya fani ye. Nivîskar dinyayê diwekîne cihê demborînê. Dibêje dinya cihê bexteweriyê nîne, dinya mirovî têxe nav xefletê û dixapîne. Cihê kul û derdan û hesretê ye. Nivîskar di gel dinyayê tê zimanî. Nişa me dide ku dinya mirovan jêk cuda dike, dibete cihê xurbetê. Dinyayê hesreta kes û kar û xweştiviyan êxistiye dilê nivîskarî de û wan di nav axa xwede berze dike. Ji bo vê hesretê jî bêçaretîya mirovî tîne berçavê xwandekarî. Dîsa mezinahiya şahê cîhanê tîne zimanî. Diyar dike ku di vê dinyaya fanî de ji xeyrî zatê şahê cîhanê her tiştek fanî ye. Şîrîniya rûyê dinyayê bi hunerî tîne pêş çavên xwandekaran. Ev rûyê dinyayê li ber çavên mirovan yê cazîb e. Heta mirov vê dinyayê dest xwe bêxe gelek xeletîya dike. Mirov ji bo vê dinyayê xweştiviyan xwe diguje û dîn û îmanên xwe jî winda dike. Nivîskar di çarîna heştê û heta çarîna dehan bi awayekê zindî axiftina xwe li gel dinyayê dewam dike. Xwandekaran agahdar dike ku dinyayê çi kes nehêlayine, însan û heywan hemî da'ûrayîne nav zikê xwe de û binerd kirîne. Her wesa vî warê rû şîrîn xweştiviyan xwedê jî di nav xebr û toza xwe de winda kiriye. Di çarînen dawiyê de bêînsafiya vê dinyayê tîne bîra me. Dinyayê Canfeda û qurnaniyan xwe hemî kurtkirin û binax kirin. Nivîskar ji ber rewşa vê dinyayê ji bo halê xwe digire. Dîsa çarîna dawiyê de “Gulordiyê jar” mexlesa nivîskarî derbas bûye.

Te gelek yê wî wî kirî
 Di zikê xwe da qurda kirî
 Gulordiyê jar bo xwe bigrî
 Tu ji wexte biçî ye rişmetê

(GEG.7/12)

Helbesta Da Bi Pirsin (8): Di vê helbest de jî Mela Ebdulmecîd li ser rewşa dinyayê dirawest e. Ev helbest ji şeş çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê ew e ku mirov yê ketiye di nav zewq û sefaya vê dinyayê û mebesta hebûna jiyana xwe ji bîrkiriye. Nivîskar kêmasiya dîndarî û bê exlaqîya civaka îro berçav dike. Di çarînen 1-3an de rewşa bêdîniya îro di nav civakê de belav bûyî û terk kirina nivêj û cema'etê û her wesa xirabîya vexwrina şerabê tîne zimanî. Ji vê bêdîniyê nivîskar melayên nezan mesul dibîne. Wan melayan diwekîne feqîyan. Feqî ew kese yê li medresê dersan diwergire. Yanî 'ilmê xwe xilas nekiriye. Hewceyîya wî heye ku gelek dersên din wergire. Da bête wê derecê ku we'z û nesîhetan li xelkê bike. Ew kesê hewceyî bi ders wergirtinê heyî dê çawa civakê di derbarê dînî de agahdar bike û heqiyê bêje. Nivîskar egerekê bêqedir bûna şerî'tî huşa tîne zimanî. Derd û êş û

elemên me‘nevî ketin nav civakê, hîlekarî zêde bû, serxweşî kete nav milletî û mane di nav rewşek nehişyar de. Nivîskar di çarîna şeşê de di misra dawiyê de ji bo vê rewşa nebaş tewbê dixwaz e. Wek endamekê vê civata gunehkar xwe berpirsiyar dibine. Dîbêje: “Tewbe bike ey Ebdullah” Ebdullah jî mexlesa wî ye.

Em yêt kewtine gefletê
Daîm wê dikeyin geybetê
Nekêş e tu wê zehmetê
Tewbe bike ey ‘Ebdullah (GEG.8/6)

Helbesta Hatime Dergahê Rehmet (9): Ev helbest heft çarîn in. Mijara vê helbestê du‘a ye. Du‘a xwestek e mu‘mîn ji bo ‘efkirina gunehên xwe ji Xwedê dixwaz e. Nivîskar xwe diavêje ber dergahê dilovaniya Xwedê. Ji bo xeta û gunehên xwe ‘efiyê dixwaz e. Nivîskar wek tercumanê civaka xwe ye. Îxanet, bêinsafî û gunehkariya civaka xwe tîne zimanî û dibêje: “Ez êxsîrê nefsa xwe me” ji şiklên êxsîrîtiyê ji hemiyar xiraptir ew e ku mirov bibe êxsîr û bendeyê nefsa xwe û di nav nefsa tarî de niqo bibe. Nefis hemî gava xirabiyê telqîn dike. Dîsa nivîskar kiryarên xwe yên xirab, bênesîbiyê û bêsewabiyê ji hevkarîyan pîsan û bexîlan peşemaniyê dixwaz e. Di nav vê rewşa nebaş de lêborînê ji Xwedê dixwaz e. Hîvîdar e ku Xwedê îmanê bide da rûreş nebe li meydana. Mebesta wî bi meydana jî roja mehşerê ye. Di peyva meydana de mecaz heye. Nivîskar xwe ‘aciz, bendewar û biçik dibîne li hemberî rehma Xwedê. Tulê ji bo xwedanê xwe gelek sadîq e. Her gavekê li ber derazînkê xwedanê xwe rawestayî ye. Li vîrê teşbîh heye. Nivîskar mirovan wek tuleyekê dibîne. Çawa tule ji bo xwedanê xwe sadîq e û hewceyî pê heye, her wesa divê mirov jî di dergahê Xwedê de rawesta be û hewceyiyên xwe ‘erzî wî bikin. Nivîskar di vê helbestê de li gel Xwedê tê zimanî û xwe diavêje ber edaleta wî ya berfireh.

Hatime ber dergahê rehmet
Pur xeta û zor hewcem e
Bi gunah û terke ‘ibadet
Ez rûreş û şermîn dem e (GEG.9/1)

Helbesta Di Nav Agirê Dil Da (10): Ev helbest ji heft çarînan pêk tê. Agirê eşqê ketiye dilê aşîqî. Eşqê dilê aşîqî yê dorpeç kirî. Perwanê ji ber hejêkirina agirî li dor agirî dizivire, heta disoje. Nivîskarî agirê dilê aşîqî wekandiye perwanê. “Agirê dil” gotinek belavbûyî ye di nav civatê de. Di vê helbestê de agirê dil wek mecaz derbas dibe. Ne heqîqi ye. Li wêrê agir; êş, elem, nexweşî, cefa, keder û keserê

sembolize dike. Nivîskarî gotina xwe bi awayekê alegorik înyayê zîmanî. “Bidîtina çavan wekî findê” li wê vêrê hunera ciwankariyê wekandin/teşbih heye. Ronahiya çavên yarê wekandine findê. Nivîskar di vê helbestê de agirê dilê xwe, xem û xiyalên xwe û nexweşiyên xwe tîne zîmanî. Eşqa di dilê aşiqî de wek agirî di hilbe. Aşiq dilbera xwe wek nêçîrvanekê dibîne. Çawa nêçîrvan tîra xwe diavêje û li dil û mêlakên nêçîrê dide. Agirê eşqa dilberê ketiye dilê aşiqî wek xencer û tîrê ye. Fel û findên dilberê wek talanî dibîne. Eşqiya çawa kesan talan dikin û çî tiştî bo nahêlin, her wesa dilberê dilê aşiqî yê wêran kirî. Aşiqî can û malê xwe di rêka dilberê de yên feda kirin. Agirê di dilê aşiqî de ew wekî êxsîrekê yê lêkirî û yê kirîye evdal. Ji dost û hevalan dûr êxistiye. Wek rêvingekê ketiye vê cihanê.

Di nav agirê dilda me ez
 Di şoj im şuphê perwanê
 Bi soz û qeyd û bendan
 Were carek bi peymanê

(GEG.10/1)

Helbesta Çina Taziye (11): Ev helbest ji bîst û çar çarînan pêk hatiye. Mela Ebdulmecîd di vê helbestê de li ser çina serxweşiyê dirawest e. Mijara vê helbestê naqokiyên di nav jiyana civakê de heyîn berçav dike. Di vê helbestê de mebesta nivîskarî ew e ku îro hem cihê girî û şîniyê hem jî cihê keyfxweşî û şahî yê di nav civakê de wateya xwe wînda kiriye. Me‘na jiyane nemaye. Civak ji kevneşopiya xwe qediya ye û ji ‘urf û ‘adetê xwe dûr ketiye. Ew qeyd û bendên civakê pêkve girê didin yên jêk verestîn. Ji bo vê rewşê nivîskar di jiyana xwe de mînakekê dîde. Rojekê dema ew di nav taziyeke de mirovek tete nik wî û bi îşaretan di gel wî diaxive. Nivîskar nerazîbûna xwe ji vê hereketa wî mirovî tîne zîmanî. Bi vî halî ew jî cihê xwe radibe û diçe nik wî mirovî. Ew mirov dibêje seyda! Îro daweta kurê min e û cema‘et li hîviya me ye. Li teqsiyê sardibin û diçin cihê dawetê. Nivîskar dawetê wek cihê xwefletê dibîne. Di jiyana civakê de mirin û jiyana li gelêk e. Cihekê mirin e cihê din jî jiyana e. Nivîskar nîşa dide ku her tiştê cihê kirin û gotina xwe heye. Mirov li taziye bigire û li dawetê jî şahiyê bike. Li ber derê mala mirî nerezîs e. Divê civak nîrxên mirovahiyê bîr neke. Ew tiştê mesleheta jiyana mirovan tê de hey mirov bin pê neke. Nivîskar li derdorê vê temayê hevokên xwe vehandîne. Rewşa civaka îro bo me berçav dike. Aliyêkê mirin û taziye, aliyêkê din jî dawet û dîlan û şahî ne. Wêneyê rewşa bêhurmetiya di nav civakê de bo me berçav dike. Ji ber vê bêhurmetiya peyda bûyî nexweşiyên me‘newî zêde bûne. Bê nesîbiya se‘adetê bi

bêdermanî û bêtebîbiyê ve digêrede. Dîsa nivîskar di halê nebaş de ronahiyekê jî nabîne. Ev halê îro civak ketiye tê de diwekîne behra heyretê.

Muşkîlat li me di barîn
Em di gel yek du neyarîn
Bê ‘emel û xirab karîn
Lew nabînin se‘adetê (GEG.11/15)

Ĥesret kêş û dil birinin
Herdu çawan bi girînin
Em ronahîyekê nabînin
Kewtîne behra heyretê (GEG.11/18)

Dîsa di çarînen vê helbestê de rewşa kiryarên xirab di nav milletî de tên kirin nîşa dide. Vê rewşê wek leşekê bi derd birin dibîne. Milletê Kurd qedîm de qedrê mezinên xwe girtiye. Nivîskar ji bo vê çendê jî gazinda dike. Dibêje: Gotina xêrê nema, kes gotina kesê qebîl nake, herkes xwe mezin û axa dibîne, herkes berjewendiyên xwe ber têxe û cihê muhebbetê nemaye, însan ji bo pare û dinyayê dîn û îmanên xwe jî firotin. Dawiya vê helbestê de ji bo rizgarbûna vê rewşa xirab ji Xwedê necatê dixwez e.

Helbesta Gula ‘Umrî (12): Ev helbest ji deh çarînan pêk hatiye. Nivîskar ‘umrî diwekîne gulê. Heke ‘umir ewil xweş borî çawa gul bêhnê dide, ‘umir jî wesa dê yê bi bereket be. Gula ‘umrî diwekîne sûsina nizarî. Bihar destpêka heyatê ye. Sûsin jî guleka demsala biharê ye. Sûsin dermanê birîna ye. Li serê çiyayên bilind li nav hewayê xweş şîn dibe. Heke gula ‘umrî bereket be dê wek sûsinê be. Heke ‘umir baş derbas bû dê wek vê gulê be. Dîsa nivîskar ‘umrî wek fêslên salê dibîne. Hindî bihare demsalek bi zêdehî û bereket e. Divê demsalê de bilbil serxweş dibe. Dîsa wextê havîn hat mirov ber piratîyê ve diçe, bereketa ‘umrî kêr dibe. Wek giyayê behî lê tê. Merheleke ‘umrî jî payîz e. Payîz di nav demsalan de ya dûmahiyê ye. Wextê payîz hat giya hişk dibe. ‘Ûmir jî wesana e, divê demsalê de bereketa ‘umrî xilas dibe û mirov dikeve nav xusaretê. Cesedê mirovî wek giyayê hişk lê tê. Dîsa nivîskar di çarîna çarê de gula ‘umrî jî wek darekê dibîne. Ev dare carekê feqî dide. Gula ‘umrî însanî jî diwekîne vê darê. Ew dar jî di demsala biharê de şîn dibe û bêhna wê xweş e. Ev dare zikre Xwedê dike. Li gor dîtina nivîskarî heke însan ‘umrî xwe bi îflasî derbas bike kare wî dê wek gêra didine bagerê lê êt. Nivîskar di çarîna heştan de behsa sin‘etkariya Xwedê dike. Bêkêmasî û bênuqsaniya Xwedê tîne zimanî. Dîsa di çarîna dawîyê de dibêje sin‘etî ji sani‘î bizane. Ew nexşên li ser

etlesê hatîn çêkirin hûn ji Xwedanê wî bizanin. Xweşikiya sin‘et û lawîniya nexşan zanîna ûstayê wê nîşa dide. Ji ber vê çendê hûn ewî ûstayî ji bîr bekin, çawa dar zîkrê Xwedê dike, hûn jî wesa Xwedê bînin bîra xwe. Her wesa di vê çarîne de bo xwe du‘a dixwaz e. Carek din mexlesa wî di vê şî ‘rê de derbas dibe. Ew jî “Ebdullah” e.

Gula ‘umr’i darek e
Li ser jîna heyatê
Fêqî didek carekê
Eslê wê ji xak û av tê (GEG.12/4)

Helbesta Were dil û Bo Min Bejê (13): Ev helbest ji şazdeh çarînan pêk hatiye. Ji çarîna duyan de tê zanîn ku nivîskarî ev helbest di ‘umrê xwe yê dûmahiyê de nivîsiye. Di wextê pîr û kaliyê de nalîn û gaziya dilê xwe tîne zimanî.

Te nema wextê xweşiyê
Tu ji bîr bike cuwaniyê
‘Umir hate dûmahiyê
Tu pîrekî êdî kalî (GEG.13/2)

Sebebê nalîna dilê xwe husa aşkere dike. “Te ne şev e te ne roj e” dewama van rêzkan de ji ‘umrê dawiyê, pîr û kaliyê, derd û êşan û nalîna dilê xwe tîne zimanî. Nivîskar vê rewşa dawiyê qebûl dike. Dibêje: Mil bûne xwûl, wext bû zelûl û bêçare ma, ‘umir borî û wextê xalî nema. Dîsa hewara xwe digehîne rebbê xwe û dibêje: Dinya cihê mirazê nîne, daxwaza xwe bo axretê bikin û hîviya xwe bigehînin nik Xwedayê xwe. Heke mirov dewrên ‘umrê mirovî bîne pêşçav zarokatî, ciwanî û pîratî ne. Di vê helbestê de dewrê pîratîyê înyayê zimanî. Di vê dewra ‘umrî de însan şîyanên xwe yên hilberanî wînda dike. Bedena mirovî sist dibe, çavên wî tarî dibin û hizr û bîrên wî kêr dibin, êş û elem lê zêde dibin. Dîsa di vê dewra dawîde însanî wek evdalekê dibîne. Nivîskar di vê psîkolojiya evdalîyê de rewşa xwe û perîşaniya xwe qebûl dike û nexweşî û taliyan wek fermanên Xwedê dibîne. Dibêje: Ev dinyaye cihê mirazê nîne, bîr û baweriya xwe bi Xwedê bînin. Ewe ‘emrê rebbê cebbar e. Kes neşet biguhore.

Nexweş û talî tîni ji Xudayî
‘Emr û fermanê wî dayî
Li ser serê min ez gedayî
Dê qebûl kem bi hevalî (GEG.13/10)

Helbestên Serguşeştaya Seyda, Seydayê Min û Dil Birîn (14-16): Ev her sê helbest Mela Ebdulmecîd li ser jiyana Mela Husêne Doskî nivîsîne. Jiyana Mela Husên bi helbestan divehîne. Helbesta “Serguşeştaya Seyda” sih û du, helbesta

“Seydayê min” neh û helbesta “Dil Birîn” jî ji dazdeh çarînan pêk hatîne. Mijara her sê helbestan jî jiyana Mela Husên e. Mela Husênê Doskî seydayê nivîskarî ye. Nivîskarî li ber destê wî ders xwandîne. Piştî mirina wî van helbestan li ser wî dinivîse.

Rojek ji rojê Xudayî
Li gundê me yê nav çiyayî
Di bera hizar û nehşedê
Berê xwe bide wê hikmetê

Xuda çawa bikete teqdîr
Kes neşê biketin teğyîr
Zarokek çaw li dunyayê vekir
Ew binavê Huseynî nav kir

(GEG.14/1-2)

Ew gundê nivîskar di van çarînan de behs jê dike gundê Gulordê ye, di kevîte herêma doskiyan li navçeya Geverê. Bi bajarê Culemêrgê ve yê giradayî ye. Ew zarok jî Mela Husên (1898/1994) e. Bi navê Hesen jî birayek wî hebûye. Babê wan diçe ber dilovaniya Xwedê û ew dimînin êtîm. Wextê herba Cihanê ya êkemîn seferberî çêdibe û ew koçber dibine başûr. Mela Husên li medresên Musilê dest bi xwandinê dike. Piştî hingê dizivirin gundê xwe û paşê diçe nik mela Mecîdê Dêlezî xwandina xwe dewam dike. Piştî hingê ew diçin Îranê û li wêrê niştecih dibin. Mela Mecîdê dirî kiça xwe gulşahê li Mela Husên mahr dike. Mela Husên 1954an de dizivire welatê xwe û heta diçe ber dilovaniya xwedê li Geverê niştecih dibe⁷⁹. Mela Husên nêzikî sed sala ‘umrî diborîne. Nivîskar di van helbestan de agahdariyê dide ku Mela Husên bi tenê ne mirovek alimê dîni bû, her wesa ew mirovek siyasetmedar û di derheqê ‘ilmê astronomî, coğrafya, jeoloji, endazyarî û felsefê de jî xwedan zanîn bû. Dîsa wî zimanê Erebî, Farisî, Kurdî û Tirkî jî dizanîn.

Helbesta Seydayê Mela Ehmed (17): Ev helbest li ser Mela Ehmedê Gulordî Hatiye nivîsîn û dazdeh çarîn in. Nivîskar bi siwalekê bidest helbesta xwe dike. “Were dinya tu çawanî? Piştî vê siwalê cewaba xwe husa dide. Dinya ji bo kesê nabe dost, vê dinyayê her kes di nav xwe de winda kir. Mirov bi hez kirina xwe naête vê dinyayê, ‘umrê xwe destnîşan nakin, ka dê çend sala bimîne vê dinyayê û her wesa hez kirina xwe dest ji vê dinyayê naberde. Ev e sireka wesayê kesek çî jê nizan e. Ji ber hindê nivîskar dibêje: “Were dinya tu çawayî”, nivîskar nîşa dide heke mirovek

⁷⁹ Kerem Engin, “Jiyana Mela Husênê”, *Zap Havzası Uleması Sempozyumu*, Hakkari Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2018, r. 851-853.

sed salan jî li dinyayê ‘umrî biborîne dinya ji wî mirovî re nabe heval. Çi kes hezar salan di vê dinyayê ‘umrî naborîne. Li vêrê mubalexe heye. Heke mirovek hezar salan ‘umrî biborîne jî dûmahiyê dîsa dê bimire. Dinyayê şêx, alim û herkesek di nav toza xwe de winda kirine. Yek ji van ‘aliman jî Mela Ehmedê Gulordî ye. Nivîskar Mela Ehmed wek stêrka Gulordê dibîne. Çawa stêrk di nav esmanî de xwe nîşa dide û cihê wê ye diyare. Mela Ehmed jî di herêmê de wesa mirovek berniyas bûye. Mirina Mela Ehmed nivîskar êxistiye di nav kovanan de. Dîsa nivîskar di vê helbestê de Mela Ehmed di nav civakê de mirovek xwedan teqwa, nandeh, xwedan feraset, belaxet, edalet û welî dibîne.

Were dunya tu çawanî
Nabî ye dost di gel kesê da
Bezîr dikî bi penhanî
Kes ne hêla di wê dinê da (GEG.17/1)

Helbestên (18-27): Ev helbesta “Were carek tu Leylayî” û heta helbesta “Were bi qameta şeng” deh helbest in. Ev helbest li ser eşqê hatîne nivîsîn. Gelek helbestvanên Kurd di berhemên xwe de cih daye mijara eşqê. Mela Ebdulmecîd jî di vê berhemê de ji 39 helbestan deh li ser eşqê nivîsîne. Ev rêze helbest “Were carek tu Leylayî” 12, “Were dîlber” 12, “Bejna wek selwê” 18, “Yara delal” 17, “Li ser derde eşqê” 12, “Bejna Esmerê” 16, “Min zeryek dît li gundî” 10, “Were çav xezala min” 10, “Çime Gundek” 12 û “Were bi qameta şeng” 23 çarîn in. Hejmara van rêze helbestên eşqê 142 çarîn in. Eve jî diyar dike mijarên vê berhemê çar pişkan yek li ser eşqê ye.

Were carek tu Leylayê
Bigerîn em pêkve li dinyayê
Min daxwaze te bibinim
Li te binêrim li ber serayê (GEG.18/1)

Di edebiyata klasîk de eşqê cihek girînk girtiye. Eşq peyvek Erebbî ye, ji koka eşqê hatiye darijtin, navê giyayê daralînkê jî ji vê derê hatiye, tiştêk tiştêkê di nav xwe de bipêçe, eşq jî eynî wesa ye, Me‘şuk jî viyana xwe di nav derûna xwe de dorpêç dike⁸⁰. Barê ‘eşqê gelek mirov yên sewda ser kirin.

Bi endazî ‘işq nehat serê me
‘Eceb ku bar mezintir bû ji kerê me⁸¹

⁸⁰ Mahmud Erol Kılıç, *Sufî ve Şiir*, Sufî Kitap, İstanbul 2017. r.163.

⁸¹ Tehsîn İbrahîm Doskî, *Çarînen Celaleddîne Rûmî*, Spîrêz, Duhok 2016, r. 58.

Di edebiyata klasîk de eşqa Leyla û Mecnûn gelek meşhur e. Leyla û Mecnûn ji bo gelek aşiqan yê bûne sembola eşqê. Dîsa li vê derê nivîskar bi navê Leylayê gazî me‘şûqa xwe dike. Daxwaza aşiqî ew e ku li ber serayê bi dilekê kul û birin bi dîtina yarê xwema dilê xwe birevîne. Heke yar sebra dilê wî bîne û dilê xêrê hebe divê dilê aşiqî wergire û wî keyfxweş bike. Evê çendê ji çina mizgeft û dêrê bi xêrtir dibîne. Aşiq ji rebbê xwe dixwaze li deştê bigehe yara xwe. Eve deşta Geverê ye. Çawa yarê bi evîna xwe bandor li ser dilê nivîskarî kiriye, her wesa deşta Geverê jî bi erdnigarî û xwezaya xwe ve bandor li ser wî kiriye. Buyê cihê hinde ku aşiq yara xwe li wêrê bibine. Aşiq dîtina yarê bes carekê bi xeml û şemla wê ve dixwaze. Nivîskar xemla yarê teswîr dike. Yarê bisk berdane ser rûyan. Rewşa yarê aşiq yê ebter kirî û yê kiriye êxsîrê xwe. Bi vê rewşê yarê aqilê aşiqî yê li serî birî û yê sewda ser kirî. Aşiq dixwaze ku yarê bibine, belê nagehe miraza dîtina yarê. Bi ah û fixan dibêje: “Ma bes nîne te ey zalim” her wesa “Naçî serî bi wî rengî, dilbendî heta kengî” dawiya helbesta “Were carek tu Leylayî” de mexlesa nivîskarî carek din “Gulordî” derbas dibe.

Ah û fîğan dikem zarî
 Ji çavêt min xwîn dibarî
 Nehatiye rehmê digel min
 Îdar nabît bi wî karî

(GEG.18/11)

Helbesta “Were dîlber” jî ji rêze helbestên li ser eşqê hatiye nivîsîn. “Were Dîlber bi bejba şirîn” divê rêzka ewil de nivîskar bejna yarê diwekîne dara şekirê/qamişi. Daxwaza wî ev e ku lawîniya dîlberê bibine û eşqa wê di dîwana aşiqan de binivîse. Nivîsîna eşqa yarê di dîwana aşiqan de eve ku neêt jibirkirin. Wek aşiqên meşhur eşqa wî û yara wî jî nemir bibe. Ji bo dîtina yarê her gavekê xwe wek dînan dibîne. Hez dike yara wî bi zulf û xalan ve xwe nîşa wî bide. Xal tê wateya nuqteyên reş li ser rûyê yarê de. Zulf jî bi wateya biskan e. Bisk jî ew mûn e ewên yar ji pirça xwe li ser cênîka xwe de diberde xwarê û berbiskan têxîte ber. Aşiq hez dike yara wî bi vê xeml û cemalê xwe nîşa aşiqî bide. Nivîskar aşiqî wek Mecnûnî yarê jî wek Leylayê dibîne. “Obe obe digerinim” obe tê wateya zomê. Zome cihê havingeya koçeran e. Çawa Mecnûn ji bo dîtina Leylayê dikeve çolê, li vêrê jî aşiq zom û cih û waran digere da yarê bibîne. Aşiq dixwaze ku dilê yarê hişyarbe, rehm bikeve dilê wê û nûra Xwedê îxhar bibe. Nivîskarî divê helbestê de ev têgehestina tesewûfê înaye ziman.

Dilê te carek hişyar bît
Nûra Xuda lê îzhar bît
Belkê di gel min qerar bît
Cefayê nebinim ji destê te

(GEG.19/7)

Da ku aşiq ji cefayê xilas bibe, aşiq sond dixwe bo yarê, heke yar lê bête rehmê û wefayê nîşa wî bide aşiq dê serê xwe di rêka wê de gorî bike. Nivîskarî rûyê yarê wekandiye perî û horiyan. Disa rûyê yarê diwekîne gula sor û heyva geş.

Kome helbestên li ser eşqê hatine nivîsîn yek ji wan helbesta jî “Bejna wek selwê” ye. Nivîskar destpêka vê helbestê de bejna yarê diwekîne dara selwê. Dara ku di nav baxî de diheje çawa berçav e, bejna yarê wesa xwe diyar dike li ber çavê aşiqî. Di çarîna duyan de terkîba “Çeşmêt eswed ‘uyûn” derbas dibe. Mebesta wî bi çavên yarê yên reş in. Her demekê yar bi çavên reş stêrka xwe li aşiqî digire. Destê wê li ser kêrê ye û wî birîndar biket. Disa yarê tîra xwe li cerg û mêlakên aşiqî da û hêla di nav xwûnê de. Nivîskar xemla yarê û rewşa yarê li ber çavên xwandekarî zindî dike. Wek Wênekarekê wêneyê rewşa aşiq û me‘şûkê dikêşe. Yar çavên xwe kil dike, keziyên reş berdide, wek ejderhayekê jehra xwe diavêje.

Ew derba te li min dayî
Ew çavêt reş te kildayî
Ew reş kezî te berdayî
Bûne ejderha bi min ve da

(GEG.20/4)

Keziyên reş maran simbolize dikin. Keziyên reş wek maran bi aşiqî vedidîn û yar bi mûyên biskên xwe ve aşiqî girê did û xalên rûyê xwe ve aşiqî diêxe. Nivîskar singê yarê diwekîne baxî, dîsa singê yarê diwekîne sêvan. Li vê derê teşbih heye. Ew bedena yarê xwedan kirî, ew pirça wê berdayî ser bedenê û biskên wê badayîn li ser rû û rewneq dibin. Xemla yarê bo me teswîr dike û tîne berçavê me. Di vê helbestê de nivîskar dîsa yarê diwekîne heyva çarde şevî. Heyva çarde şevî çawa şeva tarî rohn dike, her wesa eşqa yarê dilê aşiqî rohn dike û aşiq xwe di rûyê yarê de dibîne.

Ew sûretê rewneq dayî
Wekî heyva li çardayî
Qelbê tarî diket rûnahî
Min xwe dît di rûyê teda

(GEG.19/8)

Çavên birû li ser, difna xezem êxistiyê, enya spî û geş, xalên wek filfilê dilê aşiqî disoje. Nivîskar dîsa lawîniya yarê bi didanên wek dur û sedefan, lêvên tenik, bi reşandina misk û enberê li ser bedenê û xenakirina desten nazik, rûyê geş û şirîn, tiliyên mirarî ve teswîr dike. Nivîskar dibejê yarê hindî ez behsa lawîniya te bikim

dîsa kê m e, ez cemala te neşem xilas bikim. Hindî min behsa te kirî têra zikata lawîniya te nakin. Zêhna min ya beşerî têra wê çendê kir hindî min şiyayî.

Di helbesta “Yara delal” de nivîskar dixwaz e ku li gel yarê muhebbetê bike, evîn û xem û jiyane pêkve parve bikin. Ku yar bi xemla xwe ve bêt û mizgîniyê bide wî. Dixwaze hatina yarê wek sersal û roja newrozê pîroz bike. Vê hatin û dîtine wek şeva beratê dibîne. Şeva beratê şevê pîroz û bi qîmet e. Heke yar şeva beratê bêt wê gavê daxwaza aşîqî tê qebûlkin û gunehên wî tîne ‘efikirin.

Hatina te pîroz bikeyn
Serşal û nevrozan bikeyn
De‘wetiyane qebûl bikeyn
Bi mêhvanî di şevberatî

(GEG.21/5)

Heke aşîq geheşte mebesta xwe eve bo wî ji dinyaya ebedî xweştir e. Mebest bi “Ava heyatê” jiyana axretê ye. Wesa diyar e aşîq ji bo evîna yarê xwe diavête agirî. Dibe jê yarê dîtina te bo min ji çîna beheştê xweştir e. Beheşt û horiyane qurbanî yarê dike. Aşîq dixwaze ku ji yarê dûr nekeve. Ji firqeta yarê dilsoj e. Belê yar dîsa naza dike. Dîsa di çarîna dawîya vê helbestê de mexlesa nivîskarî “Ebdullah” derbas dibe.

Di helbesta “Li ser dêrde eşqê” nivîskar daxwaza dîtina yarê tîne zîmanî. Lê yar li gel aşîqî fel û findan têt. Gotinên xweş têt, belê di destê yarê de jehr heye.

Helbesta Hat Newroz Bihare (28): Ev helbest dazdeh çarîne in. Nivîskar bi hatina newrozê ve biharê teswîr dike û tîne berçav. Taviyên biharê ve li nizarane cemed sist dibe û teyr û tiwal diyar dibe. Bi hatina newrozê ve heywane û giya carek din zindî dibin û divej in. Tebî‘etê de jiyane carek din destpê dike. Sermahiya zivistanê diçe û germahiya biharê di nav gerdûnê de belav dibe û di nav riha heyberane de xwe nîşa dide. Tebî‘et bereketa xwe di nav hundûrê xwe de dertêxe û teyr û tiwal hêlîna zêdebûnê carek din ava dikin. Nivîskar newrozê wek sembola jiyaneke nû teswîr dike.

Hatî nevroz ku bihar e
Teyr û tiwal bûn diyar e
Cemed şist bû li nizar e
Ji ber çavê di baranê

(GEG.28/1)

Bi hatina biharê ve rûyê erdî bi sosin û rihane û alalane ve heşîne dibe û xeml û koka xwe nîşa dide. Ev xemla biharê keyfxweşiyekê li ser jin û ciwane û pîr û kalane çêdike. Ev xemla biharê ketiye di nav gerdûnê de her wesa di derûnê însanane de jî

xemla xwe ava dike. Hatina newrozê tevîhevûna tebî'et û însanan simbolize dike. Dîsa bi hatina biharê ve bilbil bi awazê xwe ve dixwûnin, şivan pezî diçerînin, cutyar çandiniyê dikin. Nivîskar vê bizava jiyanê ketiye di nav heyberan de teswîr dike. Çarînan dehan de dema meha nîsanê diborê pezî diben ber biharê, piştî hingê wextê zozanê destpê dike. Li ber mêrg û giran hindêk çadîran û hindêk jî konan divedin. Di çarîna yazdan de peyva reşmalê têt wateya konê reş. Konî ji mûyên bizinan çêdikin. Di çarîna dawiyê de hesreta 'umrê berê û jiyana rabirdûyê dike.

Pez hate dani bêrî di nav da
 Ji yan xweş edi gel wan da
 Mirov ji keyfa di bîte sewda
 Xwezya 'umrê wî zemanî

(GEG.28/12)

Helbesta Deşta Gever (29): Ev helbest ji hejdeh çarînan pêk hatiye. Mebesta nivîskarî bi vê deştê, deşta Geverê ye. “Parçeyek ji baxê beheştê” deşta Geverê wekandiyê baxê beheştê. Li vê derê teşbîh heye. Di çarîna sêyan de cihê deşta Geverê destnîşan dike. Li rojhelatî Şemîzdînan heye. Şemîzdînan navçeyek bajarê Culemêrgê ye. Li rojava Şakîtan, eve jî gundekê Geverê yê. Li rexê qiblê herêma Doskiyan, bakûrê deştê jî ‘eşîra Dirîyan û Îran. Di çarîna pêncan de behsa bajarê kengê dike.

Berê xwe bide vê deştê
 Rast e wekû nava xanî
 Parçeke ji bağê beheştê
 Xuda daye vê cîhanê

(GEG.29/1)

Kengê navekê Geverê yê dîrokî ye. Dikevîte navbira gundê Qadyan û Xîrwate. Îro jî şûnwarên vî bajarî diyar in.⁸² Poş û peşeng jî dîsa navekê deşta Geverê ye. Li gor gotinên mezinan ev navê Rûstemê Zal yê danaye ser Geverê. Rûstemê Zal deşta Geverê bo xwe dikire hevîngeh. Nivîskar bala me dide hindê ku deşta Geverê bi xemla xwe ve bi avên şîrîn û zelal ve û bi teyr û tuwalên xwe ve xweşiyekê dide ehlê Geverê. Dawiya vê helbestê de nivîskar bêriya rabirdû dike. Belê hêdî ew pîr bûye û xanî bô wî bûye qefes. Neşêk wek berê biçê deştê. Sûsyana jî gundek Doskiyan e. Ciwaniya nivîskarî li vî gundî borî ye. Di keve bin çiya rexê başûrê Geverê. Ji ber hindê nivîskarî gotiye xwe “Xerîbê Sûsyana”.

⁸² Mecit İliş, *Dîdar* (Gulan, 2018), Gever/Culemêrg.

Şivanî li te bûye hewes
Tu pîr bûy êdî te bes
Xanî li te bû qefes
Tu ey gerîbê sûsyanê

(GEG.29/18)

Helbesta Li Ser Kirinên Însanên Vî Zemanî (30): Ev helbest bîst û çar çarîn in. Mela Ebdulmecîd ev helbest li ser kiryarên însanê vî zemanî nivîsiye. Nivîskar rastiya civaka îro û ew rewşa muslîman ketîne di nav de bo me berçav dike. Di çarîna ewil de bala me dikêşe ser însanên vî zemanî, ku ew ketine di nav xefletê de. Çarîna duyê de dinya wekandîye milkî û însan jî wekandîne cutyaran. Cutyarek çawa zeviya xwe dikêle û tovî lê diçîne, her wesa însanên vî zemanî jî bi kiryarên xwe ve tovê xirabiyê di avêjin û belav dikin. Xirabiyên diwekîne towî. Demsalek lazime bo towî ku şîn bibe û bigehe wextê hasilatê. Xirabî jî wesa ne. Însan îro xirabiyekê bike tesîra wê xirabiyê pêşe rojê derdikeve meydanê. Dahatûyê de nifşên nû ji wê xirabiyê para xwe werdigirin.

Muslîmanî ewan hêla
Mulkê dinê bi geflet kêla
Tovê cuhlê çand û hêla
Bera xwe da bo meyxwanê

(GEG.30/2)

Dînê îslamê emr û ferman li însanî kiriye ku kiryarên qenc bike û jiyaneke aram bi dest xwe bêxê. Belê însanên vî zemanî van emran bi kar naîne û ew ketine di nav xefletê de. Navê wan muslîman e belê kiryar yê wan muslîmana nînin. Nivîskar vê rewşa muslîmanên îro tîne berçav. Mela Ebdulmecîd mirovek seydaye. Felsefa jiyana xwe jî di vê helbestê de nîşa dide. Ew jî ew e ku însanên vî zemanî yê wan dîr îbadetî ketînin. Direwkirin, sondxwarin û şerm nekirin yê wan bûne fêl û saloxetên wan. Ew însanên xwe muslîman qebûl dikin, bi serê ezmanî şehde didin û dibêjin şertî dilê miroviye. Ev kese melayan paşvexwaz û kevnepereşt dibinin, dibêjin em mirovên şermende û şarazane. Li nik van kesan vexwarina wîskê tiştêk pêşve çiyî ye. Qebir naête bîra wan, ji ber van egeran nivîskar îmana van kesan ze'if dibîne. Nivîskar wesa nîşa me dide ku însanên îro teybetmendiyên însaniyê yê wan helan û ketine di nav jiyaneke bê wate. Şehwetperestiyê ew yê wan gehandîne dereca heywanetî. Çinkî şehwetperesî saloxetek heywanan e. Civaka nivîskar di nav de ya çawa ye? Di vê şî 'rê de wêneyê rewşa vî civakê nîşa me dide. Ev însanên dibêjin em mirovên şarmend in, ew kes bixwe kirin û gotinên xwe ve gelek zerêrê didin civakê. Yê wan ketine di nav xefletê de, belê hay ji halê xwe û qusîrên xwe nînin.

Musilmanî ewan hêla
Ji pîran heta cahêla
Dest havetne hemî fila
Şehwet perest û heywanî

(GEG.30/18)

Bi nezanî ûmir wê borî
Tu nezanek çend bi quşûrî
Hîvî bike tu ji gefûrî
Gerîb tu bi xwe nezanî

(GEG.30/24)

Helbesta Ey Dil (31): Ev helbeste ji dazdeh çarîn in. Sal çar demsal in. Bihar, havîn, payîz û zivistan. Nivîskarî ‘umrê însanî wekandiyê wextên salê. Zarokiyê, ciwanîyê, navsaliyê û pîratîyê wek demsalan dibîne. Em ji çarîna ewil tê digehin ku nivîskarî ev helbest di ‘umrê xwe yê pîratîyê de nivîsî ye. Ji ber ku dibêje:

Nîza çi dixwazî ey dil
Di vê feşla zivistanê
Tu ne bûyî ‘endelî bû bilbil
Bi geryî li bağ û bustani

(GEG.31/1)

Min nema çi bax û bûstan. Yanî bihara ‘umrê min borî û havîn serda çi. Wext nema ku ez biçim waran çadira lê vedem û li seyrangehan keyfê bikim. Divê qunaxa ‘umrî de peşêmanî fayde nake, mirov dimîne hîviya mirinê, qunaxa piştî vî demî goristane û ‘emelêt qenc û baş wek bax û bostana dibîne. Nivîskar dawîya ‘umrê xwe de gazî Xwedê dike û hîviyê ji wî dixwaz e. Pîrîtiyê diwekîne belayekê di ser mirov de tê, qûweta mirov diçe û neşet li gel Xwedayê xwe hemhal bibe. Pîrîtiyê wek derdekê bê derman dibîne û tîne zimanî. Pîratî di awayê psikoljîk de bêhêzî û ze‘îfiya bedena mirovî ye. Wî wextê ‘umrî de eql û dîtin û bihîztîna mirovî kêr dibe. Di vê helbestê de nivîskarî kêmasiyên vî wextê ‘umrî yên înanê zimanî.

Pîrî derdek bê derman e
Qîmeta weqtî bîzan e
Gotina nebî weşan e
Zeman borî bi ziyânî

(GEG.31/11)

Helbesta Çime Gulorda Rengîn (32): Ev helbest jî ji şazdeh çarînan pêk hatiye. Nivîskar di vê helbestê de rewşa gundê Gulordê bo me tîne berçav. Di herdu çarînen ewil de rewş û hejmarên taxên gundî û tuxwîbên gundî tîne zimanî. Çarîna sê û çaran de jî gundê Gulordê wek cihêkê seyrangehekê dibîne. Dîsa behsa avên tezi, baxên fêqî, merg û kanî, rez û gûz û hirmiyên vî gundî dike. Di vê helbestê de nivîskar me agahdar diek ku niha çi kes li vî gundî niştecih nîne û gund maye

bêxwedan. Ji ber ku eve cihê bab û bapîran e vî gundî bandorek zêde êxistiye ser nivîskarî. Nivîskar vî gundî ji her cihekê dinyayê xweştir dibîne.

Cihê bab û bapîran bû
Bê xudan wêt hêlayîn e
Mekanek wekî wî erdî
Li dinyayê çî nîne (GEG.32/6)

Dîsa di çarîna heft û heştan de hejmara kanî û zozanên vî gundî tîne zimanî. Diyar e ku ehlê vî gundî heyva gulanê diçin zozanan. Peyva reşmal bi wateya konê reş e. Rewşa zozaniyan û jiyana koçberiyê berçav dike. Di çarîna nehan de rêzka dawiyê de “Li nizarî girt palîne” peyva palîne tê wateya; piştî danê siharê bêriyan pez didot, nava rojê şivanan pez dibire çerandinê. Vî wextî germê jî xwe diyar dikir. Dibêjine vî wextê rojê palîn. Şa‘ir bi hestiyarî jiyana gundewariyê teswîr dike. Dîsa nivîskar şolkirina palan û rewşa şivaniyê û bêrevaniyê tîne zimanî. Aliyêkê gaziya şivanan, aliyêkê qebe qebe kewan, aliyêkê bêhna beybûn û alalam xema dilê birîndaran direvîne.

Şivanan pez da danî
Tijî navda bêrî ne
Barbara berx û karan
Dilê mirova dihelîne

Ji gaz gaza şivanan
Kewê li palê dixwûne
Bêhna sosin û alalan
Dil tengiyê dibirîne (GEG.32/13-14)

Dawiya vê helbestê de nivîskar dixwaze ku mirov biçin vî gundî bibinin. Bi tenê behskirinê ve ne, bila însan biçe bi çavê xwe vî gundî bibînin. Dîsa di çarîna dawiyê de mexlesa nivîskarî derbas dibe. Ew jî “Ebdullah” e.

Helbesta Musa û Xudanê Heywanan (33): Ev helbest heftê û sê çarîn in. Di Guldestê de helbesta dirêjtir ev helbeste ye. Mijara vê helbestê serpêhatiya mirovekê ye. Ev mirove di zemanê Hz. Musa Pêxember (s.x.l.) jiyaye. Ev serpêhatiya nivîskar di vê helbestê de tîne zimanî kurtasiya wê husaye. Mirovekî zengîn tete nik Hz. Musa (s.x.l.) û hîviyê jê dike da ku Hz. Musa ji bo wî du‘a bike û da ew zimanê heywanetî bizane û da ew siren heywanan xebardar bibe. Hz. Musa (s.x.l.) jî dibêje wî tu evê tiştê nexwaze. Çinkî ji bo te çî kar divê daxwazê de nîne. Piştî demekê carek din dîsa ew mirov tete nik Hz. Musa (s.x.l.) û heman tiştê jê dixwaze. Hz. Musa eynî gotinê dibêjê wî. Dîsa ew mirov piştî demekê cara sê tete nik Hz. Musa

(s.x.l.). Hz. Musa vê carê ji bo wî hîviyê ji Xwedê dike û du'ayê dixwaze da ku ew mirov zimanê heywanetî bizane.

Du'ayekê ji xudayê mezin
Hikmetekê bidete min
Bizanim ji ezmanê heywanatî
Ji teyran heta wehşiyatî (GEG.33/6)

Li gor agahiyên nivîskarî ev mirove kesekî zengîn û xwedan xulam û xidam bûye. Belê mirovek hesûd bûye. Xwe gelek zana hesab dikir. Carekê xidama wî patê sifrê didaqute, seyê wî û dîkilê wî hatin çiniyên nanî xwarin. Nivîskar vê suhbata di navbira se û dîkilî de derbas bûyî neqil dike. Dîkil dibêje seyî çiniyên nanî têra min û te nakin, îro wextê êvarê hespê xwedanê me dê bimire û tu dê têr jê bixwey. Dema ev diyaloxê di navbira dîkil û seyî de diçe xwedan dibihîze. Ew radibe hespê xwe dibe sûkê û difiroşe. Paşê ew gelek bo firotina hespê xwe xwemgîn dibe û ew dikeve nav hizran ka dê subê çî biqewime. Roja paştir carek din xidam patê sifrê didaqute. Dîkil û se hatine ser sifrê da çiniyên nanî bixwûn. Seyî gote dîkjili tu direwînî, te duhî ez xapandim. Dîkilî gotê ez direwan nakim û li te xaîn nabim. Xwedanê me hêstirek heye, îro danê nivro dê bimire, tu hingê zikê xwe têr bike û tûla xwe ya duhî ji wî veke. Xwedanî dîsa hêstira xwe bire sûkê û firot. Careka din bi firotina hêstira xwe gelek xem ket û kerbên wî gelek vebûn. Mêrik roja sê rûnişt ka dê carek din çî bi serê wî êt. Xidamê carek din patê sifrê hejand û daquta. Dîkil hate ser çiniyan. Kerbên se gelek vebûn û çavên wî xwîn hatê. Gote dîkilî eve sê roje te ez birsî hêlam, ez dê îro serê te jêbikem. Dîkilî gote se sebrê bike, ez bi tewratê sond dixwûm, we nîne wekî tu dizanî. Îro dê gayê xwedanê me bimire. Xwedanî carek din guh li vê suhbetê bû, rabû çî ga jî bire sûkê û firot. Dîsa ew gelek kete di xema gaye xwe û aciz bû. Se jî carek din wekî hemî caran ma birsî.

Zor birsî ye çav nihêr
Wekî pilingê ketiye şikêr
Şev çî û subê zûye
Se çav nihêre û birsiye (GEG.33/48)

Xidamê carek din patê sifre hejand û dîkil çî ser çiniyên nanî. Se êriş da ser dîkilî. Dîkil çî ser çiqê darê. Seyî gote dîkilî me baweriya xwe bi te îna. Tu bangî bo xelkê didey, xelk îbadetî li ber dengê te dikin û wextê nivêja bi te dizan in. Dîkilî carek din gote seyî tu guhdariya min bike, îro dora mirinê ya xwedanê me ye. Dema ew mir em dê keyfê bikin têr bixwûn. Dema xwedan behsa mirina xwe dibihîze

radibe û diçe nik Hz. Musa. Dibêjê: Tu bo min çarekê peyda bike û min ji vê belayê xilas bike. Hz. Musa (s.x.l.) gote wî tu netirse tu dê rojekê her bimirî. Ew kesê hez bike bibe arif û siran bizane ew ji mirinê natirse û nakeve xema canê xwe.

Nivîskar di vê helbestê de bo me destnîşan dike ku herkesekê qederek heye. Divê ew bi qedera xwe razîbe. Çi kesê hatiye dinyayê divê xêr û şeran razîbe. Evrazî û jêjilahiye jiyanê xwe baş bizane. Divê ew kes rizqê xwe razîbe, baweriyê bi qedere bîne û bi xeberê pêxemberê xwe bike. Dîsa nivîskar bo me aşkere dike heke însanan roja mirina xwe zanîba da destan ji jiyane berden û şev û roj da kevine di nav xemê de. Belê Xwedê te'ala ev sire bo kesê negotî ye û nîşa kesê nedaye. Heke mirov tiştê zêde xwast û dest êxist, vêca Xwedê ew tişt da mirovî. Belkê mirov neşet hesaba wan tiştan bike û 'eybên mirov derkevin û mirov şermizar bibe. Di vê helbesta nivîskarî de ev heqîqete bo me berçav dibe. Hesûdî û tamahiya milk û malî ev mirove kore kir. Xwedê te'ala çî bi qismetê mirov kiriye divê mirov pê razîbe. Heke mirov gelek tişt xwastin ku hesaba wan nedet, her wesa ew tiştên zanîna wan nekefîne berê mirov û mirov hez biket sira wan bizane dê serê mirov tê biçê û dê bibe qurbanê wan tiştan.

Çi kesê hatiye dine ji beşera
Ka dê xêran ket ya şera
Ka guneh pitirin yani xêr
Kanê li ewraze ya li jêr

Tu razî nebûy bi qedere
Lew te hal îna wê derê
Mêrik zivirî yê pişman
Ew bi serê xusû bê eman

(GEG.64-66)

Helbesta Zimanê Dawût Pêxember (34): Ev helbest ji 53 çarînan pêk tê.

Piştî helbesta “Musa û xwedanê Heywanan” di Guldestê de ji aliyê dirêjahiyê ve helbesta duyê eve ye. Nivîskar di zemanê Hz. Dawût (s.x.l.) li bajarê Qudsê serpêhatiya mirovek feqîr û êtîm bo me bi awayekê şa'êrane vedugûhêz e. Nivîskar destpêkê de dibêje: “Da biçîne Quds û Xelîlan” mebesta wî bi terkîba “Quds û Xelîlan” bajarê Qudsê ye. Ev bajare ji bo her sê dînen ‘esmanî cihê pîroz e. Hz. Dawûd (s.x.l.) jî li vî cihê pîroz bo qewmê xwe yê hatiye hinartin. Xulasa vê helbestê husaye.

Li aliyê bajarê Qudsê zarokek bê xwedan bi salan zikrê Xwedê dikir û rizqê helal ji Xwedê dixwast. Rojekê li derê mala xwe yê rûniştî bû, wî dît gayek hate ber

derê wî û xwe dirêjkire ber kêra wî. Ewî wesa bawerkir ku eve rizqeke Xwedê yê bo wî rêkirî. Ewî ev gaye serjê kir. Xwedanê gayî pisyar kir ka gaye wî li kîrê ye. Mirovekê cihê ga çiyê nîşa wî dide. Ewî xwe ji wî feqîrî caiz kir û ew bire nik Hz. Dawûd Pêxember (s.x.l.). Dawûd pêxember gote wî feqîrî tu mirovek camer bûyî, te bo çî ev şola xirab kiriye.

Nebî Dawûd jê pirsî û gotê
 Tu genceki ciwan û xortî
 Te 'îbadet dikir ji Xuda ra
 Bo çî te bera xwe jê wergêra (GEG.34/12)

Feqiri gote Dawûd Pêxember (s.x.l.) ga bi xwe yê hatiye ber derê min. Qene'eta min wesa hat ku ev gaye yê bom in helal e. Çinkî ew bi xwe raza bin kêra min. Hz. Dawûd (s.x.l.) qerara xwe da paş û gotê xwe bigrin heta subê ez dê di navbira we de hukmî bidem. Roja paştir merkî ew feqîr rakêşa û îna nik Pêxemberî û gotê eve min dizê xwe îna. Pêxemberî gotê: Tu bi xeberê min bike, tu feqîrî aza bike, eve bo te çêtire. Mêrkî qebûl nekir û gotê: Ez heqê xwe dixwaz im. Dîsa roja paştir xelk kom bû, Hz. Dawûd (s.x.l.) gote mêrkî te hukmê duhî qebûle an ne? Mêrkî got eve çî hukme? Ez qebûl nakim. Hz. Dawûd gotê eve hukmê Xweda ye, bo te husa çêtir e. Her wesa gote cema'etê hûn meselê nizanin. Xwedanê gayî mirovek gunehkare. Ya baş eve ku ew vî hukmî qebûl bike.

Go hukmê min yê Xuda ye
 Çî car heqyê nabî cudaye
 Ewa min gotî bo te çêtir e
 Bo dûmahiya te bi xêrtir e (GEG.34/22)

Mîletî got bila ev mesele xilas bibe û herkes heqê xwe wergire. Hz. Dawûd (s.x.l.) got bila ev mêrkê niveka malê xwe bide feqîrî. Mêrkî ev hukmê qebûl nekir. Hz. Dawûd gotê heke tu qebûl nekî qatek din dê bête ser. Ev qirare di nav mîletî de belav bû û gazinde ji Hz. Dawûd hatine kirin. Hz. Dawûd gotê mîletî hesaba min û hewe jêk cuda ye. Ew qerara min dayî wehyê xwedê ye. Dîsa carek din roja paştir mîlet kom bû, Hz. Dawûd (s.x.l.) gote mêrkî te qirara duhî qebûl e an ne? Heke tu qebûl nekî qatek din dê bête ser, mîletî got eve yê bûye hevalê diza.

Ew yê bûye hevalê diza
 Mali ji me distînît bê riza
 Roja dî bi kerb û kîn hatin
 Bi birin û dil şewat in (GEG.34/31)

Roja paştir dîsa gotine Pêxemberî te çî qerar daye. Hz. Dawût (s.x.l.) gotê bila mêrik malê xwe hemiyê bidete feqîrî. Mêrkî kir hewar û gazî, mîlet kom bû. Gotine Hz. Dawût em baweriyê bi wî hukmê te nainîn. Te şerî'etê Xwedê guhartiye. Hz. Dawût dîsa gotê hûn hikmeta vê şolê nizan in. Hûn heta subê xwe bigirin. Wextê hûn têgeheştin hûn dê heqîqetê bizanin. Her wesa roja paştir ew li binê darekê kom bûn. Hz. Dawût cihek nîşa da û gotê vê derê bikolin. Ew der kolan û cesedek ji wê derê derêxistin. Xwedanê gayî kire qêrî. Berê xwe danê kêreka xwûn li ser paxila mêrkî de dîtin û navê mêrkî li ser kêrê yê nivîsiye. Miletî gote Hz. Dawût pêxemberî (s.x.l.) tu Pêxemberekê karbidestî, bo me bêje heqîqeta vê şolê. Hz. Dawût gote wan eve cesedê babê feqîrî ye. Ew mirovek gelek zengîn bû. Xwedanê gayî jî xulamê wî bû. Ewî babê feqîrî quşt û li bin vê darê veşart û dest dana ser malê wî. Feqîr zarokek biçik bû, babê wî hêla bû nik xidamê. Mêrik çavgirî dizivire mal û dibêje: Efendiyê me wefat kir. Mêrik xidamê jî nikâh dike. Kurik mezin dibe û mirovek camêr jê derdikeve. Xwedê du'a wî qebûl dike û malê wî yê helal bo wî rêdike.

Kurik bi mal û mulkî xweş bû
 Millet ji wê derkê belav bû
 Gelek ji heq û huqûqê beşerî
 Namînî ew bo meşerê (GEG.34/52)

Hz. Dawût (s.x.l.) hukim dike ku wî mirovî bikujin. Qisasî bi cih tînin. Wî mirovî li wêrê diveşêrin. Mal û serwet, xulam û xidam bo feqîrî dimînin. Nivîskar di vê helbestê de bo me berçav dike, heqê kesê bo kesê namîne. Ew kesê xeletiyê bike dê rojekê xeletiyê jî bibîne. Dîsa di çarîna dawîya helbestê de nivîskar aşkere dike ku Xwedê cezayê neheqan nahêle. Da însan îbretan bo xwe jê wergire, da li ser wan bûyerên diqewimin baş tefekûrê bikin û xwe ji xirabî û xeletiyên bidin paş.

Xuda li dinyayê bi cih tînî
 Da însan 'îbretan jê bibînî
 Da bifikrin nezerken baş
 Da xwe ji xirabiyê bidene paş (GEG.34/53)

Helbesta Ji dinyayê Geman (35): Ev helbest ji hejdeh çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê demboriya dinyayê ye. Nivîskar di vê helbestê de bo me berçav dike ku mirov di vê dinyayê de xeman neke, bizane kî hatibe vê dinyayê yê çûyî. Ev kesên hatîne vê dinyayê yê nezan be, an jî zana û pêxember jî be. Ev dinyayê ji bo kesê nabe cihekê baqî.

Çi cahêl bît yan xendî
Çend zana bît wek pur fendî
Kes namînî li ser vî erdî
Dê biçîtin ew bê guman (GEG.35/2)

Helbesta Payîz e (36): Ev helbest ji pênc çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê payîz e. Nivîskar demsala payizê teswîr dike. Dema payîz tê xeml û koka tebîetê winda dibe.

Payîz e daran belg werandin
Rûhan hişk bûn gulên per rûxandin
Nemaye bêhna sûsina zer
Wê ji ber befrê ser nuxandin (GEG.36/1)

Helbesta Borîn Şal û Zeman (37): Ev helbeste jî ji şeş çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê borîna zemanî ye. Nivîskar kul û derdên di dem û salên borîn de tîne zimanî.

Min ji dil tîn ah û kovan
Li me borîn şal û zeman
Na rehet in em her deman
Rohkê çavan wekî çeman (GEG.37/1)

Helbesta Hewar Rebbê Barî (38): Ev helbeste ji pênc çarînan pêk hatiye. Mijara vê helbestê hewar û gaziye. Wek duayekê ye. Da ku ew rewşa nexweş ciwak di nav de jê xilas bibe. Nivîskar vê rewşê bi awayekê hewar û gazî digehîne Rebbê Barî.

Bûyne bendî di qeydê da
Şeş mehan em di nav befrê da
Em hişk dibin di sirê da
Hevar dikeyn ji Xudê ra (GEG.38/2)

Helbesta Behsê pîrîyê (39): Ev helbeste ji pênc çarîna pêk hatiye. Helbesta Guldestê ya dawiyê ye. Nivîskar rewşa umrê xwe yê dawiyê tîne zimanî. Nivîskar di vê helbestê de li ser nexweşiyên pîratîyê dirawest e.

Dest havête me bi jarî
Dil kuan û bi ewîndarî
Piştî kûr û çavêt tarî
Paşî ‘umrê heftê şalan (GEG.39/3)

Nivîskar di dawîya vê helbestê de ji bo xwe daxwaza fatîhe xwandinê dike.

Li civatan bilorînin
Navê me bi vî wejînin
Fatîhekê bo me bixwînin
‘Umur li me bûye talan (GEG.39/5)

2. LATÎNÎZEKÎRÎNA METNÊ BERHEMAN

1. 1. Mewludûş-Şerîf

Bismillahirehmanirrehim

We bihî neste'în

- 1a 1 Hemdê bêhed bo şehê dunya û dîn
Qadirê rezzaq û rebbûl'alemîn
- 2 Ew şehê lewlake fexrû'l-enbiya
Rûh û canê ewliya û eşfiya
- 3 Hem şelat û hem selam ez rûh û can
Ber Muhemmed an şehê şahib-zeman
- 4 Serwerê alem şehê afaq û dîn
Xatemê pêxemberanî nazenîn
- 5 Her kesê ummet ji bo sultan û dîn
Ez dîl û can ba kemal û ba yeqîn
- 6 Bo Muhemmed Muştefa xeyrû'l-beşer
Der fîğan be daîma ey ba xeber
- 7 Serf bike tu mal û xan û cîsm û can
Ca bibî tu ummeta fexrê cîhan
- 8 Tu bizan ez can û dil ey ba şefa
Qedrê mewlûda Muhemmed Muştefa
- 9 Tu ji hubba vî bide can û ceger
Ku ji bo vê ummetê ey xweş-xeber
- 10 Mewlûda şahê cîhan û milletan
Pur şerîhe rast e bê şubhe bizan
- 11 Herwekî her çarî yaran fermûye
Şêxi Fexreddînê Razî gotiye
- 12 Herwe Me'rûf Kerxî kirye bêguman
Gotiye tu guh bidê bêşik bizan
- 13 Deh hezaran zêrî Mehmûdî tamam
Şerfê xeyran tu bike ey nîkinam

- 14 Mislê xêra nanekî nabî bizan
Şerfê mewlûdê bike ez ruh û can
- 15 Tu bike mewlûda sultanî'l-hûda
Ez dil û can şerf bikem rêka wî da
- 16 Tu dê emîn bî ji derd û hem bela
Hurmeta mewlûda sultanu'l-hûda
- 1b 17 Ger te mal û taqeta dinya hebî
Cûmle malan şerfê mewlûda nebî
- 18 Tu nekey nabî musulman ba yeqîn
Hem şefî'et nabîtin an şahê dîn
- 19 Dîtine⁸³ bêhed keramet ba yeqîn
Guh bidê ey mu'mînê dînê mûbîn
- 20 Da bibêjim yek hikayet ey genî
Da yeqîn key fedlê mewlûda nebî
- 21 Hîvîdar in em ji te ey Muştefa
Ber tu bada es-selam ey Muqteda

Dastana Mu'cîza mewlûda ba Ebdûl-Melikê Şahê Cihan

- 22 Ez bibêjim guh bidê ger mu'mînî
Mu'cîza mewlûda an şahê genî
- 23 Nê hebû weqtî di Şamê yek ciwan
Talibê nêcir û purşad û rewan
- 24 Bû di 'esrê şahê dîn Ebdûl-melik
Tê çinîne reyb û hem tê nîne şik
- 25 Espekê serkeş û pur qîmet hebû
Pûr beza û mişlê wî qet kes nebû
- 26 Rojekê rabû siwar bû ew ciwan
Çûye meydanê dinîva şehrêwan
- 27 Vî bezandî ew reva çû mislê ba
Kûçe kûçe bir ciwanê ba şefa

⁸³ Di metnê de "Dêbitbîne" derbas dibe. Bes wateya vê peyvê ya aşkere nebû, me peyvê "Dîtine" îna cihê wê. (M.D, K.E.)

- 28 Ta derê şahê cîhan Ebdulmelîk
Hem ku rêwî geşti bû wî nîne şîk
- 29 Hem teheyyur ma ciwan ya reb çibû
Ez tenekkur rêveçin lê berze bû
- 30 Vî li kûçê dîti girtin espê vî
Pir xefîf bû tîrsî hem berda girî
- 31 Ez birim ta pêşî şahê xeşminak
Emir fermû ku bikin ew wî helak
- 2a 32 Ser hilîna “ya Muḥemmed Muştefa
Ĝeyrî mewlûda te nîne min pena”
- 33 Şahi dît yek şehsiwarê pir şefa
Qeşîr şeç bû hate der jê ba şefa
- 34 Tê bibûre werne razî nîme ez
Vî hewar kir hatime gayet bi lez
- 35 Hurmeta mewlûda sultanê cihan
Mal û xil’et dad diazakir ciwan
- 36 Hurmeta mewlûdê nîne cumle hem
Pur ezîz e pur letîf û muhterem
- 37 Ey Muḥemmed hîvîdarîn em ji te
Wer nê karê me gunah û zîllete
- 38 Şerhê mewlûdê neşêm bêjim tamam
Hûn biden vêkra şelat û hem selam

Dastana der Xil’et Nura Muḥemmed (ş.a.s)

- 39 Guh biden ey Ummeta fexrê cihan
Nurê Ehmed seyîdê dewr û zeman
- 40 Hêj ne erd û Adem û cin û melek
Hêj ne erş û lewh û kursi û felek
- 41 Muştefa hate wicudê pêşî wan
Bûye babê cûmle alem bêguman
- 42 Heft hizaran salî pêşî bûna cihan
Ew hebû hêj kes nebû bêşik bizan

- 43 Çenkekê nurê ji rûyê xwe Xuda
Girt û gotê tu bibe ew Muştefa
- 44 Emri kir secde bibe ey nûri ma
Secde bir şed sali bê şik jê tewa
- 45 Paşi sed şalan ji vê nûra Xuda
Cewherek çêkir letîf û pir şefa
- 46 Paşi ew cewher kire avek zelal
Mewc bir û sakîn nebû ey xweş xeyal
- 47 Ta hîzar şalani avê mewci da
Paşê hingê xaliqê erd û sema
- 48 Kirne danzde hîşşe rebul'alemîn
Pakû safî kir letîf û hem hezîn
- 2b 49 Qismê ewwel erşi jê çêkir temâm
Qiblegahê cumle xaşanê kiram
- 50 Qismê şanî jê qelem çêkir heman
Qismê şaliş lewhî bê şuphe bizan
- 51 Qismê rabi' doji jê çêkir ewî
Qismê xamis ez dil û can bo hîvî
- 52 Qismê sadis bûye stêr û cumle nam
Qismê sabi' jê Melaîk ha tamam
- 53 Qismê şamin kursîya Şahinşehî
Ez xeyal û şik û şuphe bû tehî
- 54 Qismê tasi' nuri cem'ul-mu'mînîn
Qismê deh cismê Muhemmed ey emîn
- 55 Qismê yazde çêkirin jê asiman
Qismê danzde erd çêkirin tu bizan
- 56 Hem ji vê nûra hebîbê nadiyar
Geyrî zatê heq diyar û nadîyar
- 57 Hem ji nûra wî cemî'ûl enbiya
Ez nizanim medhê tu ey Muştefa

- 58 Şed hizar û bîst hizar û çar hizar
Enbiya û murselînê namidar
- 59 Sê şed û sêzde xudanêt ummetan
Hatine rûyê cihan beşik bizan
- 60 Nurê Eħmed ĥate pišta Ademî
Hate nik Şîsî û İdrîsê genî
- 61 Hate pišta enbiyaanê kiram
Herwekî meknûni erĥamê cihan
- 62 Ba nikaĥê bê sifaĥ û damîne
Ew emanet ta gehište Amîne
- 63 Bo ji dayê Amîne alî neseb
Sali fil bû hatina fexrul‘ereb
- 64 Ew di Mekkê bû ji dayê tu bizan
Ta Ĥelîme murďî‘a vî an zeman
- 3a 65 Ma li vê sê şali ew fexrê cihan
Hati birye Mekehê şahê zeman
- 66 Paşi ani ve Ĥelîme ba şefa
Ma di Mekkê fexrê alem Muştefa
- 67 Ummeta wî ger divêt behrê şifat
Hûn biden vëkra selam û hem şelat

Dastana Ehwalê Fexrê Cihan

- 68 Guh bidê ey mu‘minê şahib nezer
Şerhê halê Muştefa fexrû‘l-beşer
- 69 Navê dayê Amîne bînta Weheb
Ew ji zuhrê taîfê bû ez ereb
- 70 Navê babê wî tu Ebdullah bizan
Ew Qureyšî bû ereb hem ruĥ û can
- 71 Hamîle bû Amîne ba Muştefa
Lê wefat bû babê Eħmed ba şefa
- 72 Çi Medîne hem wefat bû ew li wê
Hem weşar û der Medîne ma li wê

- 73 Çin ku şeş şal emrê Eħmed bû tamam
Amînê kirbû wefat ey pur kiram
- 74 Mabûye bê daw û bab û bê newa
Nê hebîbûllah Muħemmed Muştefa
- 75 Paşê Ebdulmutelîb kir şahibî
Ta ku bû heşt şali ew merdê nebî
- 76 Murdi Ebdulmutelîb ew jî heman
Paşi mamê wî Ebû Talib bizan
- 77 Wî bire nik xwe Muħemmed bêguman
Bûye Pêxember di çil salyê bizan
- 78 Pênce û du sal ji bo wî bûn neşîb
Çiye mî'racê di Mekkê ew hebîb
- 79 Wê şevê wacib li ser wî bûn nivêj
Mutleqa murtedde merdê bê nivêj
- 80 Pênce û du şali bû fexrê cihan
Ew ji Mekkê çi Medîne bêguman
- 81 Umrê wî bo şêst û sê şal el-eman
Çi ji dinyayê Muħemmed bêguman
- 3b 82 Hem weşarî der medîne muħterem
Wî di hucra Aîşê ew pur kerem
- 83 Lê weşarin hem Ebûbekir û U'mer
Ew ba ilhama Xudê ey xweş nezer
- 84 Tu bizane ger tû îslamî ewan
Ger nezanî muslîman nabî eman
- 85 Ger nezanî ûmmeta wî nabî hem
Hem şefae't nakinin ew pur kerem
- 86 Bo Muħemmed ew hebîbê pak û zat
Hûn biden cumle selam û hem şelat

Dastana Şerħa Ehwalê Hebîb

- 87 Kuh bidêre şerħa ehwalê hebîb
Da ji bo me dîtina wî bît neşîb

- 88 Ma di Mekkê ew Muhemmed bes delal
Ta ku u'mrê wî tamam bûn pazde sal
- 89 Ew li nik mamî Ebu Talib di bû
Pur feqîr û pur 'eyal û xaki bû
- 90 Rojekê wî kir tidarek sûyê Şam
Da kû bînît rizq û erzaq û team
- 91 Gote mamê xwe Muhemmed ey şerîf
Ger biçî tû min bibe ey pur letîf
- 92 Çendi mamî kir nema ew Muşefa
Wî digel xwe bir Muhemmed ba şefa
- 93 Kariwan rabû biqêştê mulkê şam
Hem di gel wan çû hebîbê pur kîram
- 94 Wan cihûdan me'limek kamil hebû
Nav Buheyra 'ilmekî pir wî hebû
- 95 Rojekê wî xwandî tewrata letîf
Dîti ewşafê Muhemmed wî şerîf
- 96 'Enqerîbe rabîtin ez Mekke ew
Bête Şamê roj nema lê bûye şew
- 97 Çêtreê ez 'ewr û ber bala û ser
Herçî dara hişke bê ber kû şemer
- 4a 98 Ew biçîte bin ji yumna Muşafa
Şîni taze belgû kate ba şefa
- 99 Her derê ku ew Muhemmed Muşefa
Lê biçîtin dê bilind bîtin tewa
- 100 Wî di eşqa fexrê sultanul-huda
Yek kilise wî bînakir ba şefa
- 101 Der newa çêkir li ser rê ey neham
Ew di Busra bû di axa milkê şam
- 102 Dareke hişk û qewî dana li wê
Roj û şev ew muntezîr çave li rê
- 103 Ta di vê rojê ku hatî kariwan
Hem di gel wan an şehê şahib zeman

- 104 Dîti ez dûr kariwanek bû dîyar
Ew li ser banê kilîsê întîzar
- 105 Pare e'wrek dî li ser wan bû rewan
Serserê wan bûye daîm sayeban
- 4b¹⁰⁶ Wî ji dil zanî Muḥemmed hat û hem
Ta gehîşte menzîlê ew pur kerem
- 107 Hatine bin vê kilîsê nezdi pîr
Hem li bin darê peya bû ew emîr
- 108 Bû sih û sîwan ji belgan bû genê
Hate xwarê kir tidarek guh denê
- 109 Hati gazî kir cem'ê kariwan
Cumle rabûn ma li wê şahê cihan
- 110 Dîti hatin ew qureyşî cumle tam
Ma li wê ew pare 'ewrê pur kîram
- 111 Goti maye yek ji we ey ba xeber
Hûn ewî nebînin ew e xeyru'l-beşer
- 112 Kirne gazî hati Eḥmed der zeman
Hem di gel wî pare 'ewrê wî rewan
- 113 Hate pêşya ka Muḥemmed ber derî
Wî Muḥemmed dîti ber rabû girî
- 114 Dîti wî der bo bilind bû hem ferax
Hati Eḥmed ba cemala wek çerax
- 115 Wî besî⁸⁴ te'zîmi kir pirsî ji wan
Bab û da pirsî ji maman her duwan
- 4b¹¹⁶ Goti mamî babê wî me bêguman
Goti ma i'lim qed we nîne el-eman
- 117 Bab û da lê mirdîne durra yetîm
Weşfê wî dît me di tewrata 'ezîm
- 118 Wî libas ez ten wekir muhrê Xuda
Zû tewaf kir gotî billah Mustefa

⁸⁴ Peyva "Besî" di destnivîsê de xweş naête xwandin. Ji ber hindê wateya wê me baş nezanî. (M.D., K.E.)

- 119 Tu vegêre sûyê Mekke Muştefa
Dê bibîte xatemê wehyê Şena
- 120 Zûdi rabû mamê an şahê cihan
Da di gel vî ew Bîlalê taze can
- 121 Wî vegêra sûyê Mekke Muştefa
Hem Ebû Talip bi Şamê çi cuda
- 122 Kariwan hem zû vegerya hate mal
Şadibûn yekser nîsa û hem rîcal
- 123 Ez dil û ez can biden hem şubh û şam
Ber Mammed hem Şelat û hem selam

Dastana Reften Fehrê Alem Berayî Ticaretê Şam

- 124 Guh bidê ey mu'mînê îman guzîn
Ew Muhammed rehberê erbabê dîn
- 125 Gote mamî rojekê ey xoş geram
Tu tedarîk min bike ta sûyê Şam
- 126 Da biçim ez ba ticaret sûyê Şam
Da ji wê bînim ji xubz û hem te'am
- 127 Zû dirabû mamê wî derdem rewan
Çiye nik wî serwera cumle cihan
- 128 Ew Xuzeyca bû qewî ehlê edeb
Pur genî ez mal û dewlet hem zeheb
- 129 Go bo çi hatî tu ey Ebdulmenaf
Goti pare gotî bo kê pak û şaf
- 130 Goti wî bo Eħmedî ey taze e'yş
Ta neêtin nadem ey fehrê Qureyş
- 131 Zû veerya gote Eħmed ya emîn
Da biçîye nik xişûşa ya mûbîn
- 132 Her çi xwahî dê bidet ey ruħ û can
Zû dirabû Seyyîdê ehlê cihan
- 5a 133 Çûye pêş perde vekir day pare hem
Paş vegerya ew şehê şahîb kerem

- 134 Hem hebû Meyser xulamê nazenîn
Tacir û rehber ji mamê wî emîn
- 135 Da di gel Eḥmed şehê ‘alî ‘elem
Çûne Şamê kariwan û herdu hem
- 136 Roj û şev çûn ta geḥeştin nîmi rah
Hêştirek uftad qewî ḡaîb tebah
- 137 Çendi lêda Meysere ew ra nebû
Ta geḥiştî Muştefa hay jê nebû
- 138 Gotî rabe wa nemîne ey şitir
Zû dirabû wî demî ez emrê sir
- 139 Pir ‘ecaîb maye Meyser zîn kelam
Kefte çinê ta geḥište dewrê Şam
- 140 Çûne nîva şehri cumle ey humam
Darekê bê berg hebû ey xweş xeram
- 141 Çû binê darê Muḥemmed Muştefa
Taze şîn bû berg û şaxê ba newa
- 142 Me‘limek nêzîkî darê bûye mal
Wî demî Wî dît û ew fexûnde ḡal
- 143 Wî demî rabû bezî manendê ba
Gotê rabe zû biçîn⁸⁵ ey Muştefa
- 144 Ez dizanim Eḥmedî rabe biçîn
Hay ji te nebît cihûdan ey emîn
- 145 Qesdî qetla te yeqîn cumle cihûd
Dê bikin ey serwerê ba ‘ilm cûd
- 146 Wî bire mal Eḥmedê ‘alî neseb
Hem di gel wî Meysere ehle edeb
- 147 Zû tedarîk kir biderkeftin ji Şam
Ta bibû nêzîkê Mekkê ey ḡulam
- 148 Hem Xuzeycê dît û ew xwevna leṭif
Dê nikaḡ ketin te yek merdê şerîf

⁸⁵ Peyva “Biçin” di destnivîsê de zelal naêt xwandin.

- 149 Çetrê ‘ewrê ez şehê dinya û dîn
Muntezir bû roj û şev ewnazenîn
- 150 Ta di wê rojê di şehre kariwan
Hat û dît yek pare ‘ewrê sayeban
- 5b 151 Cumle hatin ba temaşa xaş û ‘am
Ta geşti wî demî Meyser gulam
- 152 Gotin Meyser ew kî bû ba çetrê ‘ewr
Goti Ehed bû şehê xeyrul’beşer
- 153 Wê ji Meyser kir suala Muşefa
Şerhê halê Ehedî cumle tewa
- 154 Bo beyankir remz û halê Muşefa
Goti bo min bîte qismet ya Xuda
- 155 Rêkire nik Muşefa Meyser gulam
Ger qebûl ket bo wî mehaşil kelim
- 156 Muşefa kir wî demî gayet qebûl
Meyser înebû cewaba ba wişul
- 157 Rojê diger ‘eqdi bestin muxteser
Bîst û pênc û sali bû fexrûl-beşer
- 158 Ma li nik wê Mustefayê pur şifat
Hûn biden vêkra selam û hem şelat

Dastana Mu‘cizatê Muhammed (s.x.l.)

- 159 Kuş bidê ger Mu‘minî ez can û dil
Mu‘cizatê şahî ew fexrû’rusûl
- 160 Mu‘cîze her wî hene sêşed hizar
Dêh ji wan ez dê beyan kem aşîkar
- 161 Mu‘cîza ewwel bizane ba yeqîn
Sîbera wî kes nedî qeş ber zemîn
- 162 Ew ji nûrê bû mişalê ayîne
Sîbera nûrê çî nabî bayîne
- 163 Mu‘cîza şanî di xewna xwe tamam
Wî nedî karek fesada îhtîlam

- 164 Daîma ba tahîr û pakîze bû
Qeṭ çî caran xwarî şeyṭanî nebû
- 165 Mu'cîz şaliş bizane ey pûser
Ew ji dayê bû leṭîf û pakîter
- 166 Navika wî pak û hem sûnnet kirî
Ṭahîr û pakîze ez eşya birî
- 167 Mu'cîza çarê bizane ey peder
Wî li pişt xwe dît û xelq û hem liber
- 6a 168 Ger li pêş wî herkesê westa biya
Ew kesê'l pişt wî di dîti îstiwa
- 169 Mu'cîza pêncê bi tilya nûri wek
Da îşaret heyvi şeq bû ber felek
- 170 Mu'cîza sadis bi ser wî kes neda
Ew bilindtir bû ji her kes b'stiwa
- 171 Herkesê rûniştiba nik şahê dîn
La cerem ra ew bilindtir ba yeqîn
- 172 Mu'cîza heftê bizane ey humam
Her çî heywanê siwar ba lê kiram
- 173 Qeṭ çî caran pîri nedbû ba wefa
Ger siwar ba carekê lê Mustefa
- 174 Ta ne murda ew ciwanê taze ba
Goşt û quwet dê li wî her zêde ba
- 175 Mu'cîza heştê çî mêş û mor û mar
Na ewêrîn ku li ser wî qeṭ çî car
- 176 Ya nehê ew bû ku bewlê Mustefa
Rû di ber erdî eser qeṭ jê nema
- 177 Ya dehê heyva tamam bû pir dîya
Landika Fexrê cîhan behrê şefa
- 178 Weqtê şev dayê hejandî daîma
Qeṭ nebû muḥṭac kesê ew pêşewa
- 179 Piştewanê ummetê roja qiyam
Hûn biden vêkra şelat û hem selam

Dastana Mî'racê

- 180 Pênceh û dû sali bû fexrû'l-ereb
Ew di Mekkê bû şehê alî neseb
- 181 Tu yeqîn ke ew şeva dûşenbe bû
Ew di hucra Ummûhanî xefte bû
- 182 Hate xwarê Cibreîlê ba şefa
Zû ji ber rabû Muḥemmed Muştefa
- 183 Gote Cibraîl tû bêje ba yeqîn
Bo çî hatî vî demî tu ey emîn
- 184 Got ey fexru'l-ereb dara şefa
Şed beşaret ber tû bada ez Xuda⁸⁶
- 6b 185 Got bêt 'erşê min ew ('alî)⁸⁷ meqam
Da bibinim şuhbeta fexrê cihan⁸⁸
- 186 Wî demî tirsî û lerzî Muştefa
Rengi lê zêr bû bi ilhama Xuda
- 187 Zû di rabû ba widûê kamil e
Hem du sûnet kir biruknê zaîle
- 188 Ew bi der keftin ji hucrê ey pûser
Vî Mikail dît û ew rabû ji ber
- 189 Hem digel wî bûn melaîk bê şumar
Wan kirî vêkra selamê şed hizar
- 190 Şed beşaret dane mizgînî tamam
Bert û bada ey Muḥemmed es-selam
- 191 Çûn ji wan bûrîn bi çavan dîti hem
Hati Îsrafilî ba fexrê kerem
- 192 Ba Bûraqî refref û ḥusna tamam
Hate pêşya ka Muḥemmed es-selam
- 193 Min Bûraq û hem libasê pir şefa
Bo te îna rabe ey şahib wefa

⁸⁶ Wateya vê peyvê aşkere nîne. Dibe ku "an Xuda" jî bête xwandin.

⁸⁷ Ev peyve ya jê çuyî, qene'eta me peyva "'alî" lê zêde bibe dê duristir be. (M.D, K.E.)

⁸⁸ Qafîya vê malkê ya nedurist e, di destxetî de bi vî awayî ye.

- 194 Ew siwarbû wî demî haja rewan
Çi digel wî Cibraîlê taze can
- 195 Çûne rê ew şehsiwarê namidar
Vê ditîtin pur ‘ecaîb bêşumar
- 196 Çûne Qudsê wî demî ey ba wefa
Cumle erwahê cemî‘ûl-enbiya
- 197 Ew bi der keftin ji Qudsê newdiban
Wan ji jêrî⁸⁹ dîtî çiyê asiman
- 198 Herdû efradêt qewî ta asîman
Ew melaîk muteşil westane san
- 199 Gote Cibraîli ey fexrê cihan
Zû siwarbe ey Muḥemmed bêguman
- 200 Destê bûraqê qeşîr bûn ey pûser
Pê dirêjbûn wî demî ey ba xeber
- 201 Wê bilind bû ta geḥeşte asiman
Wî tereqî kir ji vî çî hem çinan
- 202 Ta geḥeşte asîmanê çaremin
Vî li wê dît ‘Ezreîlê şehmigîn
- 7a 203 Lewḥeke kamil di dest wî kiram
Tê hebû navê hemî mexlûq tamam
- 204 Herkesê mirdin bihata qeṭre ab
Wê li bala bête xarê di cewab
- 205 Dê biket navê ewî zîr û zeber
Ez dîzanim ercela wî hate ser
- 206 Hem ji wî borî Muḥemmed ba yeqîn
Ta geḥeşte asîmanê heft zemîn
- 207 Hem ji wî borî Muḥemmed bêguman
Ta geḥeşte sidre ew şahê cihan
- 208 Menzila Cibrîlî bû sidre meqam
Ma li wê Cibrîli ey şîrîn kelam

- 209 Gote Cebraîli fexrê kâinat
Zû were tû wa nemine ba şîfat
- 210 Got ya Eħmed neşêm yek zerre zîn
Ez biborîm dê bisôjim ba yeqîn
- 211 Hem ji wê borî ħebîbê namidar
Ma teħeyyur ez çi bêjim kirdikar
- 211 Hate qelbê wî bi îlħama îllaħ
Bo te yek ser et-teħiyatlîllaħ
- 213 Hem di wê lehze Xudê lêkir selam
Hem bi çawan dît rebbê la yenam
- 214 Lê heqîqet wî nezanî ew çi ye
Qabê qewseyn mişlê wan nêzîk biye
- 215 Wî kirî ħayet tekellum ba Xuda
Bê hurûf lefz û şewt û xweş nîda
- 216 Hate Xwarê ta meqamê Cibreîl
Goti rabe tu bibe bo min delîl
- 217 Da bibinim cennet û narê Xuda
Çi digel wî Cibreîlê ba wefa
- 218 Çûne baĝê cennetê hem ba sirûr
Seyrê cennet kir digel ħûr û qusûr
- 219 Paşê ħingê ew bi derkeftin ji wê
Çine seyra narîba emre Xudê
- 220 Hem ceħennem dîti ew narê ‘ezîm
Hem e‘zaba a‘şîyan awa hemîm
- 7b 221 Xelqi çend dîti di narê pur cefa
Zu vegerya wî demî an Muştefa
- 222 Hate xwarê ta geħeste menzilê
Silsila babî teħerruk bû we lê
- 223 Hem gerim bû ew cihê sulţanê dîn
Bertû bada şedħizaran aferîn
- 224 Şerħê mî‘raca ħebîbê kirdikar
Dûre ez fehma mine bê rahizar

- 225 Muxteser hate beyanê ey puser
Da nebin bê hişse ez ha ser bi ser
- 226 Tu bide ez can û dil ey ba şîfat
Ber Muḥemmed sed selam û hem selat

Dastana Ḥicretê

- 227 Ma di Mekkê fexrê alem ey puser
Ḥem li wê bû serwerê peygamiber
- 228 Xelqi îna rahê Yezdan bêqiyas
Bûne îslam û leḫf û dîn şînas
- 229 Kafîran tebdîri dana halê ma
Dê çîbêtin ku ji destê Muştefa
- 230 Eḫlê Mekkê ba Ebû Cehlê le'în
Bûne dujmin ez 'edawet hem ji kîn
- 233 Rojekê cumle cemabûn yek serî
Ca beyan ken kerb û kîna kafîrî
- 232 Çûne darû'n-nedwê ew beḫrê resul
Kir meşûret cumlê ew qewmê cehûl
- 233 Hem geḫeşte la lî wan şeyṭani hem
Ray ḫîngavtin gelek ey pur kerem
- 234 Her çî re'ya wan kirî yekser tamam
Cumle şeyṭanî beṭal kir ey hûmam
- 235 Gotinê tebdîr çî ye ey merdî pîr
Got rabin pêkve ba şîmşîr û tîr
- 236 Qeşda qetla wî bikin nîwa şewî
Eşlê 'umde her xeyala min ewî
- 237 Cumle bûne muttefiq rabûn tamam
Hatine qetla Muḥemmed wes-selam
- 8a 238 Gotî rebbu'l-alemîn ey Cibreîl
Tu here zû bo Muḥemmed be delîl
- 239 Hati Cibraîli gote Muştefa
Tu ji Mekkê derkeve ey ba şefa

- 240 Sûreê yasîn bixwîne ey resûl
Da jî dîtina te bibin kafir melûl
- 241 Wî demî rabû Muhammed ey hûmam
Hem digel wî çî Ebûbekrê kiram
- 242 Ew bi derkeftin ji hucrê sûyê gar
Wî li ser axê û yasîn xwendewar
- 243 Wî li serwan axî rîşandî hemî
Pêkve rabûn cumle kafir wî demî
- 244 Çine garê ew di Hîrayê dibû
Kafîran dîtî Muhammed berze bû
- 245 Kotirê filhâlî û hêlûnek tamam
Ber derê garê muheyra kir kîram
- 246 ‘Enkebûtê tevin havêt derî
Da nebinin ew di garê serwerî
- 247 Çend lêgeryan nedîtî Muştefa
Cumle lê geryan li deşt û hem çîyan
- 248 Çûne sûyê garê dîtî tevî li ber
Ber derî hêlûnekê teyran li ser
- 249 Wan yeqîn kir nîne tê da Muştefa
Paşve hatin ma li wê ew pur şefa
- 250 Ma di garê sê şewan fexrû’l-ereb
Paşî hingê ew şehê ‘alî neseb
- 251 Ew ji garê çine Medîne ey hûmam
Ma li wê deh sali ‘umrê wî tamam
- 252 Paşî hingê fetħa Mekkê kir heman
Çî tewafa Mekkê kir fexrê cihan
- 253 Cem’e bûn îslam û eşhabe tamam
Ta wefat kir ew şehê şîrîn kelam
- 254 Ey Muhammed bertû bada şubh û şam
Şed wirûd û şed şelat û şed selam

Dastana Wefata Fexrê ‘Alem

- 255 Kuh bidêre tu eya ey musliman
Ez wefata Muştefa fexrê cihan
- 8b 256 Tu ji dil ba gêrî be ba ummetê
Şed mixabin bo şefî‘e ummetê
- 257 Bê xudan ummet te hêla pur zelîl
Dê çî bitin halê me ey ba cemîl
- 258 Şêst û sê sal ‘umrê şahê ummetê
Şed mixabin ey emîrê cennetê
- 259 Hatê xwarê Cibreîlê ba wefa
Tu bizane ey Muşemmed Muştefa
- 260 Tu bizane ey Muştefa destûrî ye
Hem wefata te yeqîn nêzîk biye
- 261 Tu bixwaze xaşira xwe ey resûl
Paşî te ummet qewî dê bit zelûl
- 262 Tu ji eşhaban bixwaze rûxsetê
Hem ji ehlê beyte û hem ez ummetê
- 263 Wî demî berdagirî fexrê cihan
Rûhnikêt wî hatine bê hed eman
- 264 Wî demî bangê şubê da an Bîlal
Ba gem û zarî û efgan û melal
- 265 Hate xwarê ew Bîlalê taze can
Ber derê hucra Muşemmed ruh û can
- 266 Yek demî westa nîda kir ba edeb
Eş-şelat ey serwerê fexrû’l-‘ereb
- 267 Weqtê şubhê ya hebîbê namidar
Cumle eşhabe hemiya întizar
- 268 Faţimê gotê bizane ey Bîlal
Pur nexwûş e ‘aciz e ew ba cernal
- 269 Vî demî berda girî ya reb eman
Way Muşemmed ez çikim ba qelb û can

- 270 Eş-şelat û es-selam û ey şahê dîn
Serhilîna Muştefayê nazenîn
- 271 Emir fermû ey Bîlalê taze can
Ez neşêm bêm wî demî beşik bizan
- 272 Ew Ebubekrê ku şiddîqê mine
Canişîn e qaîmê emrê min e
- 9a 273 Ew îmam e bo we eşhaban tamam
Pur kiram û pur newa û nîkinam
- 274 Hate qeşda cami'ê kir ba fiğan
Wayê weyla dê çi kem ya reb eman
- 275 Wan şehaban rê vegerya ew Bîlal
Ba girî û ah û efgan û melal
- 276 Got nexwûş e şahê fexrê kâinat
Bû girî û ah û efgan û şelat
- 277 Bû hewar û bang û taziy û 'înat
Bû sebûr⁹⁰ û bang gaziy û şelat
- 278 Gêriya wan çiyê çerxa asiman
Serhilîna wî demî fexrê cihan
- 279 Goti ya 'Eyşa çi ah û zarî ye
Goti bo te van şehaban taziye
- 280 Hati 'Ebdullah û hem hat û 'Elî
Rabibûn çi cami'ê kir muqbilî
- 281 Ew ku rabû şubhê çi ser mînberê
Şuhbeta wî mişlê ava kewşerê
- 282 Ku emanet weşiyam û hem şelat
Hec û beytîllahî hem dana zekat
- 283 Hûn şiyar bin daîma gafil nebin
Ger we mal û dewleta dinya hebin
- 284 Qeţ çinîne sahir e dunya û dîn
Çi nema bû min yeqîn bû çi zebûn

⁹⁰ Belkê ev peyvya "sebûr" bi zimanê erebî bîtin.

- 285 Bo kesê baqî nemaye ev cihan
Aqibet her mirdin e bêşik bizan
- 286 Ez ji bo we hem nebî bûm hem neşûh
Qatilê ser kafiran û ba futûh
- 287 Hûn bizanin cumle eşhabe tamam
Ez ji bo we hem bira bûm nîkinam
- 288 Ber Muḥemmed an şehê şahib meqam
Hûn biden vêkra şelat û hem selam

Dastana Siwalê Qeşaş

- 289 Kuh bidêrin cumle îxwan ser bi ser
Ku Muḥemmed dê siwal ket ez xeter
- 9^b 290 Goti bêjin heqqê kê'l ser min esas
Ez dijûn şetm û legw û hem qeşaş
- 291 Man şehabe der teḥeyyur îxtîşaş
Rabûbû serpê cewabiş da 'Ukaş
- 292 Day û babêt min fiday te muḥterem
Heqqê min l'ser te heye şahib kerem
- 293 Roji gezwê ez û tû ba yek dîger
Hêştirê min hêştirê te ser bi ser
- 294 Yek qedîb ber min resîd ez sehmiğîn
Ez nizanîm 'emde bû ya xete în
- 295 Goti 'Ukaş ḥaşa lîllah bes delal
Xatirê xu pak bike'j reyba û xeyal
- 296 Gofti ya Bîlal tû here wê menzilê
Da ji bo min tu qedîbê ser gilê
- 297 Ew Bîlal çi mişlê berqa asiman
Ta geḥeşt e ber derê ḥucrê tamam
- 298 Goti ya Faṭîm bide min zû qedîb
Da bibem ez bo Muḥemmed xweş hebîb
- 299 Faṭîmayê emir fermû ey Bîlal
Bo çi ye bo min tû bêje zî cemal

- 300 Goti ebbet dê bidet îro qeşaş
Da ji bo me ew mûşîbet bît esas
- 301 Faţimê gotê ku kî ye ew esas
Ew ji babê min bixwazîtin qeşaş
- 302 Vî qedîb hilgirt û rabû zû bi zû
Ta geheşte mescîdê ew nûr birû
- 303 Çi Muħemmed kir tû da destê ‘Ukaş
Tû ji min teħşîl bike heqqê xu faş
- 304 Wî nezer kir ber şehê dinya û dîn
Ew şehabe man teħeyyur hem qerîn
- 305 Ew Ebabekir û ‘Umer herdu hem
Rabibûn hem wî demî hem’j kîn û gem
- 306 Got qeşaşê xu ji me teħşîl bike
Vê ‘înadê terk û hem îzhar bike
- 307 Wî Muħemmed emri da wan herdu wan
Hûn ku rûnin ‘efû bo we hem eman
- 10a 308 Ew ‘Elî rabû ku yarê mu‘teber
Gote ‘Ukkaş ezi weştam ser bi ser
- 309 Emr û ferman got Muħemmed bo ‘Elî
Got tû rûnî meqşedit bit tertedî
- 310 Herdû fer‘êt Muştefa ku rabibûn
Ba edeb ew qed û qamet westibûn
- 311 Goti ‘Ukaşî eya merdê cesûr
Em dibîne ‘îwaza şahê binûr
- 312 Ku qîşaşê xu ji me wan herdu yan
Herwekî teħşîl kirî j’şahê cihan
- 313 Wî Muħemmed gotî ‘Ukkaşe tamam
Tû qedîb li min bide ey nîkinam
- 314 Wî ‘Ukkaş goti Muħemmed ya hebîb
Min divêt dîtina te bo me bît neşîb
- 315 Wî libasê xu derîna bo dubar
Wan şehaban dîti bûne întîzar

- 316 Wan şehaban ew rimûze dît bi çaw
Bo girî û ah û efganê tewaw
- 317 Wî ‘Ukkaşe ku nezer kir bû tamam
Ew Muḥemmed bo şefa‘et wî humam
- 318 Wî ‘Ukkaşe bûsekir pišta ḥebîb
Da di ‘uqba dîtina wî bît neşîb
- 319 Wî ‘Ukkaşî got Muḥemmed Muştefa
Qeşda min îqşaş nebû ku bît wefa
- 320 Wî Muḥemmed gote eşaban tamam
Ger nezer ken ehlê cennet în humam
- 321 Ew Şehabe cumle rabûn b’emrê wî
Wan tewaf kir ser û çav û destê wî
- 322 Wan şehaban got xwezîk te ey ‘Ukkaş
Tu di dinyayê bilind û ser bi tac
- 323 Bû refîqê wî Muḥemmed bes delal
Tû bicahê mertebe ey bîl kemal
- 324 Hûn biden vêkra şelat û hem selam
Ber Muḥemmed an şehê şahîb ‘elam

Dastana Wefatê

- 10^b 325 Kuh bidêre ey gelî ehlê şefa
Ber rih û li ber hicûrê mucteba⁹¹
- 326 Wê dema bû ye wefata Muştefa
Em cemabûn cumle dergê Aîşa
- 327 Ew Muḥemmed kir nezer ber me tamam
Wî verêtin awê rûhnik bêguman
- 328 Goti merḥebba li we ehlê şefa
Hûn bibin ber emrê barî bittûqa
- 329 Hatî nêzîk dê cuda bim ez ji we
Cumle hûn ḥazîr bîemrîllahî we
- 330 Dê biçim nêzîkî rebû‘l-alemîn
Hîvîdar bim bo cemî‘ûl-muslimîn

⁹¹ Wateya vê niv rêzkê ya aşkera û zelal nîne.

- 331 Dê biçim ta cenneta dar'ul-me'wa
Da şefa'et kem ji bo hemyan tewa
- 332 Weqtê we şuştim mi danin ser cihê
Bê îmkani ku heme el-an li wî⁹²
- 333 Hûn ku danin pur şefirê qebrê min
Dûr bikevin sa'etek gâib ji min
- 334 Ew kesê ewwil niwêjê l'min di ket
Ew Xudayê zulcelal îhsan diket
- 335 Paşê Cibrîl û Mikaîl Îsrafil
Ba meleku'l-mewtî çendî hem cemîl
- 336 Paşî hingê ew melaîk fewc û fewc
Dê bibin ber çar kenar û mewc û mewc
- 337 Ew niwêjê dê bikin cumle tamam
Ba du'a û ba rica û ba salam
- 338 Wê dema wan di ku mirdî Muştefa
Bûgirî û ah û efgan û wefa
- 339 Ew resûllahi ku çi way eman
Tû şefî' û şemê' cumleyan heman
- 340 Tû ku sultan bûy ji bo me ey hebîb
Dîtina te çi di 'uqba bît neşîb
- 341 Emrê pêxember ku dîsa jê hebû
Goti paş min hûn nebin gâfil bi zû
- 342 Min ji bô we hec û 'umre ku tewa
Kirne huccet hûn bikin şidqû şefa
- 11a³⁴³ Wê dema ku j'bo we wê huznek hebî
Hûn biden vêkra şelatan ber nebî
- 344 Ew kalamê Kibriya j'bo we vema
Hûn bikin bawer bi emrê wî Xuda
- 345 Wê dema hûn bin ku gâfil el-eman
Mirdinê hûn bîne bîra xu tamam⁹³

⁹² Wateya vê kelîmê ya aşkera û zelal nîne.

⁹³ Kafîya vê beytê neya durist e. Bes di destnivîsê de bi vî şiklî ya hatiye nivîsîn.

- 346 Her weqît emrek ku muşkîl bû li we
Hûn werin pîsyar bikin şer‘î ji me
- 347 Wî nesaxyê dest ku da j’bo Muştefa
Axirî heyva şefer bû ew Şefa
- 348 Bîst û heştî heyiva şehre şefer
Wî nesax bû ew Muhemmed sîng û ser
- 349 Ew nesaxya tê serî an Muştefa
Ku wefat kir babî emma tê tewa
- 350 Hatina wî yewmûl’unseynê di bû
Hem di wê rojê ji dinyayê ku çî
- 351 Wê dema rabû ku çî ew Muştefa
Çî bû hucra hedreta an Aîşa
- 352 Wê dema emrê Xuda hat bîttema
Ah ji bo me wan feqîrê bê newa
- 353 Emri kir bû qabîdê ruhê heman
Tu here Xanyê Muhemmed bîl-eman
- 354 Şûretê xu tû bike pak û temîz
Ew hebîbê min Muhemmed ku ‘ezîz
- 355 Ca ji çî na te nebîtin ew hezîn
Lew ji dîtna te dibîtin sehmeğîn
- 356 Tu birehm û hem leţif û pur kerem
Bo emanetyê Muhemmed zî herem
- 357 Ger bibêjît tû were zû zû here
Wer nebêjît tû neçew paşve were
- 358 Wê dema ew qabîdê ruh hate xwar
Lew li me lazim bûye tirs û hewar
- 359 Hatibû ser şûretê e‘rabê Zeyd
Wî selam kir l’ser Muhemmed ehlê beyt
- 360 Wî nîda kir goti ehlê beytê hem
Ez kû bêm ya Eħmedê ‘alî ‘elem
- 11^b 361 Faţimê dabû cewaba gazî wah
Ku Muhemmed wî demî meşgûle ah

- 362 Cari dî vêkra bû gazî deng û hem
Eş-şelat û es-selam ey Muhterem
- 363 Ya resûlûllah resûlê girdigar
Emr û ferman dê bibêm ez bû te yar
- 364 Şewti çi gehişte gûşê Muştefa
Emr û ferman ber derî kêy mûrteđa
- 365 Got murdek e‘rebî wê l’ber derî
Ez nizan im ‘eşl û neslê buhterî
- 366 Faţımayê emri da ku Muştefa
Wî demî meşgul e ew b’emrê Xuda
- 367 Xûf û tîrsa mirdinê bû zori hem
L’ber Muhemmed bû teğeyyur lewn û cism
- 368 Çûn Muhemmed gote Faţmayê wesana
Ew mirove hat xirab ket lezzetan
- 369 Ew cuda ket muhbet û cem‘iyetan
Lew hedame j’bo dihû hem zînetan
- 370 Ew ku dil xûş ket qubûr ‘u xirbetan
Ahû nale cumle eşhaban wesana
- 371 Faţıma berda girî gotî eman
Şewtûha ta geşte cumle ku cihan
- 372 Wey hewar nê mird Muhemmed Muştefa
Xatemê pêğemberan dad û pena
- 373 Wey hewar e mirdî xeyrû‘l-enbiya
Ku cuda bû çi ji me ew etqiya
- 374 Hêseta me inqıta‘a wehyê wî
Ku ji esman tate erdî cem nebî
- 375 Te heramkir ew li me ey Muştefa
Nabihin em paşte ey şem‘ê cem‘ul-enbiya⁹⁴
- 376 Vî Muhemmed goti la tebkî eman
Emrê barî qaîme li ser me wesana

⁹⁴ Di destnivîsê de bi vî şiklî ya hatiye nivîsîn, belê wezna wê neya durist e.

- 377 Goti ew j'nûra min e hatî bi kar
Da ji rebbî ez nebim ku şermizar
- 378 Tu were ey qabîdê ruhê eman
Ba selawat ba salam û bî'l-kiram
- 12^a 379 Ew melek çû ku selam kir l'ber serî
Vî Muħemmed ku cewab dayê girî
- 380 Goti zair hatî em riħ qabîdî
Goti hatim qabîd im ger izin bidî
- 381 Ger tû emrê min nedî ez dê herim
Şev bi roj hindî heme er dê qerim
- 382 Wî resûlullahî got bo qasidî
Tû were da ez bizanim meqşedî
- 383 Te birayê min ku Cibrîlê emîn
Ew li kê maye ku⁹⁵ bibinim ez mûbîn
- 384 Elbe elbe nazil e ku Cibreîl
Asimanan hate erdî pur zelîl
- 385 Çû ku rûnişte ħudûra Muştefa
Eş-şelat û wes-salam ey pur şefa
- 386 Got te zanî emri ser min bû qerîb
Vî cewab da gote Eħmed ya ħebîb
- 387 Goti bêje beħs û denkêt asiman
Lew li erdî ah û zarî û feġan
- 388 Ebşîrî nê ma li 'îndellah çîye
Hem ji îkramê we îħsana wî ye
- 389 Goti bo te fetħê ebwabû's-sema
Muntezir bûne melaîk şef şefa
- 390 Bo ruħa te ya şefî'ûl muznîbîn
Xeyrî xelqûn-nasî xetmû'l-mûrselîn
- 391 Hem ji bo te fetħi bûn dergêt cînan
Ĥûriyan bû ġulgul û şadî rewan

⁹⁵ Ew "ku" ye ya ji weznê zêde ye.

- 392 Wî Muḥemmed ḥemd û Ellah goti hem
Ez nebî bûm ya ûxeyye'l-muḥterem
- 393 Paşi hingê gote Cebraîl meqam
Ûmmeta min dê ku bît yewmû'l-qiyam
- 394 Heq te'ala bo te mizgînî tamam
Ku ji bo çûna beḥeştê tû îmam
- 395 Wî ḥeram kir ew beḥeşt l'ser enbiyan
Ta neçî ba ḥeşr û neşrû hem bizan
- 396 Hem ḥeram kir l'ser cemî'ê ummetan
Ta neçîtin ummeta te her wesan
- 12^b 397 Wî Muḥemmed got tena bûm ey emîn
Ġem û guşşe bû be'îd ew jî ji min⁹⁶
- 398 Paşi hingê emr û ferman ya melek
Tû were nêzîkî min ḡayet gelek
- 399 Ew melaîk hate nêzûk Muştefa
Ew me'alîc bû li rûḡa wî wefa
- 400 Wî dema rûḡ geşte ser sîne heman
Gote Cibraîl şedîd e bî'l-eman
- 401 Cibreîlî wî demî rû paş ve da
Çin Muḥemmed emr û ferman ez kuda
- 402 Ya ji min înkari bû ya Cibreîl
Ṭaqeṭa min ku nema ber bûm zelîl
- 403 Ya ḥebîbûllah kîye ṭaqet hebî
Ku li te nezer biket ya muctebî
- 404 Tû di ḡîna sekera tê da eman
Lew li me bû ah zarî û feḡan
- 405 Wê dema ruḡ geşte şedrê min 'ecîb
Îbnî Malik emr û ferman ku ḥebîb
- 406 Lew li we weşyet bikem ey muslîmîn
Hûn b'nivêj û rojiyû teqwa û dîn

⁹⁶ Kafîya "emîn û min" li ser yek naên û ya sist e.

- 407 Lew ji bo we weşyetek min kir tewaw
Da ku ġafil hûn nebin der wext û gaw
- 408 Ta ku munqetî‘ dibû lefza şeref
Şed emanet hûn nebin xasir hedef
- 409 Wî ‘Elî ferman ku lefza Muştefa
Ta ku bûye axirê mirdin wefa
- 410 Herdû le‘leynê di nûrîn herîkîn
Wî digot way ummetî wa ummetîn⁹⁷
- 411 Hûn jî guhdar bin musulman hûn hemîn
Ew ji dinyayê ku çi kes dî nemîn
- 412 Felew kanet ed-dunya tedûmû lîwahîda
Le kane resûlullah fiha mexleda⁹⁸
- 413 Şed şelat û hem selam ez can û ruh
Ber Muħemmed an şehê şahib futuħ
- Dastana Ğusla nebî (s.x.l.)**
- 13^a 414 Em hîkayet keyn ji ġesla Muştefa
Paşê wefat bû ew mucteba⁹⁹
- 415 Ku ‘Elî rakir ji bo text û serîr
Ba helîm û xewf û tirs û hem hezîn
- 416 Subhê amed ez kenarê beyte û
Goti bo wan Muştefa la texselû
- 417 Çinkî tahîr û muṭehher bê guman
Ansuxen der nefse men waqî‘ heman
- 418 Zû siwala wê cewabê kir ‘Elî
Got tû key zahir bibe ey muncelî
- 419 Lew Muħemmed weşyet kir j’bo min tewa
Min bişon weqtê ku ez bûme wefa
- 420 Paşî hingê gazîyek dî bî’t-temam
Fexsilûhu tu Muħemmed bî’l-kîram

⁹⁷ Wê digot way ummetê way ummetê wa ummetîn. Eslî de bi vî şiklî ya hatiye nivîsîn, belê ji weznê ya zêde ye.

⁹⁸ Ev rêze bi zimanê erebî ye, li gel weznê na guncît.

⁹⁹ Ev rêze ya ji weznê kême.

- 421 Gaziya ewwel ku şeytanê le‘în
Hatibû gâfil biket te ba yeqîn
- 422 Qeşda fi‘la wî le‘înî ew di bû
Ca ku daxil qebrê bît mexsûl nebû
- 423 Hûn bibînîn kîn û keyda kafirî
Ew ku însanan diket rehîmê berî
- 424 Çin ‘Elî bû wî demî şahib xeber
Te beyan kir ew ji bo min bê nezer
- 425 Tu ji bo min bêje ismê xû heman
Ca bibim ber goftened qewlê eman
- 426 Ku hîdir hatim huđûra Muştefa
Ya ‘Elî el-mûrteđa el-muncela
- 427 Wî E‘lî şuşt û temîz pakîze kir
Ba henûd xetmeyê ew pêvekir
- 428 Îbnû ‘Ebbas avi lêkir bî’t-tamam
Şed şelewat ber Muħemmed hem selam
- 429 Harîkarya wan kirî Ussame Zeyd
Cibreîl hat wî demî hem ba Cunejd
- 430 Wî henût îna ji bağê cennetê
Goşîdar bin j’karû barê qudretê
- 431 Kifin kirdin der libas û ħulleyan
Ew weşarin hem di ħicra ‘Eyşeyan
- 13^b 432 Aî‘şa westabû ser qebrê resûl
Ba fiğan û ah û zari û zelûl
- 433 Ku şeva çarşembe ew medfûni bû
Hind dibêjin leyleyê eslasi bû
- 434 Ya menê poşîd nekir be der ħerîr
Ya kesê xefte nebû’l ferşî û serî
- 435 Ya resûlullah tû çiy l’ferşê ħeşîr
Beñnê tû şeb‘ê nebû’j xubzê şe‘îr
- 436 Ya Muħemmed îxtiyar kir dê ħesîr
Ber liħaf û ber firaş û ber serîr

437 Ya menê xabit nebû roj û leyal
J'xewf û tirsî mirdinê roja qiyam¹⁰⁰

438 Temmeta mewlûda şulţanu'l-huda
Ez wîladet ber heyat û ta wefat

439 Ber Muħemmed rehberê erbabê dîn
Hem şelatan hûn biden j' dil û yeqîn

Xîtama Mewlûd

440 Ĥurmeta mewlûda sultanû'l-beşer
Ey şefî'ûl muznibîn tûy xweş nezer

441 Me qebûl key j'ummata xwe ey Ĥebîb
Da di ferda dîtina (te)¹⁰¹ bît neşîb

442 Ĥurmeta mewlûda sultanê cihan
Hîvîdar em rûsîyahîn bê nehan

443 Ĝeyrî zatê zulcelalê bê misal
Nîne qed kes me penahê qîl û qal

444 Hûn bibêjin qewlê heqq û hem resûl
Ca bibîn l'ser mirdinê îman qebûl

445 Ye'nî şehdedane rojî hem nivêj
Ca bê xewf û tirsî bin roja dirêj

446 Hem Muħemmed alû eşhab nasiħe
Ber cemî'ûl-muslîmîn û şaliħe

447 Ew feqîrê pir zunûbê fađiħe
Ey musulman da bixûnîn fatiħe

¹⁰⁰ Kafiya "leyal û qiyam" li ser yek nînin.

¹⁰¹ Kelîma "te" di eslê destnivîsê de nîne. Belkê nivîskarî eve nivîsîbe, di nusxê de jê çibe. Ji ber ku li ser weznê bêt eve me lê zêde kir. (M.D, K.E.)

2. 2. Guldeste

¹ Hemda Xuda

- 1
Were bike hemda xudayî
Wî Xudayê ku em dayî
Em neyiyê înan heyiyê
Ni'met kirin bi îslamiyê
- 2
Em kirin xudan eql û lîsan
Ewî çêkirin em musilman
Ewî dane me eql û zanîn
Em kirin xwedan îman û dîn
- 3
Em ji neyê înane wicudê
Da ji bo wî biçîne sucûdê
Ew me'bûd e em jêra bûne ebd
Da ji bo bikeyn em îbadet
- 4
Dane me kelam û hem xeber
Em kirin ummet ji bo pêxêmbêr
Xemilandin bi pênc hewasa
Zînnet kirin bi eql û namusa
- 5
Bi rûh û beden çêkirin qedîm
Bi navkirin ehseni teqwîm
Em ji ax û kurê çêkirin
Bi ruha xwe em ezîz kirin
- 6
Ji ruha xwe pifkire bedenê me
'Ehda elest dana ye berê me
Ji milyaketan mezintirin
Eşrefî mexlûqatî em çêkirin
- 7
Bo xwe kire xelîfe li rûyê erdî
Gote melean li pêşê herîne secde
Melean li pêşî Adem secde bir
Ew ji bo îsanî bûye qedir
- 8
Îsan çêkirin bi eql û zeka
Bi qedirtirîn ew ji cin û melean
Binêre miraca pêxemberî
Bûye mînak ew jî bo beşerî
- 9
Îsanî rûh ji zatê Xuda ye
Lew ji her tiştî ew cuda ye
Hind nebûne pêxember
Hind resûl in xwedan xeber

- 10 Rêkirine em ji bo na îmtîhanê
Ka dê kî karî ket li wê cîhanê
Dunya bo me kirye zevya axretê
Ka dê kî bi xêr çîte pêş hezretî
- 11 Ew yê qedîm e û xwedan qudret
Hem yê xwedan hikmet û şeltenet
Ne şîrîk û ne malxê û ne wezîr
Her ew e wî nînin çî ewwel û çî axir
- 12 Her kesê bawirmend bît bi Xweda
Na kevîte nav fikrê cuda
Ewê ji Xweda bawer kir mu'mîn e
Her çiyê bawir neket kafîr e û bê dîne
- 13 Tû bawir ke ji heyya melekan
Paşî ji suhûf û hem kitaban
Bi qeder û xêr û hem şerê
Paşê bi mirin û roja meşerê
- 14 Xuda binase bi çarde şifatî
Hind zatî e hind sibûtî
Bi xwîne da bizanî heya Xuda
Da nekevî nav fikrê cuda
- 15 Bi cih bîne şewm û şelatan
Here heccê bide tu zekatan
Zekat heqqê feqîra ye bizane
Nebe mani' tu bo heqqê wane
- 16 Destê feqîran xalî nehêle
Bê meta' bi dilxweş ke û bihêle
Ne êşîne tu çî kesana
Birsî ne hêle tu çî însana
- 17 Bi rûgeşî pêşwazîke insanî
Bi dilxweşî rêke tu mêhvanî
Kînu û kerban ji nik xwe pavêje
Nebe hesûd û dil qirêje
- 18 Ji heyya kesê nebe dil giran
Her dem du'aker be ji bû muslîman
Nebe dilreş û hesûd û çaw havêj
Da nebî ji yê dil qirêj

19 Ji zatê Xuda bike tu şermê
Neke tu xirabiya çi qewmî
Her cihê tu lê bi Xuda dibînî
Da pêşî Xuda şermîn nemînî

20 Tu çi wextî neke direwan
Nekeve nav xewa roj û şevan
Nebe pur xwab û xem û xarin
Ew tişte zerer in nebi kar in

21 Bi dev û dilan bibe wafiq
Da nebi j'yêd munafiq
Bi du dewan çi car xeber nede
Edebî ji destê xwe ber nede

22 Bi rastî bijî tu li dinyayê
Ne keve nav zevq û şefayê
Çi car neke şehdê zûrê
Li axretê dibî qussûrê

23 Me kir suhbet tu bigre neşîhet
Li ser xwe ewî bike 'adet
Dê serfiraz bijî li dinyayê
Dê Xudan Xêr bî li 'uqbayê

24 Ya Reb hîvîdarîn ji rehma te
Umîdwar in bi 'efya te
Efya te pitir e ji cezayê
Tu bi gefîrîne 'Ebdulayê

²Şelat Ser Wî Bin

1 'Emir kirye Xudayê mezin
Şelatan biden ser hebîbê min
Ew hebîbê ewwel û axir
Li ba min kes nîne wek wî biqedir

2 Her ew e xatemê pêxemberan
Şelat û selam li ser wî 'al û eşhaban
Ji ber wî min çêkirîne kewn û mekan
Şelat û selam li ser wî 'al û aşhaban

3 Her ew e bûye resûlê seqeleyn
Her ew e bûye îmamê heremeyn
Şelat û selaman herdem û gavan
Bide ser Muḥemmed û eşhaban

4 Her ew e resûlê însan û cinan
Her ew e şefî'ê muznibînan
Şelat û selam her dem û gavan
Bide ser Muhemmed û eşhaban

5 Ew çiyê seyra asûmanan
Mîraç kirîye li lamekanan
Şelat û selam her dem û gavan
Bide ser Muhemmed û al û eşhaban

6 Bi saya wî em musulman in
Xudan îman û qur'an in
Şelat û selam her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eşhaban

7 Ew bûye rehberê meşerê
Ew bûye şefî'ê meşerê
Şelat û selam her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eşhaban

8 Ew e xudanê mu'cîzatan
Her ew e fexrê kaînatîyan
Şelat û selam her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eşhaban

9 Bi îşaretek heyv parçe kir
Li pêş çavêt muşrîkan eve kir
Şelat û selam her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eşhaban

10 Bi tiliyê îşaret kire şeneman
Weris yane erdî çî jê neman
Şelat û selam her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eşhaban

11 Hezar car hezar şelat û selam
Li ser resûlê xweyrul-enam
Bê ejmar şelat û selaman
Rêdkeyn ji bo resul û eşhaban

³ Rabe di vî Demî

1 Gelo rabe di vî demê
Bike tu karê seferê
Em keftîne xab û xwarinê
Nizan in dê çiyê kîderê

- 2 Bo çî hatî dê kîve çî
Bê şol û kar û dest miçî
Bi ser rût û kefen bêçî
Bîzane ‘eslê xwe yê berê
- 3 ji Xuda hatî bo îmtîhanê
Tu guhde emrê Qur’anê
Bê hiş nebe li wê cîhanê
Da nekeviye xusarê
- 4 Li vê cîhanê nebe sefil
Bê ‘emel û xêr û bexîl
Li axretê dibî rezil
Gava ku çiyê wêderê
- 5 Li ‘emelan tu hişyar be
Şev û rojan tu li kar be
Di ‘emrê rebbê cebbar be
Hem di şubh û hem êwarê
- 6 Nekeve nav fêl û hîlan
Nebe şerike sêfilan
Bo xwe peydake delîlan
Da nebî ji ehlê xusarê
- 7 Xusar nebît ew emanet
Li ‘umrê xwe neke xîyanet
Eger heşkî biçîye cennet
Bawirmend be bi qederê
- 8 Bawirmend be tu bi Xuda ra
Bi hemî katab û deftera ra
Ferqê nede pêxembera
Bi qeder û xêr û şerê
- 9 Tu bi cih bîne wan şertane
Li dev û destan bibê xudane
Di bin şahid li ser însanê
Roja diçiyê wê derê
- 10 Şeş rukun me gotîne
Di rêzê me da borîne
Ne bejê min hay jê nîne
Dêbî mesûlê wî xeberî

- 11 Îmanê tu ho binaye
Rûte ‘îbadet libas e
Vihê bo xwe bike esas e
Ew e xilasiya beşerî
- 12 Şehde û şewm û şelat
Fitre û hec û zekat
Xuda bo me kirne xelat
Emir bûye di roja bere
- 13 Nivêj stûna dînî ye
Ew miraca mu‘mînî ye
Her çiyê nekir dîn herifti ye
Dê rû reş bît li her derê
- 14 Dibe rûreş li cem şulţanî
Ew kesê nivêj nezanî
Yan terk kirî ji kiskanî
Bê îman dibît bi înkare
- 15 Nivêja me temîzî ye
Ji qirêjê ew paqijî ye
Ew xêrek e me‘newî ye
Guhdariya emrê cebbarî
- 16 Nivêj xêr e di wextî da
Bête kirin ji bo zatê Xuda
Xudan nûre di heşrê da
Ji ruyan rewneq dibarî
- 17 Ewê xudanê nivêjê
Na sojît bi agirê dojê
Hêram bûye di wê rojê
Li huzûra pêxemberî
- 18 Xudanê şewm û şelatan
Di gel cum‘e û cema‘etan
Megdûr nabît ev çî weqtan
Wekî di çîte mehşerê
- 19 Xudanê zekat û şewmê
Ew nakin çî cara şermê
Serfiraz e li nav qewmê
Wekî diçît bo huzûrê

- 20 Rojî girbe ji bo mewla ye
 Ew zekate heqê xuda ye
 Hêla ye ji bo feqîra ye
 Zû edake da bigehiye xêre
- 21 Guhde hedîsa pêgemberi ye
 Biheşt bi saya feqîrî ye
 Ewî şertî neke ji bîre
 Tu ji bîr neke wî feqîrî
- 22 Hec bi beden û hem bi mal e
 Tu ne bêje hêj zû şal e
 Min ne zewicandin ‘eyale
 Ew ferz e bila li te nebûrî
- 23 Şertê îslam û îmanê
 Bi cih bîne digel qur’anê
 Li xwe bigre tu ezmanê
 Nebe ji yêd geybet kirî
- 24 Ji heramiyû geybetê
 Ji riyakariyû hesedê
 Bi qerdarî neçe axretê
 Dê bi ji yêd zulûmkirî
- 25 Xwe bide paş ji zulm û zora
 Xirab adet û ewan tûra
 Bigre destê şil û kura
 Da bibî hewkarê feqîrî
- 26 Bibe dijberî zaliman
 Rûne li meclisa aliman
 Bi bergê xwe neke çaliman
 Da nebî ji ehlê fexarê
- 27 Fexrê neke nebe qud e
 Baş bi fikre kê m xeberde
 Ya guhlê bûy ji dew neberde
 Dibî xudanê zererê
- 28 Çi car neçe siyasetê
 Dê te bete hilaketê
 Di gel xwe neke xiyanetê
 Dê ji rastiyê bibî berî

- 29 ji rastiye cuda nebe
Li emanetî xain nebe
Xwedane soz û we'da xwe be
Li hedisê neke dijberî
- 30 Ewihê tu baş bizane
Bi cih bine sunetane
Nebe ji yet kislane
Ji ber de keshî kesere
- 31 Nebe keserdarê 'emelan
Hej kuwet mayî çok û milan
Bi cih bine fi'l û şelan
Hej ne hatî kal û pîrî
- 32 Çok û milan bi kar bine
Hindî dişêy tu bixwîne
Bike tehecud û ewwabîne
Ji weqtê borî ra bike girî
- 33 Bigrî ji bo weqtê xwalî
Bike qerî bike nalî
Tu neşêy biçîye lalî
Ji bo weqtî keserdarî
- 34 Qîmeta weqtî bizan e
Da tu nebî pêşîman e
Guhde soz û hedisan e
Hej zeman ne bûye êvarî
- 35 Qîmeta weqtî girîng e
Min nemane dest û ling e
Heft dert hene min gel cenge
Kerb webûn ji eqlê berê
- 36 Rabe li ser weqtê şewê
Mabeynekê bide xwewê
Eger te Xudayê xwe biwê
De biçîte qeyd û defterê
- 37 Deftera xwe tijî bike
Karê sefera dûr bike
Bo xwe hisabê hûr bike
Têr zad here bo sefere

- 38 Sefera me gelek dûr e
Rê li ser beħreke kûr e
Gemî gelek bi qusûr e
Ya reb tu bike tedbîrê
- 39 Sefer dûr e bo qebrê kûr e
Tejî têda mar û mûr e
Hewara me rebbê gefûr e
Tu were bo me li hewarê
- 40 Ya reb tu bo xatra nawê xwe ke
Me ji gunehkaran hesab neke
Gulordiyê jar jî bîr neke
Em nebin ruswa li meħserê

4 Were Gelo

- 1 Were gelo lezê bike
Ne keve xewa gefletê
Ji bo axretê karî bike
Nebe j'yêd dûrî rehmetê
- 2 Tu ji Xuda bi xwaze gufranê
Ne keve le'ba cîhanê
'Emelêt xwe û îmanê
Bike laiqê axretê
- 3 Îmandar be bi qur'anê
Di gel emran û peymanê
Were gelo di gel îmanê
Tu bo xudanê qudretê
- 4 Min hîvî ye ji zatê mewla
Dikem gazî Resûlullah
Ji bo xatra kelimullah
Biket ji ehlê hîdayetê
- 5 Hidayetê bikete nesîb
Kanê nebî kanê hebîb
Kanê Luqman kanê tebîb
Kanê xudanê şefa'etê
- 6 Kanê serwer kanê beşîr
Kanê resul kanê nezîr
Kan hebîbê heyî qedir
Kan rehberê 'eresatê

- 7 Kanê Ebûbekir kanê ‘Umer
 Kanê ‘Usman ‘Elî Heyder
 Kanê Telhe kanê zubejr
 Kanê emînê wê ummetê
- 8 Kanê Hemze kanê ‘Êbbas
 Kanê Bîlal Selman Faris
 Kanê Zeyd Îbnî Haris
 Kanê Mustecabê dawetê
- 9 Kanê Se‘ît kanê Cehfer
 Kanê Mus‘eb Îbnî ‘Umeyr
 Kanê Cu‘eyl Îbnî Dumeyr
 Kanê Abdurrehmanê biheştî
- 10 Ew her dehêt xudan mizgîn
 Di gel wan eşhabêt guzîn
 He di gel rewza mûtehrîn
 Em bibin tebayî wê heyetê
- 11 Hewsera Lût pêxemberî
 Di gel xiraban kir hevkarî
 Bi xirabiyê ne çiyê serî
 Wêran kir xanedana nubûwetê
- 12 Şeyê Eşhabûl-kehfan
 Ewî terk nekir xudan
 Di gel însani hate ezman
 Di gel wan bû biheştî
- 13 Ya rebbî şeyê şivanan
 Giheşte însana di gel xudan
 Bi ‘emrê Xuda hate lîsan
 Bu nûbedar li derê şkewtê
- 14 Ya rebbî ew sey e ez însan im
 Bi ism û cisman musulman im
 Xudan îman û qur’an im
 Ne key ji ehlê şeqawetê
- 15 Tu bo xatra ewan zata
 Pêxember û mu‘cîzata
 Şehabe û kiramata
 Wergirim ez bera‘etê

16 Ya rebbî ‘Ebdullah meku ‘ebdê te
Bûm şeyê eşhabê nebiye te
Ez ‘efû bibim li dergehê te
Xilas bibim ji zehmetê

⁵ Beḥsek Ji Dinyayê

1 Bikeyn beḥsek ji dinyayê
Ji wê mesken û serayê
Ye fanî û bê esas e
Ey gelê aqil şînas e

2 Eger bifikrî dê bîzanî
Tu bide xatira rehmanî
Xwe hişyar ke ji gefletê
Bike karî bo axretê

3 Şew û rojan tu bi karî be
Hindî bedenê te di karî
Hindî beden hebît sihet
Dest û piyan hebît qûwet

4 Bike tu zikra xudayî
Nebe ji ehlê paşve mayî
Nebe ji wan na ehla
Ji xirabkar û emel cehla

5 Xuda çawa kiriye ferman
Bi cih bîne emr û nehyan
Tu pêk bîne emrê barî
Hêj tu ne çiyê cihê tarî

6 Bike tewbe di weqtîda
Nebe rûreş di heşrê da
Were guh de neşîhetê
Bibe ji ehlê ‘îbadetî

7 Xuda însan daye da wî binaşî
Ne daye bibît e ‘aşî
Îte‘etya Xuda li ser me ferz e
Xuda ji ewelî kirye ‘erz e

8 Bibe mûṭî‘ ji bo Xudayî
Nebe munkîr li dinyayê
Ji rastîyê tu nebe cuda
Ta bo xatra navê Xuda

9 Tu nebe şîrîkê xiraba
Bigre xatira day û baba
Bibe tu ji ehlê xêra
Rehmet li day û babê guhdêra

⁶ Dikem Fîğan

1 Di zulmeta şewa tarî
Dikem fîğan dikem zarî
J'bürîna weqtê xwusarî
Bê fayde borî di zemanî

2 Bê fayde borî li me zeman
Em kewtîn e derd û geman
Ronkê çawan wekî çeman
We di barîn wek baranê

3 Mislê barana biharan
Rohnik nayêne qiraran
Di barîn im hemî caran
Bê fayde ye peşîmanî

4 Peşêman im bi xwusarî
Rojêt rohn û şevêt tarî
Dikem gazî û hewarî
Ah û fîğan çin 'esmanî

5 Şed fîğan û dad û meded
Hewar dikeme rebbê şemed
Deramanê derdan ew didet
Qebûl diket tewbê bi gufranî

6 Cihê 'efyê lalê wî ye
Min hewar û şed gazî ye
Em nabînîn cehnemî ye
'Efû bibin li wê cîhanê

⁷ Dunya Fanî

1 Hey dunya fanî û bê biha
Bo kes nebûyî cihê se'adetê
Tu xaînî li hemî ciha
Bû me bûyî cihê gefletê

2 Te em lêbandîn li hemî dera
Êxistin kul û kesera
Jêk dûr kirin bab û bira
Te em kirin nav hesretê

- 3 Te em gelek jêk dûr kirin
Te yêt nêzîk winda kirin
Day û ewlad jêk birkirin
Te birine cihê gurbetê
- 4 Bûyne gerib ji bo babê
Te ew birne nav turabê
Kî dê j'te pirsît hesabê
Ji geyrî Şahê Qudretê
- 5 Bi qudreta şahê mezin
Hindî heyî însan û cin
Hemî j'te di xwaric in
Teyr û mar û mûr û wehşetê
- 6 Ew teyrû wehşû digerin
Xuda hemî j'te çêkirin
Dayî te rûyekê şirin
Kes j'te neket lewmetê
- 7 Kes nîne bêyî te bijî
Bab û biran bo te dikûjî
Îman û dînan bi te difiroşî
Tu ji nahilgirî çî minnete
- 8 Tu nahêlî çî kesana
Ji erdî heta asumana
Ji cin û wehş û însana
Tu di beye tarî û zulmetê
- 9 Tu dibeye nav toz û gebrê
Bo kes tu nakeyî şebrê
Pêxember j'te birine qebrê
Bûne rêving bo axretê
- 10 Pêxember û heta şehaban
Ne his û dost û ehbaban
Ji çakan hetta ku xiraban
Te ne hêlan li ser erdî
- 11 Çî 'inşaf nîne di gel te da
Gelek bo te bûne feda
Te qurt kirin di zikê xwe da
Behr û muhîta heyretê

12 Te gelek yê winda kirî
Di zikê xwe da qurda kirî
Gulordiyê jar bo xwe bigrî
Tu ji wexte biçî ye rişmetê

⁸Da bi pirsin

1 Da bi pirsin ji dunyayê
Dîn wê li me bûye xela
Kewtin e zewq û şefayê
Me terk kirin bang û şela

2 Bang û şela me terk kirin
Cum'a û cema'et nekirin
Helal û haram ferq nekirin
Şerab vexwar bi peyala

3 Vexwarinê bûye reqî
Mela hemî bûne feqî
Nema di dunyayê heqî
Şebir nema ewan Mela

4 Wan 'aliman nema şebir
Şerî'etî nema qedir
Hesûdî û buxl û gëdir
Li me barîn derd û bela

5 Derd û elem li me barîn
Bey'û şiran hilekarîn
Di serxweş û ne hişyar in
Bi gefletê em mubtela

6 Em yê kewtine gefletê
Daîm wê dikeyin geybetê
Nekêş e tu wê zehmetê
Tewbe bike ey 'Ebdullah

⁹Hatime Dergahê Rehmet

1 Hatime ber dergahê rehetmet
Pur xeta û zor hewcem e
Bi gunah û terke 'ibadet
Ez rûreş û şermîn dem e

2 Ez li xwe bê bûme xaîn
Min nehêlan însaf û dîn
Hem bê 'emel û muznibîn
Ez êxsîrê nefsa xwe me

3 Êxsîrê nefsa xirab im
Bê nesîb û bê sewab im
Dê ji dostê xwe cuda bim
Ez pişmanê fi'lê xwe me

4 Peşêmanê wan fêl û hîlan
Hevkariya pîs û bexîlan
Dê ji ku bînim delîlan
Ya Reb li hîvya 'efya te me

5 May me ez li hîvya gufranê
Bidete min piçeke îmanê
Rûreş ne nebim li meydanê
Ez li benda rehma te me

7 Bendewar im ji bo rehîmê
Min nîne qûwweta curme
Dê çikem li pêşî qewmê
Tuleê dergahê te me

8 Te rehîm ji qehrê pitirî
Min nîne taba agirî
Bi herdu çawa dikem e girî
Li ber dergê edla te me

¹⁰ Di nav agirê dilda

1 Di nav agirê dilda me ez
Di şoj im şuphê perwanê
Bi soz û qeyd û bendan
Were carek bi peymanê

2 Bi dîtina çawan wekî findê
Di helyim ez şev û rojan
Di weşla te nezerdar bim
Payidar bim li vê cîhanê

3 Nezerdar bim bi çeşmê dil
Bi bînim pêşber muqabil
Cemabin fikr û hizrê min
Bibînît sîne dermanê

4 Fikr û bîr li min bûne telef
Nîne carek bêtin bi xef
Cerg û dil li min kirne hedef
Tîr daye mala guwanî

- 5 Bi şuph û seyd û nêçîrê
Di bînim xencer û tîrê
Ji destê dîlbera nûrê
Wekî yîgma û talanê
- 6 Bi yeğma tête ganê min
Bi talan tête malê min
Ew e qest e bo canê min
Ruh fidayê li meydanê
- 7 Ruğ û dil li min kirne talan
Kirme êxsîr wek evdalan
Dûr kirim ji dost û hevalan
Bûme seferî li wê cîhanê

¹¹ Çûna Taziye

- 1 Rabûm bi qesta taziye
Ez çime hewşa mizgeftê
Rûnişt im li ser kursiye
Min serxweşî da malbatê
- 2 Piştî sax û selametan
Kewtîne xebirdan û şuhbetan
Me dest havête şîretan
Behsê mirin û axretê
- 3 Me behsek kir ji mirînê
Bo wî wextê dimînin bitinê
Çi lazim e ji bo wê dinê
Min dî yek diket îşaretê
- 4 Îşaretan didete min
Hatî heta ber kursiya min
Ew çemya ber guhê min
Şerim nekir ji ber cema'etê
- 5 Ez rabûm ji cihê xwe
Min şerim kir ji halê xwe
Çime lalî hevalê xwe
Tu çi dibêjî bi vê îşaretê
- 6 Ew e min teqsî îna ye
Kurê min ewro zava ye
Cema'et li hîvya te ma ye
Emdê biçîne dawetê

- 7 Babê zava birim ji camiyê
Hilgirtim ez bi teqsiyê
Ez birime cihê şahiyê
Kewtine nav gedawetê
- 8 Giheştin nav dawetiyan
Siwar bûn em li teqsiyan
Kewtîne ser cahd û riyân
Em çine cihê gefletê
- 9 Xweş li me kirin pêşwazî
Hind bi zurna hind bi sazî
Hind tlîlî hind bi gazî
Rûniştîne nik heyetê
- 10 Piştî sax û selaman
Rûniştin bi guft û kelaman
Di gel nas û xas û ‘aman
Kewtîne xweş sûhbetê
- 11 Rûniştin em sira sira
Hind li ber sihê hind çadira
Pîr û can û jin û mêra
Ew li cihê naken tebatê
- 12 Çend sûhbetek pêkwe kirin
Saz û zurna bikar kirin
Govenda xwe rastve kirin
Were bibine wê îbretê
- 13 ‘Îbreta dijberî ‘adet
Qamek tazî ya dî dawet
Kê dîtiye ew bê necabet
Mirov bi ‘eqlî rê nabetê
- 14 Ewe şola ‘eqlî nîne
Hind bi şînin hind şahine
Hind bi girî hind bi kenîne
Lew kewtîne muşkîlatê
- 15 Muşkîlat li me di barîn
Em di gel yek du neyarîn
Bê ‘emel û xirab karîn
Lew nabînin se‘adetê

- 16 Se'adet nebûye nesîb
Bê îlaç mayne bê tebîb
Li cîhanê bûyne gerîb
Kewtine nav vê mihnetê
- 17 Pur mihnet û zeħmet kêşî
Şed êş û kuwan nexweşî
Bê kesp û kar û berdoşî
Em kewtîne nav ھesretê
- 18 ھesret kêş û dil birinin
Herdu çawan bi girînin
Em ronahîyekê nabînîn
Kewtîne beħra ھeyretê
- 19 Em li şolan di ھeyirin
Dûmahiyê nafikirin
Hemî ji yekûdu meztirin
Hatîne ser wî ھاletê
- 20 Çi ھاłek baş me nîne
Ne kesp û kar û ne zanîne
Hemî wexta dûmahîne
Em wê nakeyîn çi xebatê
- 21 Riya xebatê me çû nîne
Leşê me bi derd û birîne
Kesê hay ji kesê nîne
Bi xêr nakeyn kelîmatê
- 22 Tekelluma xêrê me nîne
Hemî aĝa yek xulam nîne
Yek bigotina yekê nîne
Kewtîne ھاletê memmatê
- 23 Çi ھاłekê xirab kare
Dîn û îman bûne par e
Me ne şulھ e ne reftar e
Bêzar bûne ji ھeyatê
- 24 ھeyat zor e nema xweşî
Tu dil kulî bi derd û êşî
Bi êş û elema û nexweşî
Xuda bidetin necatê

¹² Gula ‘Umri

- 1
Gula ‘umrê min şîn bû
Di di feşla vê biharê
Bêhn û bûya wê xweş bû
Wek sûsina li nizarî
- 2
Bilbil li ber serxweş bû
Di xwûnît fiğan û zarî
Havîn hat û ku zerbû
Nizan im bikem çi çarê
- 3
Payîz dê bêt û hişk bû
Ji ber kewtime xusarê
Dê şîn bitin ji nû ve
Dê carek dî bête diyarê
- 4
Gula ‘umr’i darek e
Li ser jîna heyatê
Fêqî didek carekê
Eslê wê ji xak û av tê
- 5
Hijyana wê zikrek e
Ew diket teşbîhatê
Xwarina wê karek e
Her çi yê bizanît qîmetê
- 6
Her çiyê qîmet şunas e
Dê bizanît li dunyayê
Nakin ‘umrê iflas e
Wekî xerman daye bayî
- 7
Ne xwarin û ne libas e
Li we mesken û serayê
Ne bê ûsta û esas e
Heta heya kata giyayî
- 8
Ew ûstayek zor xwas e
Her tişt çêkir békêmayî
Bê nûqşan û kêmas e
Ku ew nî‘metê wî dayî
- 9
Neqşê danay eþles e
Erđ û esman ta fezayê
Ew qise êdî bes e
Em lê bikeyn dûmayî

10 Şin‘et ji şani‘ binas e
Tu bike zikra Xudayî
Bike mu‘mînek xwas e
Ya Reb tu ‘Ebdullayî

13 Were dil û bo min beje

1 Were dil û bo min bêje
Kanê bo çi her tu dinalî
Te neşev e te ne roj e
Dikey gazî wek evdalî

2 Te nema wextê xweşiyê
Tu ji bîr bike cuwaniyê
‘Umir hate dûmahiyê
Tu pîrekî êdî kalî

3 Tu kalekî beden şistî
Derd û êşan tu êxistî
Bo halê xwe narawestî
Qebûl nakî ewî halî

4 Ewî halî tu bike qebûl
Çok werisyan mil bûne xwûl
‘Umir geha wextê zelûl
Bûye êxsîr nava malê

5 Bûye êxsîr li nava xanî
Li te nema xweşya canî
‘Umir borî bi xusranî
Êdî te nema wextê xalî

6 Te wext nema dikî gazî
Dunya nebûye cihê mirazê
Ji bo axret bike daxwazê
Hewar bike rebbî ‘alî

7 Hewar dikem ji rebbê barî
Ji derd û êşan biket ‘arî
Bête hewara ewî jarî
Derman ket derdê wî ewdalî

8 Lal û kerim ez kûr û gêj
Bûme ‘ebdal babe derwêş
Hindî hebin min derd û êş
Min qebûl in ji zul-celalî

9 Min qebûl in nakem gazinda
Ger bişoj im wek mûm û finda
Razî me ez mam li benda
Li min nabî nexweş û ʔalî

10 Nexweş û ʔalî tîn ji Xudayî
‘Emr û fermanêt wî dayî
Li ser serê min ez gedayî
Dê qebûl kem bi hevalî

11 Bawermend im bi xêr û şerê
Me îman înaye bi qederê
Dê biçine ser eşlê berê
Wextê ecel di bîte halî

12 Wextê ecel hal bû li cîhanê
‘Emir hat ji bal rehmanî
Ruş cuda bû ji cismê fanî
Kes neşêt biket qîl û qalê

13 Bi qîl û qalan kes nikar e
Ew ‘emrê rebbê cebbar e
Mirinê nînin çî çare
Gava ‘izraîl tête lalî

14 Çî tedbir nînin mirinê
Kes muflîş neçît li vê dine
Hebît kare roja bitine
Çare nîne wî ehwâlî

15 Kar û ‘emel me çî nînin
Dest xwalî û dil birînin
Ji rehma wî bê umîd nînin
Hewara me li cem rebbê alî

16 Bes e feqîr tu çend jarî
Te umir borand bi xusarî
Piştî pîriyê rabûye karî
Bi wî ‘umrê heftê şalî

¹⁴ **Serguzeştaya Seyda**

1 Rojek ji rojêt Xudayî
Li gundê me yê nav çiyayî
Di bera hizar û nehşedê
Berê xwe bide wê hikmetê

- 2 Xuda çawa bikete teqdîr
Kes neşêt biketin teğyîr
Zarokek çaw li dunyayê vekir
Ew binavê Huseynî nav kir
- 3 Paşê çend şalan bi dûra
Birayek hatî jê ra
Ew Huseyîn yedî Hesen
Pêkve jiyan bikeyf û ken
- 4 Çend şalan pêkve jiyan kirin
Day û babêt wan lê mirin
Bûne êtîm bê xwedî man
Ew kewtine derd û geman
- 5 Paşê seferberlîk rabû
Xelkê cih û warê xwe berda bû
Bi zehmet û gelek zorî
Berê xwe dane başûrî
- 6 Li 'Îraqê li Kurdistanê
Bûne feqe li dibistanê
Çend wextekî man li wî welatî
Berê xwe dane rojhilatê
- 7 Paşê ew çûne Îranê
Li xaneqa Şêxê Burhanê
Bûne feqî ew li medresê
Ser narabît ji ber dersê
- 8 Bi çend şalan li wêrê mayî
Herba cîhanê bû dûmayî
Ew zivirîn bo welatî
Dest dane kar û xebatê
- 9 Mamek hebû wan Mela Mihyedin
Gotê ey feqî Huseyîn
Min ji bo te fikrek wekirî
Da biçîne cem melayê dirî
- 10 Ew gelek xudan 'ilm û huner
Belkî tu qebûl bikî eger
Çend şalan li wêrê bimîne
Li cem seydayî bixwûne

- 11 Çû cem Mela ‘Ebdul Mecîdî
Ustadekî zor berkewtî
Bi şalan ma li nik seydayî
Bû ew nehingê di dunyayê
- 12 Paşê bo xwe qebûl kir zava
Şed caran mala wî ava
Kiça xwe Gulşah Xanim dayê
Bû xudan mala dunyayê
- 13 Ew çî li cem Şahî bû qazî
Her kes ji ‘ilmê wî yê razî
Paşê xwe da bû siyasetê
Çû cem qaziyê Mahabatê
- 14 Li nik qazî bi cih bû bişadî
Li wêrê ew bû wezîrê dadî
Cih girt li komara mahabatê
Ew bû wezîrê ‘edaletê
- 15 Ji ew paş Êrisê bê bawer
Komara wan lê xirab kir
Şahê Îranê pehlewî
Hucûmek î nabû zor qewî
- 16 Qazî dil girt û mehkûm kir
Li meydana çarçira ‘îdamkir
Gelek wextî ew ma bitirs
Paşê li Îranê ew bû muderis
- 17 Çend sal borîn bi wî halî
Çî wextê wî nedima xwalî
Bi emirnama Şahê îranê
Carek dî bû Qazî li Kurdistanê
- 18 Gelek şalan ew ma bû qazî
Çî car bi wê hukmê nebû razî
Bi xwe kewte nav fikra û xiyalan
Bi roj û gav û meh û şalan
- 19 Qirar kir bo xwe bi seferê
Qest kete welatê berê
Ku welatê bab û bapîran
Xweş tire ji Şam û Cizîran

- 20 Hat bo gundê xwe yê berê
Bi cih bûn ew li Geverê
Heta şala nehwed û siya
Ew li qeza Geverê jiya
- 21 Di bîst û yekê meha adarê
Di serê feşla biharê
Ferman kir xwedanê qirar û sozê
'Emri heq bû di şeva newrozê
- 22 Bi teqrîb 'umrek şed şalî
Bi teqdîra xaliqê zulcelalî
Ecel hal bu bi 'emrê rebbê qedîr
Ruħ wegerya bal meqamê kebîr
- 23 Xilaş bû 'umrê wî yê dunyayê
Bo wî hat wextê çîna uqbayê
Ruħa wî cuda bû ji cismê fanî
Ew çî ber dilovaniya rehmanî
- 24 Ya reb hindî ku hebîn belgê daran
Hindî xîzê li dev rûbaran
Hindî heyî qetreyêt baranê
Di weresyin ji 'esmanî
- 25 Ya reb em hind rehmetan dixwazîn
Ji bo ustadê me yê muderisê mezin
Ya rebb bi rehmeta xwe bigehîne ruħa wî
Em bê behre nemînîn ji 'ilmê wî
- 26 Guh bidêrin li binerin tu bira ey serwer
Ew 'emele çî xêr bîtin we ya şer
Hindî tiştê min bihistî min zanî
Min hemî gotin ew bi lisanî
- 27 Ez du'a dikem li dergahê xuda
Me ji rehîm û 'edaleta xwe neket cuda
Du'a min ji lutfa zatê barî
Wekî em diçîne cihê tarî
- 28 Hîvî dikem em nemînîne rusiya
Ne ji mucrîm û ne ji asiya
Ya reb tu bo xatra zatê zul-celalî
Ne mînin pişmanî bi destê xalî

29 Di wê roja heşrê em li meydanê
Wextê hesabê li ser terezîya mîzanê
Rûreş nemînin em şermîzar
Qerdar nemînin em gunehkar

30 Ew e serguzeşta ustad seydayî
Me got û tamam bû dibû dûmahî
Bi zanîn rêzê minşêst û sê ne
Bi hesab û ûmrê hebîbê Xudê ne

31 Hîvî dikem ji 'eqil şunasa
'Efu ken ewan kêr û kasa
Min nivîsî ye bicahil û nezânî
Tê da hene gelek nuqsanî

32 Niha ez nexweşekî zor bê tabim
Min xwe mujîl kir dayê tenabim
Xeletî gelek têda wê hene
Rica min ji te ew e pê nekene

15 Seydayê Min

1 Seydayê mim Mela Husên
Rehîma Xuda li giyanê te bî
Beheşt bo te bibî mesken
Cennet 'eden cihê te bî

2 Tu seydayê hemî 'aliman
Qazîyê hemî hakimî
Mertalê dijber zaliman
Şehadet merteba te bî

3 Wekî roja Kurdistanê
Şefqa te da bû cîhanê
Heta axirê zemanê
Dewama wê dê her hebî

4 Ew 'ilmê wekî deryayê
Te belavkire dinyayê
Bo vî eşrî tu dehayî
'Îlmê Qur'an di gel te bî

5 Ew 'ilmê wekî xizîne
Te vekir dergê zanîne
Tu bûy muceddîdê dînî
Bağê îrem te behre bî

- 6 'İlmê fen û şerî'etî
 Hukmê hedîs û ayetê
 Belavkire vî milletî
 Bi Kurmancî û erebî
- 7 Bi Tirkî û bi Farisî
 Ji bo nebî tu warisî
 Çend 'aliman ji te dipirsî
 Tacê 'ilmî li serê te bî
- 8 Bo zanînê bûye rehber
 Li nik te bûn 'ilm û huner
 Te cih li ser hewza kewser
 Di gel Muhemmedê nebî
- 9 Gulordiyê me yê alî
 'Umir borî bû şedşalî
 Bo 'ilmê te alem dinalî
 Cihê te di qelbê me bî

¹⁶ Dil Birîn

- 1 Dilê min ji Kûrda birine
 Ah û fiğân naken karî
 Dermanê dil min çinîne
 Roja rohn li me bû tarî
- 2 Roja rohn li me winda bû
 Bereketa 'ilmî ji nav me rabû
 Ustadê me ji me cuda bû
 Stûxwar mayne li ber dîwara
- 3 Stûxwar mayne em bê xwedî
 Di 'ilmê fen û şerî'etî
 Mislê ustad me kes nedî
 Di hukman da bide biryarê
- 4 Hukmê hedîs û Quranê
 Felsefe û fena cîhanê
 Wek bedî'e zemanê
 Kutûpxwaneka seyarî
- 5 Ew bi mislê kutûpxwanê
 Aciz nedibû ji cewab dane
 Wesa deng dabû cîhanê
 Kes me nedî bi wî kare

6 Kes me nedî wek wî bişebir
Xudan ‘ilm û Xudan qedîr
Hîsaba kîmya û cebir
Bi fizik û tîbbê xeberdarî

7 Bi tîbb û aştromiyê
Bi terîx û coğrafîyê
Hendese û jeolojiye
Di hemîyanda endazyarî

8 Endezyarekî cîhanî
‘Îlm û hikmet te di zanî
Me çi ji ‘ilmê te nezanî
Bi pêşemanî û xusarî

9 Bo me maye peşêmanî
Tu naşnabî bi ezmanî
Filozofekî cîhanî
Bîbi laîq lutfa barî

10 Bibî laîq rehîma Xuda
Ew weşvêt di besta me da
Ji rastiyê nînin cuda
Xuda tu pê agahdarî

11 Xuda ‘ilm û fikir pê dabû
Ji ‘alimêt di cuda bû
Ew xwaşî rîya Xuda bû
Lew meşhur bû li wî diyarî

12 Ez ji Xuda hîvîdar im
Nexweşekê merezdar im
Bi derd û êşam ez nikarim
Rehmê biket li wî yarî

¹⁷ Seydayê Mela Ehmed

1 Were dunya tu çawanî
Nabî ye dost di gel kesê da
Bezîr dikî bi penhanî
Kes ne hêla di wê dinê da

2 Tu bo kesê nabîye hewal
Yêt gel te borandî hizar şal
Te neda wa jî çi mecal
Te çal kirin di erdî da

- 3 Te ne şêx hêlan ne welî
Ne alimhêlan ne delî
Te ew hemî kirine xwelî
Bezîr kirin di nav gebrê da
- 4 Di nav tozê da bezîr kirin
Hemî bê pîsyar te birin
Te bi mirinê nav kirin
Di helgire di gavê da
- 5 Tu bo kesê nebû ye meded
Ka stêra Gulord Mela Ehemmed
Kanê ew 'ilm û şerî'et
Te ew jî li me kire cuda
- 6 Xudanê zanîn û îlmê
Bi wê şewqetê bi wê rehîmê
Te nehêla li nav qewmê
Ew bû kuwan di dilê me da
- 7 Bûye kuwan li ser dilê me
Ew tine nebû melayê me
Roj bû ew li welatê me
'Abidek bû li dinê de
- 8 Xudanê wer û teqwayê
Mala wî wekî tekyayê
Hemyan bera xwe di daye
Xanqa bû li wî muhîti de
- 9 Xudanê fiqh û feşahetê
Bi xîtab û belağetê
Xudanê rehîm û 'edaletê
Zor bi qîmet bû di nav qewmî da
- 10 Di nav qewmî da ronahî bû
Bo muhîti bînahî bû
Bi şîkl û fi'lan ew welî bû
Ew mutteqî bû di dinê da
- 11 Yarî kare feqîr û jara
Di gel dostan û neyara
Çi car nedibû cudakara
Bo wî yekbûn di rehîmê da

12 Eḥmedê soft Xelîl
Ji bo ‘alemê bibû delîl
Ji wî digirtin fikr û ‘eqîl
Wefat bû ew pişt şedê da

18 Were carek tu Leylayî

1 Were carek tu Leylayê
Bigerîn em pêkve li dunyayê
Min daxwaze te bibinim
Li te binêrim li ber serayê

2 Keserdar û dil birinim
Demek li nik te ez rûnim
Şuḥbetekê bi hev bikeyn
Xemê dilan bi revenin

3 Xema dilê min gelek e
Ne hindik e ne gavek e
Demek tu şebra min bîne
Ew jî ji bo na te xêrek e

4 Eger te hebît dilê xêre
Carek were nik min li wêrê
Were dilê min tu xweş bike
Çêtir e ji çûna mizgevtê û dêrê

5 Were carek bikeyn geştê
Bigerîn em li nava deştê
Min daxwaze ji rebbê mezin
Bi gehime ber teniştê

6 Li nik te ez rûnim carek
Ji eşqê tu bide parek
Di dunyayê li min bes e
Li axretê bît mubarek

7 Mubarek bît bi xemla xwe
Were carek bi şemla xwe
Bi wî ḥalî te bibinim
Min qebûl e mirina xwe

8 Bi xemla xwe dibî xuya
Bisk berdane li ser rûya
Yêt mislê min te dîn kirin
Mal terk kirin çûne çiya

9 Çine çiya wek ebteran
Bûne wehşî li wan deran
Te ez kirme kolê êxsîr
Kul danane ser keseran

10 Kul û derd li min civîn
Li min nehatî bû evin
Ma bes nîne te ey zâlim
Her û dikem ah û girîn

11 Ah û fiğan dikem zarî
Ji çavêt min xwîn dibarî
Nehatiye rehmê digel min
Îdar nabît bi wî karî

12 Naçî serî bi wî rengî
Dilbendê heta kengî
Ne bes bît gerîb Gulordî
Wexte biçî tu bê dengî

19 Were dilber

1 Were dîlber bi bejna şîrîn
Bibînim ez cemala te
Dîwana gerîb û aşîqîn
Binivîsim bi ‘eşqa te

2 Ji ‘eşqa te ezê dînim
Her û carek te nabînim
Xeman di gel te birevînim
Şev û rojan bi xiyala te

3 Şev û rojan tu li min xiyal
Were şîrîn dosta delal
Diyar bikin ew zulf û xal
Min daxwaze dîtina te

4 Min daxwaze te bibînim
Tuyî Leyla ez Mecnûn im
Obe obe digêrînim
Belkû bibînim bala te

5 Belkû peydakem ez yarê
Felek bibî dost wê carê
Di gel min bigrît qîrarê
Kewtime ber tûr û bextê te

6 Çi bê bextî pursê nakî
Birînêt min derman nakî
Çi car rehmê di gel min nakî
Ronahiyek bê te dilê te

7 Dilê te carek hişyar bît
Nûra Xuda lê îzhar bît
Belkê di gel min qerar bît
Cefayê nebinim ji destê te

8 Ji destê te nebînim cefayê
Di gel min bike tu wefayê
'Ehdê dikem bo Xudayî
Serî dê danime rêka te

9 Serê Xwe dê bikem gorî
Perî rûya şifet hûrî
Şûndê dixwem bi rebbê jorî
Min kes nedîtîye şubhê te

10 Kes min nedît şubhê te bît
Bi qed û bala rûmet spî
Ew reng perî di dinê hebî
Çi nînin qet ji geyrî te

11 Hêşa hebin wek te beşer
Rûşorgul û şubhe qemer
Bejin bilind û leb şeker
Tu nabî bûm qatîlê te

12 Evîndar! bese ne bejê
Kula dilê xwe nerêje
Derdê 'îşqê gelek ji mêje
Bitine nehatiye serê te

²⁰ **Bejna wek selwê**

1 Min bejneke dît wek û selwê
Di hijyîtin di nav bağî da
Di gel min nakinin xelwê
Ku bikem gelo kirim sewda

2 Kirim sewda kirim mecnun
Bi nav çeşmêt eswed 'uyûn
Cerg û mêlak li min kire xwûn
Tîra qewsî li dilê min da

- 3 Tu li min digirî stêrê
Nîne ewê cihê xêrê
Her gava te dest li ser kêrê
Min keybir key di gavê da
- 4 Ew derba te li min dayî
Ew çavêt reş te kildayî
Ew reş kezî te berdayî
Bûne ejderha bi min ve da
- 5 Wan reş maran ku ez geztim
Bi zilfa xwe te ez bestim
Xal û xetan ez êxistim
Wan turincêt bagê te da
- 6 Ew çi narinc in çi xox in
Ew çi sêwin ew çi şoxin
'Aşiqan ji dûr we di êxin
Çi girtine di singê te da
- 7 Ku ew bagê te avda yî
Ew armîşê te dada yî
Ew çi biskin te bada yî
Li eser rüyan rewneq veda
- 8 Ew sûretê rewneq dayî
Wekî heyva li çardayî
Qelbê tarî diket rûnahî
Min xwe dît di rûyê teda
- 9 Ew rûmetê wey şor û zer
Ew çavêt reş birû li ser
Bi difna ziraf xizêm li ser
Enya spî xw'unav veda
- 10 Enî geş û rûmet gulî
Birû reş û xal filfilî
Guhar şorbûne ser milî
Dur û şedef di devê te da
- 11 Dur û şedef te bijartin
Lêvêt tenik te bizavtin
Misk û 'enber lê rêşandin
Destê nazik te xena da

- 12 Destê nazik te şor kirin
Tilyê zirav gustîl kirin
Dilê dostan birin kirin
Bejin zirav eyles berda
- 13 Bejin bilind navteng zirav
Xal gerden û rûmet xwûnav
Lêvêt tenik sedef di nav
Şeker barand li ser me da
- 14 Ji lêvêt wê şekir dibarî
Ew tiliyêt qaş mirarî
Rehmê bike di gel vî jarî
Ma ‘inşaf nemaye di gel te da
- 13 Dilê xwe bi ‘inşaf bîne
Ew weşfêt te me gotîne
Zekata heqqîyê nîne
Hindî mabûn di zêhna mi da
- 14 Hindî wesfêt te dibêjim
Ji derde te ker û gêjim
Nisaxekê bi derd û eşim
Me xem danan bi ser kula da
- 15 Li min civîn derd û elem
Eda neman çok û qedem
Di gel derdan bûme hemdem
Me li dunyayê maye êdî veda
- 16 Beske gerîb tû ji vane
Ne bêje tu wa tiştane
Ew derdekî bê dermane
‘Îşq bela ye di serê te da

²¹ **Yara delal**

- 1 Min yareke delal heye
Rû sorgulek bi xal heye
Reng şepalek pak heye
Carna tête şuhbetê
- 2 Şuhbet dekeyn bi ‘işq û evin
Dest dene hev em digerîn
Maçek ji lêvêt şekirîn
Tu li min bike wê minetê

- 3 Minnet ket û şîrîna min
Ewîn û xem revîna min
Were hevpar be di jîna min
Gerden zer û rû mîratî
- 4 Bi xeml û xal û evînî
Herdem dilê min da dimînî
Were carek bi mizgînî
Li ser çavêt min tu hatî
- 5 Hatina te pîroz bikeyn
Serşal û nevrozan bikeyn
De‘wetîyan qebûl bikeyn
Bi mêhvanî di şevberatî
- 6 Xwezîya carek li te bûme mêhvan
Ramûsanek ji herd û levan
Dest havêtba bi sing û sêvan
Bi min xweştir bû ji ava heyatê
- 7 Heyat ewe bi ‘îşqa evin
Ramûsanek ji lêvêt şîrîn
Wan sûretêt wek hingivîn
Bi tamtîrin ji qend û nebatê
- 8 Şeker û qend û nebata min
Were rind û şepala min
Evîn û çav xezala min
Dûr nemînim dem û sa‘etê
- 9 Ji dûriya te nakem tabê
Xweş kelamê mah û tabê
Carek di gel min bike xîtabê
Dikem feryad ji firqetê
- 10 Dikem feryad dikem gazî
Bi min şîrîn û şehbazî
Ew çî ye tu ji min dixwazî
Di bera ‘eyd û ‘erafatê
- 11 Li min ‘îde te bibînim
Dest gerdena zer werînim
Perde li ser rûyî hilînim
Ramûsanek ji xal û xetê

12 Wan rûmet û xal û xetan
Biskan wedem li ser sûretan
Lê binêrim bi se'etan
Bi min xweştir ji çina cennete

13 Beheştta min di gel te ye
Bê te biheşt bê fayde ye
Qûnağa min li cem te ye
Eger biçî zulûmatê

14 Werê dostê wek û berê
Pêk ve bigerîn li her derê
Di gel te dê ixtiyar kem
Bêyî te naçime cennetê

15 Cennet min daye di riya te
Bo min xweş nîne ew bêyî te
Min hûrî dît li ser rûyê te
Wextê bê roja mematê

16 Wefat heq e dêbêt nêzîk
Paşa û beg mîr û mulûk
'Aşiq feqîr mezin biçik
Dê wexwen ew wê şerbet

17 Şerbeta mergî ye şal e
'Ebdullah pê bibe hal e
Te 'umir bû heftê şal e
Li te hat wextê mematê

22 Li ser derdê 'eşqê

1 Ez bûm 'aşiqê bejna te
Ey dîlbera rast û durist
Tîra bijehr li ser destê te
Li cergê min da rûh derêxist

2 Ew rûha ku di min da mayî
Sebebê lufta Xudayî
Yek car nezer te berdayî
Kire epter ji rê der êxistî

3 Ebter kirim zor şuphê min
Nedî jîna nedî mirin
Ne ta'te nezikir kirin
Ji riya heqiyê derêxist

- 4 Ji rêya heqiyê dûr kirim
Reng ebleh û feqîr kirim
Ji dost û biran te dûr kirim
'Eqil ji serê min der êxist
- 5 'Eqil nema ji ber wê belayê
Dîn bû mecnun ba Leylayê
Wekû Tahir bo Zehrayê
Ferhat bo Şîrînê ruh der êxist
- 6 Ferhat Şîrîna xwe windakir
Ewî qesta canê xwe kir
Kerem bo Eşliyê çî kir
Ruha xwe bi sotin derxist
- 7 Binarê sot û bo xwelî
Bera xwe bide Yûnisê welî
Ji 'eşqa Xuda bibû delî
Ser biç ol û çîyan êxist
- 8 Bera xwe da çol û çîya
Memê Alan Zînêt viya
Qeyd û zincîr kirne piya
Bo zîndanê ew werêxist
- 9 Birin havêtine çalê
Heta hepiskeha salê
Zînê qest kir bo wîsalê
Ceset bêruh bû der êxist
- 10 Bo mezeran cesed birin
Ne di tirsîyan ku dê mirin
Xwe di rêka 'eşqê feda kirin
Ewan dunya paş xwe êxist
- 11 Ewan kir terka dunyayê
Bûne seferî ba 'uqbayê
Keremek bû Xuda daye
Ewan axret pêş xwe êxist
- 12 Dunya terkir wan bi merdî
Melek bo wan bûn dawetî
Belkê tu jî bi 'eqil kewtî
Xirabî te paş xwe êxist

²³ Bejna êsmerê

- 1
Min dît bejna te esmerê
Li nav bağî xwe di hejînî
Were dostê wekû berê
Tu bo çi xwe dinazînî
- 2
Neke nazan li min tu yar
Ew soza te li gel min qîrar
Bigre tu wekî hemî car
Sotim gelo tu na bînî
- 3
Sotim te ez wekû fîndê
Ew çi zerbîn tu li mindî
Enguşteriyek te min dî
Qaşa li serê nigînê
- 4
Qaş nigîna wekî zerî
Bo çi bera xwe ji min wergêrî
Xal û xetan li min diveşerî
Rûyê xwe li min te şîrînê
- 5
Rûyê xwe li min te kir star
Çi ‘aşîqan nîne înkâr
Ji geyrî wan yarêt gerezdar
Ewan ‘eyban tu wê dibînî
- 6
Ewên li xwe diken şerm
Ez wekû teyrê bê perim
Ji bo dîtina te dil keser im
Ma tu heqiyê nabînî
- 7
Heqî nema di gel te da
Ew çi kîne di dilê te da
Were tu bo navê Xuda
Belkû ji dilê xwe derbînî
- 8
Ji dilê xwe tu derpêxe
Fîrsetekê ber min pêxe
Ji wê cefayê min der êxe
Wî halê min tu wê dibînî
- 9
Çi halekê xweş li min nema
Rohnikên çava wek çema
Di barînim hemî dema
Wekû wî ‘ewrê baranê

10 Wekû barana bihara
Derya j'ewran hate xwara
Sosin şîn kir li nizara
Bo me kewa li çolê dixwûnin

11 Bûme kewa keftî davê
Keftiye ber min bi nêçîr û ravê
Çaw û buryan li min dihilavî
Cerg û dila li min dihelînî

12 Cerg û mêlak li min helandin
Dil û beden li min kelandin
Birînêt min te eşandin
Her gav tu xwê lêt direşînî

13 Her gav birin li min xwê kir
Tijî qelbê min atêş kir
Dilê birin te bi êş kir
Xwe di ber min ra dihejînî

14 Xwe dihejînî bi qameta şeng
Bidî bayê xwe yê heftreng
Pirsek li min bike carek
Te kirme mehkûm û zîndanî

15 Hêpis kirim wek êxsîran
Êxistime qeyd û zincîran
Nîne pirsek li feqîran
Qed li bîra xwe naînî

16 Zanim laîq pûrsê nîne
Belkû ji bîr kirî me
Hivî dikem ji rebbê rehîme
'Efû ket ewî nezanî

²³ Min zeryek dît li gundî

1 Min zeryek dît li gundî
Wê jê têtin bêhna gula
Bejîn zirav û bilindî
Xwe dihejînî bi 'eşqa dila

2 Ser guvendê dikişînî
Ew desmalê wê dihejînî
Çavêt belek li min niqînî
Li cergê min tînî kula

3 Li cergê min diket eserê
Sing şedefê dê m qemerê
Reş kezî li benda kemerê
Bisk berdane li ser mila

4 Pirç berdaye li ser xalan
Suret şorîn wek alalan
'Eqlê min bir wê bitalan
Di helînît cerg û dilan

5 Mêlak li min kire kebab
Wê zalima gerden şebab
Ji min sil bû nakin xîtab
Dê biçime silavê bi deskê gula

6 Cerg û dilê min giviştin
Birînêt min bi xwûnê şuştin
Bi tîra çavan wê em kuştin
Em bi 'işqê kirin muhtela

7 Muhtela bûn bi ewînê
Yê xemilî wekî Zînê
Bi wî hali em nakin jînê
Can wê li me bûye xela

8 Canê min êxist xeterê
Bêhn rihanê rû qemerê
Di gel hew bayn li her derê
Bi 'umrê sih û heta çila

9 Pêkve ji ban bi hew serî
Xilaş biban ji kewserê
Di gel hev ban li her derê
Nûra Xuda biba tecella

10 Nûra Xuda li wê derê
Me dîtiba bi çavê serê
Ji her tiştî ew xweştirê
Di xilas bibayn ji derd û bela

24 Were çav xezala min

1 Were çav xezala min
Şirînê xweş hevala min
Rûmet gul û şepala min
Tu şed caran bi xêr hafî

2 Bi xêr hatî tu şîrîna min
Were tu xweşke birîna min
Di gel te ez bikem jînê
Bide min şebr û tebatê

3 Di gel te dê bikem şebrê
Bi hevra em bikin seyrê
Di gel yêk em bibin hevrê
Di gel dostan li civatê

4 Di gel civatê tebayî ‘amê
Mabû rûyê xweş kelamê
Dil geşê eywan meqamê
Rûnêyne guşa suhbetê

5 Şuhbet bikeyn hemî pêkve
Seyra bikeyn di gelêk ve
Hema xweş bîn bi hâlê yêkve
Di her gav û hemî wextê

6 Bi şuhbet bin hemî gava
Beşe bi îşareta çava
Nede ber min qeyd û dava
Tu dideye min cereşatê

7 Qeyd û bendan bihelîne
Soz û we‘dan bi cih bîne
Ez nizamim ew çi kîne
Bes e êdî xweş ligatê

8 Xweş ligatê te şîrîn e
Te bi agirê evînê
Xistime nav nivînê
Em dûr mayne ji wesletê

9 Bo wesletê gelek dûrin
Em xudan ‘eyb û quşûr in
Bi hîle û çep û çîr in
Xuda me bînîte hîdayetê

10 Hîdayet bo me ye fer e
Bîn ummet bo pêxember e
Gerîb dê kanê tu were
Temam bike wê qişetê

25 Çûme Gundek

- 1 Çûme gundek bi mêhvanî
Bi keyf û xweş û seyranî
Li min çêbû xweşya ganî
Rihet bûm ez ji êşanî
- 2 Ez ji êşan bûme xalî
Min zeryek dît li ber malê
Wê xemilî wek alalê
Xwe di hejînî bi kesrewanê
- 3 Wê rîşî berdane xwarê
Bejin bilind wek spîndarê
Baş binêrim ez wê carê
Ji dil derînim kuanê
- 4 Min kuan e te bibînim
Tu di zanî dil birin im
'Aşîkan ez çîger xwûn im
Were nik min tu cuwanê
- 5 Were nik min tu bi carek
Li te bikem ez silavek
Ji destê te vexwem avek
Bo min bibî şîfa canî
- 6 Şîfa bibînim ji destê te
Têr binêrim ez rûyê te
Carêkê bême serê te
Dê bim kolê li derê xanî
- 7 Dê bim kole bibim geda
Carek rûnim di gel teda
Têr bifikrim wan rûmeta
Ewan xalêt li gerdenê
- 8 Rûyê te yê bi xal û xet
Ew rûmetê rewneq didet
Enya spî şefeq didet
Birû reşin wek kuwanê
- 9 Birû reş û çavêt bi kil
Weşartîne ji min bûye sil
Ew wê li min bû derd û kul
Xilaş bûye ji îmanê

- 10 Ji îmanê ji ‘inşafê
Neşêm jê bikem ewşafê
Bîte ke‘be biçim tewafê
Di gel ‘eyda wê qurbanê
- 11 Tewaf bikem bi çend şewta
Dubare kem hemî hefta
Ewê nîne bo min xeşa
Da nebêjît dostê min kanê
- 12 Dostînî ew e lêbin xudan
Nekî bi keyfa her dema
Gerîb te nekeve gema
Ew e qanûna wê cîhanê

27 Were bi qameta şeng

- 1 Were esmer bi qameta şeng
Çerxan li dora me didanî
Perî rûye temah û reng
Rûmet gul û bêhn rihanî
- 2 Sing spiyê rû bi rewneq
Bejin zirav enî şefeq
Sûret şorîn enî bi deq
Were tu bide min jiyânê
- 3 Jiyânê li min neke tale
Têye pêş min bi xemla ale
Gerden zirav û rû bi xal e
Were sertextê evînê
- 4 Bi evînî were carek
Ji halê min bike pisyarek
Şev û rojan bi tenê carek
Bibîte melhema birînê
- 5 Hatina te li min dewa ye
Dîtina te li min şefa ye
Luqman Hekîm li kî ve maye
Wek ‘Îsayî min di wejinî
- 6 Jiyana min te bi cih îna
Xilas bûm ji êş û birîna
Kewtime nav ‘îşq û evîna
Ez bûme mem tu wek zînê

7 Wekû Zînê ne zer da min
Bi evin bû qedera min
Şeker lê bû şîrîna min
Şuhbet xweş û xem revînî

8 Şîrîn kelim û xweş xeberê
Melek şîfetê renk beşerî
Min nedtîne wek te zerî
Berg etles û dil helînî

9 Dil helînî qamet şengî
Perî rû û zehrû rengî
Dê bi mîminîn heta kengî
Te nahêlim bike yeqînê

10 Te nahêlim ez çî cara
Çaw nihêrim bi sihara
Têr bibinim car û bara
Reş rihan û nazenînê

11 Nazenîn û bed siriştî
Cerg û mêlak li min biraştî
Zahirî dîn li me nehiştî
Başînî heq wê dizanî

12 Zahirî dîn da xûsarê
Bê însaf û dil gadarê
Kewtime ber hukmê yarê
Nîne rehma wê xainê

13 Xain nebe tu li dostî
Ger heqîqet dîn duristî
Min nerake ji serpostî
Dê riya axretê bibînî

14 Wê riyê tu neke înkâr
Ewê xemlê nînin çî kar
Perde rake da bi diyar
Gerq bûme behra evînê

15 Were tu bi çeşm û cemalê
Niqaba li ser rûyê xalê
Rake da bi bigehne wişalê
Bi cemala dil hebînê

16 Rû cemal û mahû tabê
Rû nişînê perde nîqabê
Bes e li min bike 'îtabê
Ez bo na te dikem şînê

17 Dikem şînê û giryanê
Di gel feryad û fîganê
Dê dest bidem girîbanê
Ji derdê reng nûrînê

18 Nûraniye wekû bergê
Dê bêjî roj derket ji şerqê
Bi wiyana wê ketme ferqê
Tu sunbul û ya nesrînê

19 Sunbul bi didara ewan gula
Sor bûne ew bi 'eşqa dila
Seyra wan kare bulbila
Bi keyfa ew li ser wê dixwûnê

20 Ew dixwûnit dil hezîn e
Her bi 'îşq û hem evine
Gava ew gula dibîne
Ew diket ah û nalînê

21 Bilbil 'aşiqê gulan e
Dil ji mehbûbê dilan e
Her du pêkve bi bihan e
Dilê geş wi hê dibînê

22 'Îşq muhbeta dilî ye
Dil gel maşûqa xwe rêvî ye
Qunağa wan cihek diye
Li axretê wê dibînê

23 'Îşq bînahîya çav û dila
Ew dihelîne cerg û dila
Bes e bêje tu 'Ebdûlla
Neke gazind û gilînê

28 **Hat nevroz bihar e**

1 Hatî nevroz ku bihar e
Tejr û tiwal bûn diyar e
Cemed şist bû li nizar e
Ji ber çavê di baranê

2 Baran barî hûrde xwûna
Cemed nema bûye lûlav
Qaz û qulink difirin li hindav
Ew diken karê hêlînê

3 Teyr û tuyan hêlîn çêkir
Belekan xwe li erdî bicih kir
Befrê karê xwe û çinê kir
Nema çi ji zivistanê

4 Nema befir dunya reş bû
Bihara me çi qas xweş bû
Silava min li gula geş bû
Mala xwe lalê we dana

5 Me çadir dana lalê gulê
Sosin şînbûn li serê milê
Deşt û çiya tew kemilî
Xweş têtin bêhna ruhanê

6 Xweş têtin bêhna alalan
Zerî û genc û ruwalan
Keyfxweşiya pîr û kalan
Pêkve ew di çine seyranê

7 Seyrê diken hemî pêkve
Şahî diken ew di gel yekve
Miszgîniyan didin yêkve
Di geryên li nav çîmenî

8 Çîmen çêbû wekû şala
Wê têt bêhna sûsin û alala
Nêrgiza xwe da nihala
Bilbil digel wan di kenê

9 Şalûl û bilbil di xûnin
Şivanê mihan diçerînin
Cotyarê tûvî diçînin
Borî bîst û çarî nîsanê

10 Nîsan borî wekî cara
Berx û miyan bare bare
Birin bo bihara ware
Li me hat wextê zozanê

11 Li me hat wextê çadira
Me dana bû mêrg û gira
Reşmalêt me sira sira
Pez wê li ber tête danî

12 Pez hate dani bêrî di nav da
Ji yan xweş edi gel wan da
Mirov ji keyfa di bîte sewda
Xwezuya ‘umrê wî zemanî

29 Deşta Gever

1 Berê xwe bide vê deştê
Rast e wekû nava xanî
Parçeke ji bağê beheştê
Xuda daye vê cîhanê

2 Deşteke rast e û ya şîne
Di nav da gundan bibîne
Hemî dura û zevîne
Cihê malat û heywanê

3 Roj helatê şemzînan e
Roj avayê şakîtan e
Qible cihê doskiyan e
Şimalî dirî heta Îranê

4 Yê mehdûd e bi van hudûda
Nehêl diçîtin di navê da
Hemî gundin di dorê da
Wekî helqê li doranê

5 Ya meşhur e bi bajarê kengê
Dibêjinê deşta poş û peşengê
Refêt teyran qûrya qulingê
Keyfxweşiyê dide însanê

6 Keyfxweşiya kiç û rûvalan
Jin û biçik heta kalan
Hemî pêkve dibin pale
Giya didurîn bi tirpanê

7 Palehiya li wê deştê
Nabin şaqî li mirovî xweş tê
Her wekî diçiyê geştê
Rûniştina li ser mahrankanî

- 8 Avêt şîrîn û ye teşî
Hindî vexwey jê nabezî
Gera birêmê wek erezî
Ye derdiket wê ji bin hêlanê
- 9 Kanyêt xweş û ava zêlal
Weqta biharê nû bû şal
Li wê deştê teyr û tuwal
Ew li welatê diken cuwanê
- 10 Ciwaniya deşta Gever
Wextê xemilî ew kesk û zer
Çiyayêt bilind befir li ser
Hewa yê wê şîfa canî
- 11 Hewa yê xweş li zozana
Çiyan şax havêtnê 'esmanî
Eve neqşekê Xudan e
Ew hikmet e me nezanî
- 12 Li ser neqşê Xuda naê xeberdanê
Neqşê wî zorî ciwane
Biner li dor deştê tew çiyane
Wek dîwarê li dora xanî
- 13 Li dora deştê zor bilind in
Li serî zozan di nav da gund in
Mil dane hev ew bi gûvend in
Dest girtine bi şêxanî
- 14 Deşt girtîne mil bi hevran e
Li serê çiyane tev zozan e
Bar bara berx û mihane
Wextê ku pez tete dani
- 15 Pez tete danî bêrî di nav da
Xwezîya şivan bam li gel wan da
Hewpar bam di jiyana wan da
Min tîma heyatê dibizanî
- 16 Xudan pez bam li serê çiya
Geh li deştê geh li geliya
Ez bi jîyar bam di gel weşîya
Çêtir bû ji ya însanê wî zemanî

17 Ez şivan bam li zozanê
Hero min pez înaba dani
Wextê şîr dikire qazanê
Min vexwarba bi siheta canê

18 Şivanî li te bûye hewes
Tu pîr bûy êdî te bes
Xanî li te bû qefes
Tu ey gerîbê sûsyanê

30 Li ser kirinên însanên vî zemanî

1 Were bira tu guh bidê
Ji însanêt vî zemanî
Yêt keftîne xwewa gefletê
Ewan ji bîr kir muslîmanî

2 Muslîmanî ewan hêla
Mulkê dinê bi geflet kêla
Tovê cuhlê çand û hêla
Bera xwe da bo meyxwanê

3 Berê xwe dan xirabiyê
Ne çine nêzikî çakiyê
Nezanî rêka camîyê
Mirin li bîra xwe neanî

4 Mirin nehate bîra wan
Di meşgul bûn hemî gavan
Qumar kirin bû fi'lan wan
Çi ji axreta xwe nezanî

5 Ji bo axretê nekir çî kar
Nivêj nekirin wan çî car
Bûne munkîr ew hemî car
Xwarin rojiyêt remeðanê

6 Remeðanê rojî xwarin
Direw û sond pîş û karin
Wan mesken qahwe û bar in
Nivêj çîye wan nezanî

7 Nivêj çî ye wan nas nekir
Li ser maşan wext berze kir
Pîrî hat wan şerm nekir
Fîl û feres kağezanê

- 8 Şin'et okê û domîne
Weqtê diçît hal xwe nîne
Hec û zekat borandîne
Şehda wan bi serê ezmanî
- 9 Şehda wan çî fayde neda
Xwe ji xirab paşve neda
Şerim nekîr ji zatê Xuda
Bûne şîrikê şeytanî
- 10 Şeytan bûye rêberê wan
Bû mani'ê êmelêt wan
Direw û sond in karê wan
Rûniştin li hêlîna şeytanî
- 11 Rûniştina wan qehwe ye
Ne cema'et e ne cûm'e ye
Di bejin şertî dilê me ye
Melan ew tişte nezanî
- 12 Dibê guh nede melan gêricî ne
Em yêr nihe medenî ne
Dublek min vexwar çînîne
Di gel arqadaşan bi mêwanî
- 13 Mêhwaniyû de'wet kirin
Şûşet wîskê xalî kirin
Nehate bîra wan mirin
Ku dê çine qebristanê
- 14 Nehate bîra wan qebir
Îşê wan bû zor û cebir
Wan ne însaf e ne şebir
Li xwe xwe nagirin ew ezmanî
- 15 Ezman bela serê wan e
Ne şerefe ne wîcdan e
Ne hesyet e ne îman e
Meħrûm bûn ji 'emrê qur'anê
- 16 Qur'an nedzanî çî ye
Ne tew beye ne hîvî ye
Agah ji 'emrê Xudê niye
Hîs nekîrin çî pişmanî

- 17 Peşêmanî fi‘lêt xwe nebûn
Bang û şela guh lê nebûn
Ew dijberî dînê xwe bûn
Ji bîr kirin musilmanî
- 18 Musilmanî ewan hêla
Ji pîran heta cahêla
Dest havetne hemî fila
Şehwet perest û heywanî
- 19 Şehwet perest û heywan şifet
Ne tesbîhe û ne ta‘et
Ne bext heye ne ‘edalet
Millet ji destê wan diket emanê
- 20 Millet diket zarî ji destê wan
Faîz û riban e êmelêt wan
Şîret eser naken di wan
Bûn munkîrêt zemanî
- 21 Munkirya xwe ew nîzanin
Ew heramî helal dizanin
Di sefil û perişanin
Derbaz kirin ûmir bi xusranî
- 22 Bi ûmrê xwe ‘emel nekir
Bi sefilî zeman bezre kir
Qîmeta ûmrî fam nekir
Heba kirin ûmrê cîhanê
- 23 Te ûmir bi xusranî borî
Ji kar û xebatan ji dorî
Çi kas te hebin qusûrî
Hewar bike xudanê gufranê
- 24 Bi nezanî ûmir wê borî
Tu nezaneke çend bi quşûrî
Hîvî bike tu ji gefûrî
Gerîb tu bi xwe nezanî
- 31 Ey dil**
- 1 Niza çi dixwazî ey dil
Di vê feşla zivistanê
Tu ne bûyî ‘endelî bû bilbil
Bi geryî li bağ û bustani

2 Min neman çi bağ û bûstan
Payîz borî hat zivistan
Ne deşt maye ne kohistan
Ku tu mala xwe lê danî

3 Min nema cihê çadira te
Xirab bû seyrangeha te
Kan sermaye havîna te
Fayde nakin peşêmanî

4 Peşêmanî te xilaş nakin
Ew derdê te derman nakin
Çi çare li halê te nakin
Nemaye di gel te cuwanî

5 Ji ciwaniyê tu yê borî
Ji piriye tu yê korî
Hesabê bike ji bo gorî
Tu li bîr bîne qebristanê

6 Goristan e qûnağa te
Bağ û bustan ‘emelêt te
Kes naête hewara te
Ji geyrî zatê şultanî

7 Hîvî bike ji zatê barî
Tewbe bike hêj tu di karî
Wextê biçî cihê tarî
Nebe cahil û nezanî

8 Cehaletî teb‘etê te
Nefsa xain rehberê te
Hîrs û şehwet hakimê te
Ew bela bi serê te anî

9 Bela piriye hat bi serê te da
Qawet nema di çokêt te da
Neşê bike zikra Xuda
Çi ji axreta xwe nezanî

10 ‘Umir borî bi nezniyê
Heta geheşte dûmahiyê
Îzraîl bigre kewrûyê
Pîrî hat û bi xusranî

11 Pîrî derdek bê derman e
Qîmeta weqtî bîzan e
Gotina nebî weşan e
Zeman borî bi ziyânî

12 Ğerîb nezanî Gulordî
Li te borî gencî û xurtî
Pîrî hat û qu tû girtî
Bûy pişmanî wî zamanî

³² Çime Gulorda rengîn

1 Çime Gulorda rengîn
Ew welatekî şîrîn e
Sê taxin bi pêş yekve
Ew neqşekî îlahî ne

2 Rahmû û kepê dêrê
Şerq û ğerbê gundîn e
kewya pira serkelê
Şimal û cunûbî ne

3 Li mabeyna wan hudûdan
Ew mekanekê zêrîn e
Cihê bo seyran û geştê
Avêt şar û hem şîrîn e

4 Bi bağ û sev û fêqî
Hemî mêrg û kanî ne
Bi rez û gûz û hirmî
Mixabin kes lê nîne

5 Di çerînin bağ û sêvan
Heyfek pê çi nîne
Xirab diken rez û mîwan
Kes di gundî da çi nîne

6 Cihê bab û bapîran bû
Bê xudan wêt hêlayîn e
Mekanek wekî wî erdî
Li dinyayê çi nîne

7 Cihê xweşya jiyanê
Tamekê jê bi helîne
Têda sê sed û heftê kanî
Bawirke wer bibine

- 8 Zozanê wê şanzde warin
Mihêt xwe lê biçêrîne
Li seran kewyêt befrê
Heta îlonê dimîne
- 9 Di gel heyva gulanê
Reşmal li waran rêz bûnê
Birêt berxan û mihiyan
Li nizarî girt palîne
- 10 Hêroynê û bihare dan
Kende bahdîn û mukreyne
Kanya diza û nişirî
Ew warêt serekîne
- 11 Wek êvarê pale tèn
Keyfa wan tu bibine
Holane û şixanî
Adetek ji mêjîn e
- 12 Govend û seyr û keyf e
Zerî wê xwe dihejîne
Bi kiras û fistanan
Kesrewanê bi rûşîne
- 13 Şivanan pez da danî
Tijî navda bêrî ne
Barbara berx û karan
Dilê mirova dihelîne
- 14 Ji gaz gaza şivanan
Kewê li palê dixwûne
Bêhna sosin û alalan
Dil tengiyê dibirîne
- 15 Bêhna rihan û beybûna
Bi heştê bo me li bîr tîne
Ew dilêt ku di birîndar
Xeman lê direvîne
- 16 Bese gerîb ‘Ebdullah
Kesê bawir pê nîne
Ewê kitêba xwezayê
Êdî kat û nexîne

33 Musa û Xudanê Heywanan

- 1
Bikeyn behsek ji pêşîn
Tu ‘ecayêban jê bibin
Êqlî bide şolê binêre
Însanî ka çi heye pêra
- 2
Baş lê nezer bike tefekkurê
Ewa Xuda daye beşerê
Di zemanê Musa pêxemberî
Her çi ya xwest tate serî
- 3
Xûd perest bû dûr nebin
Zor hez kir ji mal û heywan
Daîm meşgûl bû di gel wan
- 4
Rojekê çi nik pêgemberî
Gotê tu nebiyek serwerî
Heta nehe her çiya me xwestî
Bo me çêbû ye bi rastî
- 5
Tu dikey du‘ayê Xuda diket qebûl
Ew li nik me bûye usûl
Vê carê jî hatime nik te
Kelîmûllah e navê te
- 6
Du‘ayekê ji xudayê mezin
Hikmetekê bidete min
Bizanim ji ezmanê heywanatî
Ji teyrana heta weşiyatî
- 7
Bi sirê wan bibim xebardar
Bizanim çi dibêjin her car
Ez bi ezmanê wan xeber dar bim
Di gel wan xudan ‘ilm û behredar bim
- 8
Hind dibarin hind qurêne
Hind dixwûnin dil hezîne
Hind bi hevra di jîn hind ket kete
Hind bizerer in hind bi fayd e
- 9
Min zanîba ji hemî halêt wan
Bibam e sirdaş li gel wan
Ewe kewti ye dilê min
Zor daxwaz e ew ji bo min

- 10 Musayî gotê ewê nexwaz e
Ew e şolekê bê miraz e
Evê bo te çi kar tê nîn e
Wê xwestekê bibirîn e
- 11 Ji nik Musa rabû dilê xemgîn
Di dilê wî da bû kerb û kîn
Çend rojan ma bi wî karî
Dilê wî tena nebû wê carê
- 12 Di paşda hat û vegerya dîsa
Carek dî hate cem Musa
Wekû berê carek dî red kir
Vegerya mal û tab nekir
- 13 Ji fikrê xwe neçî paş
Bi şev û rojan ewî şaş
Guhda dengê heywaneti
Dê çawa bizanît ligati
- 14 Şunda zivirî cem Mûsa
Xwesteka xwe got dîsa
Min xwe havêt ber bextê te
Hîvya min li cem zatê te
- 15 Min heye dîkek reş şeyekê şîn
Li nik min xweştivîn e şirîn
Ez bizan im ezmanê herduyan
Êdî naêm cem te çi wextan
- 16 Musa ji wira du'ayek kir
Gotê here Xuda qebûl kir
Hate mal ew bi keyfweşî
Bi tebesum û dil geşî
- 17 Zengînekê hesûd û dil xwalî ye
Wî hene gelek kole û carî yê
Şubê zûyê li gel siharê
Rabû û derkefte ber derî
- 18 Xwe hisêpkir gelek zana
Ma li benda dengê heywana
Ji keyfxweşiyê dikenî
Li cihê xwe na sekini

- 19 Cariyê sofra nanî daquta
Dikîl bezî û per quta
Dîk ji cih derket gar û bez
Hate ser çinkan ew bi lez
- 20 Şeyê şîn rabû û meş kir
Vî didan li dîkî gij kir
Gotê em hevalêt yek in
Xwe bide paş ji heqê min
- 21 Qina‘et karbe bi heqê xwe
Xirab neke hevalinya min û xwe
Çinîkê hûr heqê ten e
Yet gir jî heqê men e
- 22 Dîkê reş got bera xwe bide min
Tu bike guhdariya min
Emrê te li ser serê min
Min qebûl tu birayê mezin
- 23 Ez dizan im para te ye ya mezin
Lê ya kême nakin têra te û min
Tu îro bike sukûn û şebrê
Hetta ku wextê ‘eşrê
- 24 Hespê xudanê me wê bimrî
Tu dê jê bixwey bi têrî
Şubê zûye di gel siharê
Ku bihîst ew xeberê xêrê
- 25 Şeyî guh lêbû ew mizgînî
Lê xweş hat û têr kenî
Şeyî gotê tu hevaleyê şirînî
Çen xweş bû ew mizgînî
- 26 Xudanê wan guh da şey û dîkî
Rabû û hesp bire sûkê
Zû firot û paşda vegerya
Bedenê wî şot û lê xurya
- 27 Hewya wî nehat li çi dera
Ew kewt e kul û kesera
Gelek ma di hespê xwe
Neşiya xwe bigrît li cihê xwe

28 Heta şubê hat û çî li nava xanî
Ka dê subê çî dî bizanî
Şubê rabû ew di siharê de
Çî rûnişt di cihê berê da

29 Dîsa cariyê şufre rêt
Berê xwe daye dîkê têt
Ew zû geheşt e cihê sufrê
Çinîk hemî rakirin ji wêrê

30 Hate ganê şeyê xurt û şîn
Gotê dîkî hey direwîn
Te duhinê ez lêband im
Te bo çî ez bîrsî hêland im

31 Tu dibêjî qelbê şaf e
Di gel min nakî tu 'inşaf e
Dîkî got şondê dixwem bo te
Xaîn nebûme ez li te

32 Ez çî cara nebûme direwîn
Xudanê meyê bûye xaîn
Ewî zerer gehand e yekîdî
Belê maye tişteke dî

33 Hêstirek wî ya barî evro
Dê bimrît wextê nîvro
zîkê xwe têrke têr bixwe
Tu pê hâlîke hevalêt xwe

34 Ca tûla te ya duhî jê webî
Bila çî cara xaîn nebî
Xudanî bihîst ew qal
Ew rabû ser piya derhal

35 Hêstir jî bire bazarê
Firof her wek roja berê
Firof û hat ew dil xelet
Rûnişte mal ew bed 'emel

36 Dilê wî zor bi kerb û kîn e
Ema çî care ji bo wî nîne
Şot ew bi hisreta malî
Kes nîne biçîte lalî

- 37 Roja siyê rûnişt li ber derî
Ka wê rojê dê çi bête serî
Şubê wextê siharê li derê malê
Rûnişt bi tefekura melalê
- 38 Cariyê sufre îna û hejand
Çinîk li derê malê reşand
Dîkilê reş kewt e bi zavê
Rabû ser piyan wê gavê
- 39 Xwe ji cihê xwe qelizand
Perêt xwe qij kirin xwe qidand
Çiye wekî teyrê elohî
Çinîk ne helan li cihî
- 40 Şey dît û kerb lê vebûn
Çav lê tijî bûne xwîn
Gote dîkî sê roje ezê birsî
zalim ma tu ji Xudê natirsî
- 41 Ez evro zor yê bikin im
Dê evro stûyê jê qetîn im
Dîkilî gotê tu neke wa gefan
Li min neke tehdîd û gefan
- 42 Qesem dikem bi tewratê
Tiştê duhî û pêr min gotî
Çi ji wan direw têda nîne
Hindî min gotî hemî rastîn e
- 43 Sakîn be şebrê bike carek dî
Sira wî hati ye gaye cotî
Tu guhde wî şirikî
Dê bi cih bit gotina dîkî
- 44 Dil xweş bû bi vê gotinê
Mali hîvya gay û mirinê
Mêrkî guhda wê gotinê
Beşê gay û mirinê
- 45 Rabû ji cih xwe rast vekir
Çi benik ji stûyê gay vekir
Ew ji bire cihê bazarê
Şexsek di da zererê

- 46 Her wekî rojêt berê
Hate ve herdu çavan girî
Wê rojê heta bûye êvarê
Şeyê jar ma li hîvya karî
- 47 Bo wî mexlûqê bê bext
Wê rojê jî nebû ziyafet
Ew şev jî borand yê birsî
Şubê rabû zor bi hirsî
- 48 Zor birsî ye çav nihêr
Wekî pilingê ketiye şikêr
Şev çi û subê zûye
Ser çav nihêre û birsiye
- 49 Her wekî wan rojêt berê
Cariye jî jor hate derê
Wê şubê zûyê siharê
Ewî şifre rijande xwarê
- 50 Dîkilî didan tîj kirin
Geheştê çinîk hemî wî birin
Şeyê şîn û zexm û gir
Ewî serê milan bilin kir
- 51 Rabû li ser kurya xwe sekinî
Gote dîkî tu dê nehe xwe bînî
Dîkilî gotê ey dostê min
Ka guh de gotin û peyva min
- 52 Xeberê min bo te hene
Ew gelek li kar û faydê te ne
Şeyî hicûm kirê wekî şerî
Dîkilî nezanî dê çite kîrê
- 53 Bi tirs rabû û çav tarî
Firda ser çiçekê darê
Şeyî xwe bilind kir negehştê
Gelek li keyfa dîkilî xweş tê
- 54 Şe bi kerb rabû lê xwûrî
Min êdî nîne bîte bawerî
Te digot em her tiştî dizanîn
Xudan keramet û ilham in

- 55 Hem di ʔariya nava ʃevê da
‘Îbadet dikeyn di wextî da
Em li cihê ʔarî jî bimînîn
Em wextê xwe dizanîn hem dibînîn
- 56 Bi wê hindê em dibîne zana
Bangî didin ji bo însana
Em hind xudan îlham î
Însan wextê bi me dizanin
- 57 ʃe ji birsan rahijiya
Ne dikarî xwe bigrî li ser piya
Dîkî gotê te kire dirêj
Ka guh de min tu ʃeyê gêj
- 58 Ewro sira xudanê me ye
Keyf û dawet ji bo hewe ye
Têr bikin keyf û ʃahî
Ji bo xudanê me wext bû dûmahî
- 59 Xudanî guhlê bû ew tişt
Ji cih rabû û rahişt
Ew rabû ʔi nik Mûsayî
Gotê tu bo xatra Xudayî
- 60 Ji bo min bike tu ʔarê
Tu min xilas bike vê carê
Mûsayî pirsî ʔi bûye
Ka ʔi bi serê te hatî ye
- 61 Ji bo Mûsayî got ew qise
Mûsa gotê ka netirse
Tu dê rojekê her biçî
Nedişêy xwe bigrî nedişêy neçî
- 62 Nekeve pê tiştê nezanî
Dê bidorînî tu canî
Te zor li min kire israr
Bi siran bibim xeberdar
- 63 Ew kesê dibîte ‘arif
Bi ʃiran dibîte waqif
Ew kesê ji siran bizanî
Ew nakevî ber xema canî

- 64 Çi kesê hatîye dine ji beşera
Ka dê xêran ket ya şera
Ka guneh pitirin yani xêr
Kanê li ewraze ya li jêr
- 65 Ka Xuda pereste yan mal
Ka çih beheşte yani çal
Tu razî nebûy bi halê xwe
Bawir nekir ji pêxemberê xwe
- 66 Tu razî nebûy bi qederê
Lew te hal îna wê derê
Mêrik zivirî yê pişman
Ew bi serê xusû bê eman
- 67 Li derê hewşê hate jor
Her wekî serxwşan û kor
Bi jor kewt û kire qêrî
Gewya wî kewt e xîr xîrê
- 68 Şe û dikil herdû hatine lalî
Ji hesreta wan ew dinalî
Lew lerizîn çaw lê bûne zil
Riha xwe da bi derd û kul
- 69 Ehlê wî hemî bi giri û qirîn e
Şe û dikil herdû bişahîn e
Bu karê defnê û taziye
Dîkil û şe kewtine şahîye
- 70 Bû keyfa wan zîrih û weşşiyar
Keyfxweşiya kole û cariyar
Bi mirina wî şad bûn der û cîran
Pêkve ew mexlûq û heywan
- 71 Hind şîne diken hind şahî
Hind çine pêş hind dûmahî
Hind xwendevan in bûne rehber
Hind nezan in bûn e rênçber
- 72 Hind li jêr in hind li jor in
Hind xudan guneh in hind bi xêr in
Hind dibêjin hind guh dêrin
Hind bi ‘eybin hind diveşer in

73 Hîvî dikem ji dost û bira
Li min veşêr in ‘eyb û sira
Yê bê ‘eyb bît her Xuda ye
Min gelek zehmet pêve kêşa ye

³⁴ **Zimanê Dawût Pêgember**

1 Da biçîne Quds û Xelîlan
Berê xwe bide fêl û hîlan
Zemanê nebî Dawûdî
Feqîrek hebû bê xwedî

2 Li kinarê şehîrî malek xirab e
Zarûkek bê day û babe
Bi şalan ji Xuda ra zikir dikir
Herdem du‘a ji Xuda dikir

3 Ya Rebbî feqîrek im ez bê tab
Dixwaz im rizqê helal û bê ‘ezab
Bi şalan wehe dewam dikir
Xuda du‘a wî bo qebûl kir

4 Bo Xuda xaliş û muxlûş
Ew feqîrê bê care û muflîs
Rojek rûniştî li derê xanî
Di fikrî li halê xwe û zamani

5 Wî dît gayekî sor û çavreş
Ji wê ve têtin ew bi meş
Raza ber pêyê wî xwe dirêj kir
Ewî dest da kêrê û serjê kir

6 Ji Xuda bibawir bû derhal
Xuda bô rêkirî rizqê helal
Serkê gayî dana bû kenarê
Ewî goşt hûrkir bi kêrê

7 Xudanê gayî kewte pisyanan
Wî gotê rex û can û karan
Gaye min yê bezre ye kê dîtî yê
Bi wî rexi ve nehatî ye

8 Yekî gote gayekî bi rengê sorî
Min dît bi wî rexi ve borî
Çi ber derê feqîrî û dît
Yê goştê gayî hûr diket

- 9 Ma li serkê gayî fikirî
Dît çermê gayî ji xwê kirî
Girte milê wî feqîrê jar
Hindî şiya lê kire hewar
- 10 Gotê te bo gaye min serjê kir
Feqîrî got Xudê bo min rêkir
Hate kerbê û çav lê şor bûn
'Eqil bo nema û bû cunûn
- 11 Were biçîne cem pêgemberî
Tu dê bi bînî xwe li wêderê
Kurik girt û rakêşa bir
Li cem Dawîdî wî qise kir
- 12 Nebî Dawûd jê pirsî û gotê
Tu genceki ciwan û xortî
Te 'îbadet dikir ji Xuda ra
Bo çi te bera xwe jê wergêra
- 13 Hewkarê xwe bêje ka kî ye
Kê ew kare digel te kirî ye
Kurkî gotê ey nebiyê serwer
Xuda tu yê kirye pêgember
- 14 Evî şolê tu dê jê zanî
Ga bi xwe hatiye derê xanî
Ew raza ye ber kêra min
Min pê bawer e ku helal e bo min
- 15 Dawûd gotê xwe bigrin heta şubê
Da jê bizan im ez vê hesabê
Çûne ve heta roja paştirê
Digel siharê xudanî gay hucûm kirê
- 16 Mêrik çi kurik rakêşa îna
Dilê wî tena nebû ji birîna
Kurik îna pêş û miqabil
Gotê ey nebiye bi rehm û 'adil
- 17 Eve min dizê xwe înaye
Kanê hukmê te yê çawa ye
Nebîyî gotê bike xeberê min
Dê bo te baştir bît gotina min

18 Tu kurkî azake ew feqîre
Nebe dawager lê bibor e
Ewî got heqê xwe dixwaz im
Heqî çi ye ewe ya bo me lazim

19 Gotê şerî'etê min evro ewe ye
Qebûl nekî subê jî nû we ye
Roja paştirê hatin cema'et
Ka dê çi lêhêt ew şer'i'et

20 Hatin hemî pêkvê rû birû
Gotin bila xilas bît îro
Pêgember pirsî ji xudanê gayî
Ka gotina duhî qebûle dûmahî

21 Go ez vî çi car nakem qebûle
Ewe çi terze çi usûl e
Bi aşkera gayê serjê kirî
Te jî ew hukme yê pêkirî

22 Go hukmê min yê Xuda ye
Çi car heqyê nabî cudaye
Ewa min gotî bo te çêtir e
Bo dûmahiya te bi xêrtir e

23 Nebî go hûn meselê nîzan in
Lew hûn ji min bi guman in
Xudanê gayî sûcdar e
Lew diket qêrî û hewar e

24 Ya min gotî karê wî ye
Qebûl neket dijberê wî ye
Ya baş ew e herdu teref
Vî hukmî qebûl bikin bi xef

25 Cema'et hemî yek xeber
Gotin ey nebiyê serwer
Bila xilas bît ew bi heqî
Li çi kesî nebî neheqî

26 Ew malê xwe nîvekê
Bide feqîrî û edakî
Ez evro dibêjim hûn bira
Nîvî ken milk û mal û para

- 27 Evê rojê red kir şerî'et
Ji cih rabû zor bi hîrs ket
Gotê tu qebûl nekî şubê were
Qatek dî débête li sere
- 28 Di nav xelkê da bû sebebê xeberî
Rexne dane Dawûd pêxemberî
Nebî sûçdar kirin bi şerî'etî
Tu wê xirab dikî 'adetî
- 29 Go ya min û hewe jêk cuda ye
Ya ez dizanim wehîya xuda ye
Roja paştirê dîsa hatin
Bi çar kenarêt resul werhatin
- 30 Gotina roja berê qebûl e ya ne
Ewro qatek dî ii seran e
Gotê ma pêgemberî weha ye
Ewe li serê me bela ye
- 31 Ew yê bûye hevalê diza
Mali ji me distînît bê riza
Roja dî bi kerb û kîn hatin
Bi birin û dil şewat in
- 32 Rûniştin kewtine xeberdanê
Hewkarêt wî xir bûne doranê
Pirsîn ji pêxemberê Xuda
Kanê te çi qerar pê da
- 33 Ez evro dê dem qerarekê
Malê xwe hemyê bidete kurikî
Mêrkî xwe li 'erdî girêl kir
Ax û xwelî bi ser xwe wer kir
- 34 Go ka werin guh biderîn
Hûn bo çî xwe dîveşêrin
Kewte zariyû fîğanan
Kire gazî der û cîranan
